# *JIYAN DI BIN ROJA MÎTRA DE DIMEŞÊ*

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên Han*

.
.
.
.

*Jıyan di bin roja Mîtra de dimeşê*
Weşanên SORAN e
.
Berlin- 2013
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-942735-20-9

. **JÎYAN DI BIN ROJA MÎTRA DE DIMEŞÊ**

´Mîtra, sûwarê leheng ku sûwar dibû, bi haspê xwe re bi ber rojê ve difirî´. Mîtra, destpêkek bû. Bi wî re û navê wî re zayîneka mejûyî hebû. Mîtra, hê ku piçûk bû, ew bi kirin û gotinên wî ên bi aqilane re ew dihat li berçav û nasîn. Navê wî, bi wî rengî hebû. Mîtra, oldar û pêyamnêrî dema Mîtannîyan û ji mîtannîyan bû. Mîtannî jî kurd bûn. Bo vê yekê jî, ew weke «sûwarê Mîtannî, ku bi ber rojê ve difirî» dihat binavkirin.

Mîtannî, rojekê, ew li qasra barê xwe rûniştî bû. Dibêjin ku jineka wusa xweşîk ku hingî xweşik bû ku ji ber qasra bavê wî ve buhurtî. Ew jin hingî wûsa xweşîk û sipahî bû, dibêjin ku şawqa w xweşîkatîya wê hişê Mîtra, dema ku wî ew dît ji serê wî bir. Mîtra dema ku ew li berçav dît, êdî di cih de ji cihê xwe rabû ser xwe li ber wê xweşîkatiyê. Mîtra, berê xwe da rojê û got «yazdanê min ê mazin, ma xweşîkatîyaka bi vê hewayê li dunyê heya.» Ku Mîtra berê xwe da rojê û ev gotina bi pirs ji yazdanê xwe yê mazin kir, hingî, hîsek bi aqil ket ser û dilê Mîtra xwe ku ji Mîtra re got ku «ew xweşîkatî, xweşîkatîyek ji xweşîkatîya yazdanê mazin a.» Mîtra, ev hîsa biaqil, di serê xwe de bihiş kir û di mejîyê xwe de hişt û girt.

Mîtra derket ber devê dêrî û dît ku wa jina wusa xweşîk û bedew wa li wir sekinî ya û weke ku li deverekê dinerê. Mîtra, bale wî çû bi aliyê ku berê rûyê jinê lê bû ku dinerî. Hingî, çavên Mîtra bi tîrêjeka rojê ku di ber çavên wî re da û buhurt û ku bi wê weke ku çavên Mîtra girt lê hat. Mîtra, ji wê rewşê, weke ku çavên wî di wê demê de, weke ku dunyê êdî nebînê lê hat. Weke mirovekî kor li Mîtra Hat. Mîtra hingî ma şaş û mat. Di serê xwe de hizirî û xwest ku nepenîya wê rewşê çiya fahm bike. Ev jî, weke hişekê di serê wê de çêbû. ..

De ne, Mîtra, di ciwanîya xwe de ciwanekî ku wusa levhatî bû ku bi gotinê nayê gotin. Levhatîtîya wî, nav dabû. Lê ew di dema xwe de, wusa mabû. Mirovekî wusa xweşîk û sipahî, li dora wî ti jin nebû ku bi wê re zewîcî bê. Ku Mîtra, di wê demê de ji ber wê tîrêja rojê ku çavên wî hatî girtin, ku hinekî weke ku hata xwe lê hat û piştre, çavên wî êdî dîtin. Lê hê jî, sipîk di berçavên de difirrîn. Mîtra, weke qadarekê wusa ma. Piştre ku asayîbûn bi çavên wî de hat êdî çavên wî cardin bi jinê ket. Bi wê jina wusa sipahî û xweşîk ket.

Mîtra çû û xwe digihand ber jinê. Li nave çavên wê meyîzend. Jinê jî, bi awirna ji xwe bawer û serbilind li nave çavên Mîtra nerî. Mîtra, weke demekê, wusa hema tenê li nava çavên jinê nerî. Piştre kar ku gotinekê bibêje. Lê wî, tevî ku xwe kar kir ku gotinê bibêje, lê dîsa bêgotin ma. Gotin, ne got. Mîtra, di wê demê de, tenê li wê jinê û xweşîkatîya wê nerî.

De ne, divê ku em vê jî bibêjin ku Bavê mîtra pirr dewlemend bû. Qasreka wî hebû, ne kêmî ya keyê mazin bû. Çi xweşîk di dunyê de hebû, xwe gihandibûyê de û di qasre xwe de bicih kiribû. Ti qûsûr û kêmesî di qasrê de tûnabûn. Mîtra, di wê qasra xwe bavê xwe ya xweşîk de ji ´ga´yê xwe yê xweşik û pîroz bi navê Anû cihê di qasrê de ê herî xweşîk ji wî ga´yê xwe re adilandibû. ..

Mîtra, weke demekê li be jinê, bi bêdengî ma. Di wê demê de, deng ne ji wî û ne ji ji jinê derket. Jin, bi wê xweşîkatîya xwe re li ber wî sekinî bû û weke ku li bendê gotina ku ew wê ji wê re biibêje bû. De ne, di welatê Mîtannîyan de, jinên mîtannî, pirr li xwe dinerîn û xwe xweşîk dikirin. Endeko, çê kirin û bêhna wê jî li xwe dixistin. Bi bejnûbal bûn. Jinên Mîtannî, bi xweşîkatî û bedewî û wê çavreşîya xwe re êdî ku ew pova xwe dirêj diberdan û li noqa xwe disekinandin û bi ser wê de jî, girêdankên sor, zer, kesk, şîn, sipî û hwd, bi paçan girêdidan, êdî tenê bale mirov diçû bi ser wan de. Ew kirasê wan ê sipî ku li noqa wê tarîşa sor dihat girdan û li ser serê wan weke taça rûhanî ku hebû, ew girêdanka ku çêdikiirn, xweşîkatî tevlî xweşîkatîya wan dikir. ..

Jinê, bi wê bedewî, xweşîkatî û rewşa ji bawerbûna xwe li ber Mîtra kûrê Mihrîwan sekinî û wusa lê nerî. ´mihr´, tê wateya rohnî jî ya. Piştre ku demek biser wê rewşa wan ve çû, Mîtra bû yê ku pêşî axift û ji jinê pirsî ku ji kûderê tê û wê herê bi kûderê ve. Ku Mîtra ji wê pirsî, jinê pêşî navê xwe got û «navê min Xûrê ya. Ezê, herîma male bavê xwe ku li ´waşûkan´ê ya. Mîtra dizanî ku Waşûkanî li kûderê ya.. Ji xwe ji wê derê û heta weşûkan´ê ne zêde navberake dirêj hebû. Bi çend kêlîkan meşîn ku bû, wê bigihiştan wir. Mîtra, piştî wusa bihîst, pirseka mazin û bi hey ji jinê kir. Ji jinê pirs pirs kir û got ku «tu ya bi navê welatê xwe yî, ma tu bi wê xweşîkatîya xwe keça keyê welêt î? ..

Ku Mîtra, pirseka bi vî rengî kir, jinê weke ku hinekî bi wê rûdêna xwe ya stûr û fireh li Mîtra nerî û weke ku hinekî beşişî û piştre got «raste, ez wilo ma, ez jin im û ev welat im.» Ev bersiva jinê, pirr bal û heya Mîtra kişand. Lê Mîtra, di xwe de ne hanî der. Wusa, tenê lê nerî û di serê xwe de hizirî. Ew xweîkatîya rûhanî,ku çavên Mîtra bi tîrêja ji

xwe ne dihişt dunyê bibînê, Mîtra li ber wê diket zorê de ku gotinê di mejiyê de bibîne ku ji wê re bibêje. Mîtra, piştre ku hinekî hizirî, piştî demekê ya ku hatibû hişê wî ku wê jinê dewetî hundurê xwe bike. Lê Mîtra, ew nekir. Mîtra, ma sekinî, Piştre, weke demekê wusa ku man, êdî jinê jî rêya xwe girt û doma û çû. Mîtra, piştî ku wê pişta xwe dayê û çû, weke demekê li şûn ve li wê nerî, heta ku ew jin ji berçavên wî winda bû. Mîtra, piştî ku jin ji ber çavên wî winda bû jî, wî ew ji bîr nekir. Di mejiyê wî de ma.

Wusa, weke demekê piştî ku jin ji wê vaqatîya û bi rêya xwe ve çû jî, ew di cihê xwe de ma sekinî. Wê jinê bi xweşîkatîya xwe re bandûraka mazin li ser Mîtra Berde bû.

De ne, bavê Mîtra ê kal, car bi car wî jî di axiftinê xwe de gotîya ku «di xweşîkatîyê de pîrozek ji ya yazdanê mazin heya.» Mîtra, di wê demê de piştî jinê re ew gotin bibîr kir. Lê Ev gotin, ne ya bavê wî bû. Di civatên nava gel de, pirr caran jî dihat ser ziman. Herî zêde jî, mirovên navserî xwe ev gotin di axiftinên xwe de dihanîn ser ziman. Mîtra, di wê demê de, weke ku di temenê baweriyekê de ev gotin bibîr kiribû. Piştre mîtra bi qadarekê re vegerîya hundur û çû cem ga´yê xwe û ji wî re rêz û hûrmet xwe bi navê **Anûsîn** da nîşandin. Ji wî re berg kir. Mîtra, di serê xwe de, di wê demê de weke ku ne li wir bê li cihaneka din bê di serê xwe de, lê hatibû. Wusa jî bû. Ew di serê xwe de, weke ku ne li wir bû. Lê Mîtra, bi laş li wir bû û bi hiş ne li wir bû. Hiş, weke ku Mîtra jî pê bawer dikir ji yazdanê mazin bû. Hiş, ji aliyê yazdanê mazin de hatibû dayîn li gîyane mirov a nemir. Bi wê re, ji ber ku gîyane mirov nemir bû, yazdanê mazin êdî ew hiş dayîmî dikir û lê zêde dikir. Mîtra, bi vê yekê, li gîyane xwe pirr dihizirî. ..

Roj, li ser rojê ketin û çûn. Lê ew jin û heyîna xwe ji hişê Mîtra neçû. Çend roj hatin û dûnya kir rohnî. Çend şev hatin û dunya kir reş. Mîtra, hê di serê xwe de di ya xwe de bû. Mîtra, di wê demê de wusa dihizirî. Mîtra, ji ga´yê xwe fahmkirinek xwest. Mîtra, di serê xwe de dihizirî ku bigihijê wê rastiyê. Lê Mîtra, di wê demê de, ew car bû ku wusa di serê xwe de bihizir û di xwe de bêaram bûbû. Çi jê hatibû? Wî bixwe jî, dibêt ku ew ne dizanî. Lê Mîtra, dihizirî, Di serê xwe de dixwest ku xwe bigihijêne rastiyekê ku karibê bi wê biser ve werê. Mîtra, di wê demê de, di wê rewşê de bû. Mîtra, li ber destê wî, te çi xwestiba hebû. Dunyê de, çi hebû, ji ber destê wî ne kêm bû. ..

Dem ku hinekî buhurt û piştre, Mîtra weke ku hinekî were xwe lê hat. Lê dîsa di serê xwe de bihizir bû. Piştre ji cihê ga´yê xwe derket. Derket

derve û hinekî li dora xwe û li azmana nerî. Berê xwe da rojê û li rojê nerî. Roja xort û germ, têhneka mazin di wê demê de dida dunyê. Mîtra, bi wê têhnê li azmana li rojê nerî. Mîtra, hiş dikir. Dema ku li rojê nerî, li yazdanê xwe ê mazin hizirî. Gelek tişt di serê wî de hebûn. Wî di serê xwe de di bir û dihanî. Mîtra bi wê rengê, weke demê bi hizir ma. Mîtannîyan, di dema xwe de pirtûkxaneyên xwe ên mazin çêkiribûn. Di wan de, bi hezaran nivîsar bicih kiribûn. Pirtûkxaneyên Mîtannîyan bi nav û deng bûn.

Mîtannî, li herêmê serdest bûn. Navend û paytaxta wan berfiratê Weşûkanî bû. Serdestîya wan li herêmê pirr zêde mazin û bi bandûr bû. Qasra misrîyan a firawûnan jî mazinahîya Mîtannîyan ji xwe re mînaq digirtin. Li ber wan ne dirabûn. Ji xwe, bandûra Mîtannîyan wusa hebû, ti kesekî, ne dikarî ku ber wan xwe bide nîşandin. Di wan deman de, dem bi dem hêrîşên hovane li keviyên welêt dibûn. Lê Mîtannîyan hemû jî, bi şûn ve didanê de. Hevgirtineka wan ya mazin hebû. Di şervanîyê de, ti kesek li ber wan ne dikarî xwe bigirta.

Mîtannî, sûwarîyên wê ên ku ti kesek li ber wan en disekinî, yazdanê wan ê mazin, ew bihêz kiribûn. Ew mazin kiribûn. Mîtannî, dema ku em bahse wan bikin, divê ku em bibêjin ku xwediyê pergaleka xwe ya civatî ku pirr pêşketî û di wê de perwerdekirin jî pêşketî bû. Pertûkxaneyên wan ê mazin û tişî hebûn. Ji ber wê zanebûna wan, ji her deveran ên ku qastî wir dikirin dibûn. Bi teybetî, zanistên demê, ewder ji xwe re weke navendekê dibijartin. Hertimî, xwe digihandina wir. Li wir, hizrên mazin di serê xwe de bicih dikirin û piştre dihanîn ser ziman.

Mîtra, di wê demê de, li welatekî bi wî rengî û pêşketî dijî. Ew li wir, bihizrên mazin dijî. Sazûmana civatî li wir pirr mazin û bixortî hebû. Laleşa Nûranî li wir hebû. Weke sazîyaka civatî ya pirr zde pêşketî li wir hebû. Mîtra, li wir, dima.

Dem ku hinekî buhurî, Mîtra, di wê demê de, bihizir bû. Dem gihişt berêvarî û piştre ne bi gelekî re bû êvar. Mîtra, piştî ku dem bû êvar, êdî li qasra wî, civat li darket û pirr mazinên civatê li male wî bûna kom. Di wê de, dema ku civate male Mîtra ava bû, herkesekî farqkir ku wê rojê farîyek bi Mîtra re heya. Di wê demê de, hê bavê Mîtra Sax bû. Mîtra, bavê wî di nava civate ji civate re bidest axiftinê kir, lê ew bêdeng di cihê xwe de mabû sekinî. Lê di wê demê de, Bavê wî ji wî ne pirsî. Mîtra jî, di serê xwe de bi ya di serê xwe de bi tenê ma. Wusa di nava hizran de di rewşeka bi hazn de ma.

Ku dem hinekî buhurt û pêde, piştre civate li qasra bavê Mîtra jî, ku dem bi derengîyê ket, ew jî, ji hevdû belav bûn. Piştî ku civat ji hevdû belav bû, Mîtra û bavê xwe bi tenê man. Mîtra, pştî ku ew bavê xwe bitenê man, bavê wî ji pirsî ku ka çima wusa bi hazn di hizir de ya. Mîtra, dema ku bavê wî ji wî pirsî, tiştek di xwe de vêşartî ne hişt û hemû tişta ku di wê rojê de jîyayî di serê wî de bicihbûyî ji bavê xwe re hanî ser ziman. Bavê Mîtra ji wî re got ku «ewa ku te dîtîya, baxte rastî te hatîya. ´Rêya nîşankirîya.´ Bavê Mîtra ev gotin ji wî re got, lê Mîtra weke ku bi tememî fahm nekiribû. Mîtra, yazdanê wî çi dewlemendîya cihanê hebû dabû bû wî. Li dunyê, ew ti tiştî jêma(mahrûm) ne hiştibû. ..

Mîtra, di wê demê de, pirsek bersiva wê ji yazdanê xwe dixwest. Bo vê yekê, di wê rojê de, gelek caran, diçû cem ga´yê xwe ku jê pirs bike û ew jî pirsa wî bide. Mîtra, di wê rewşê de, ´qawlek´ dixwest bo wê fahmkirina wê rewşê.

Ya ku mîtra Nizanîba, wê ga´yê wî yê ku hêza xwe û kûdret û zanîna ji wê bigrta. Ew ga´ kûdreta wî ya pîroz hebû.

De ne, Mîtra jî bawer dikir û berî wî jî Mîtannîyan û kalkên Mîtannîyan jî bawer dikirin ku «dunya di ahangekê de ya li ser stirhên ga» Ev bawerî, hebû. Ew ga´yê ku dikarî dunyê li ser stirhên xwe di ahangê de bigrê û bi wê bikûdreta, wê xwediyê bersivên bo jîyanê jî ba.

Mîtra, di wê demê de, bihizir bû. Gelekî di serê xwe de bihizir bû. Carna wusa di serê xwe bihizir dibû ku weke ku ji wê dunyê serê dunyayaka din di serê xwe de. Wusa lê dihat. Dema ku ew wusa di serê xwe de diçû, ew jî nîşanaka tiştekî bû. «Rêya di aqil de, digihişt yazdanê mazin.» Ev hiş, bi Mîtra re jî hebû. Mîtra, dema ku wusa dihizirî û di serê xwe de diçû, weke ku ji dunyê qût dibû. Yazdanê wî, dibêt ku dixwest ku wê, wî bigihêne derna di serê wî de. Ev hiş, demekê di serê de Mîtra de afirî û bû. Lê Mîtra bi wê weke ku ne digihişt bersivekê di serê xwe de. Mîtra, hîs dikir ku dixwest ku ew gotinekê bibîhîzê ku wî tê bike. Lê Wê navaroka wê gotinê ji aliyê yazdanê mazin ve çawa bihate tişîkirin bihiş, ew jî ya ku di serê Mîtra bi merqî hebû.

Mîtra, demekê wusa bihizir di xwe de hizirî û li bersivan gerîya. Di nava wê xweşî û dewlemendiyê de, weke ku êdî ew ne dijîya. Ew, weke ku di wê de, êdî weke ku ne di farqê de jî bû. Wusa lê hatibû.

Mîtra, di wê demê de pirr zêde serî li ga´yê xwe dixist bo ku bersivekê hilde. Lê Mîtra bêbersiv bû. Ew dem jî, dema ku germehîya rojê pirr zêde li ser rûyê ardê hebû û **Tûpişk** jî derketibûn ser axê. Bi vê rewşê re, tûpişk jî, awayeka wan ya pîroz bi rojê re ku bi têkilîdanînê re

hebû. Weke ku çawa marê reş ew pîrozî bi heyîna kosmosa fezeyê re pere hatibû danîn û pîrozîyek jî hat ku di dema Mîtra de pê hatibû baxşkiirn hebû. Ev rewş, hemû di serê mîtra de jî weke xwe bi nirx hebûn. Mîtra, di wê demê de, di serê xwe de xwe pirr dida hizrandinê.

Ew, ´baxt´ê wî çi bû. Ew baxtê ku bavê wî ji wî re bahs kiribû çi bû. Mîtra li ser wê dihizirî. Mîtra dixwest ku wê fahm bike. ´Baxtê mirov´, di nava Mîtannîyan de dihat bawer kirin ku ji aliyê yazdanê mazin ve hatîya kifşkirin. Ew bi ´wîna yazdanê mazin dijîn´. Bi vê yekê jî, ew bivîn in. Vê hizrê û rengê wê, hêzek dikira dil û serê Mîtannîyan de. Ew bihêz dikir. Bi wê hêzê, Mîtannîyan, xwe pirr zêde bi hêz didît. Ji xwe bi bawer bûn. Ji xwe bi ewla bûn. Bawerîya wan li wan tam bû.

Mîtannî, di vê temenê de, di rewşeka mazin de bi hiş dijîn. Dema ku em bahse Mîtannîyan bikin, divê ku em bibêjin ku ew bi aqilê xwe serdestî dunya xwe û hewidirdora xwe bûn. Divê ku mirov vê yekê di serî de bi wan û navê wan kifş bike.

Hizratî, di nava wan de pirr zêde pêşketibû. Hizratî û ankû ´felsefe´, di wê temenê de weke hizreka ku oldarîya wan pêş dixist. ”Ew bi aqilê xwe re pirr ji xwe buhurî bûn.”

Mîtra jî, wusa bû. Divê ku mirov bo wî jî heman tiştî werêne ser ziman. Mîtra, di dema xwe de, bi aqilê dema xwe dijî. Ev dema wî jî, biaqilekî mazin dijî. Ew aqilê mazin jî, li wê demê serdest bû, weke ku çawa ku wê li demên piştre jî serdestîya xwe ji temen ve bide denezendin.

Mîtra di wê demê de dihizirî, lê di serê xwe de hê hizreka wilo ku wê qanix bike û têr bike ne gihiştibûyê de. Bi wê re jî, wî di xwe de wusa hîs dikir ku divîya ku bigiijê tiştekî, Lê wî bixwe jî, ew bi tememî weke ku salix ne dikir. Lê hîseka wî hebû ku ji wî re digot ku ”tu di rêya rast de jî” bi wê hizirkirina wî re.

Ew dem, divê ku mirov bibêje ku demeka ku bi aqil serdest bû. Bi teybetî li ber firatê ew serdestîya ku hebû, divê ku mirov bibêje û bahse wê bike ku pirr pêşketî bû. Hewirdor, bi daristan û zevîyên xwe re şîn bû. Ava-firatê, her der şîn û xweşîk û bi bereket kiribû. Dewlemendîyek mazin li wir afirandibû. Mîtra, di nava wê dewlemendiyê de dijî. Mîtra, yazdanê wî, tiştek nema bû ku li dunyê ku nedabû bû wî. Bi wê yekê, ew li dunya wî pirr têr kiribû. Bavê wî, xwediyê qasre mazin bû.

Ku em bahse welatê Mîtannîyan bikin, divê ku em bibêjin ku mitannî di jîyane xwe de pêşketî û serdest bûn. Bi tifra jî bûn. Jinên wan pirr xweşîk bûn. Pirr jî, li xweşîkatîya xwe dihizirîn. Endeko li xwe dikirin.

Bi wê re, bi sînor nema diman. Lawanto jî, çê dikirin bi wê bêhna wê re bixwe re diberdan. Lawanto ji ava gûlan dihat çêkirin. Di wê de jî, pirr pêşketî bû. Jinên wan, hertimî cilên xweşîk li wan bûn.

Mîtra, bawerîya wî bi yazdanê mazin hebû. Li dunyê, yazdanî wî ê mazin ew bicih kiribûn. Lê ji bilî wê dunyê, dunyê din jî hebûn. Heyv(sîn) hebû. Her wusa dunyê din jî hebûn. Lê roj rohniya herî mazin ya yazdanê mazin bû. Mîtannîyan bawer dikirin ku ”yazdanê mazin, ew ji rûha xwe çêkirina.” Bi wî re jî, Mîtra, weke ku wê hin bi hin bi navê wî re êdî ku wê were ser ziman, ”ew zaroyê yazdanê mazin a” û ”ji wê rohniya yazdanê mazin a. ” Mîtra ”kûrekî ji wê rohniya yazdanê mazin a.”

Mîtra, roja (kû li gorî salnama(**taqwîm)** zayînî tê hasibandin) ew di 25´ê berfanbarê de hatîya dunyê. Ew roj, weke rojbûna wî ya ku bûya weke destpêka salê jî piştî Mîtra re. Sersal, bi Mîtra re bi vî rengî destpêkirîya. Bo vê yekê, her timî serê salê hatîya pîrozkirin. Ji ber ku roja rojbûna mîtra ya.

Mîtannîyan, di çanda wan de, heyîn û hebûna ´sersal´ê, divê ku mirov bi teybetî bahse wê bike û werêne ser ziman. Ev heyîna sersalê, wê piştre bi hezaran salan jî werê pîroz kirin. Di vê rojê de, hêk, zer dihatina xamilandin. Ji ber ku rohniya rojê zer bû. Şîn jî dihat xamilandin, ji ber ku şînayî şîn bû. Rengên jîyanê hemû rengên ku yazdanê mazin dabûbûn. Bo vê yekê, ew hemû dihatina bikarhanîn û rengê zer jî li ser wan dihat danîn û dihat dayîn kifşkirin.

Mîtra, di wê demê de, wê demeka dirêj bihizirê. Di wê dema hizirkirina xwe de hêvîyeka bi bawerî ji ga´yê xwe jî bike. Her timî li cem ga´yê xwe dima. Kêlîkên xwe hemû, wî bi ga´ re dihuhurand. Bi wê re jî, dihizirî ku wê tenê bersiva xwe ji wir bigirta. Mîtra, di wê hizrê de bû di serê xwe de.

Dem di buhurt. Roj li ser rojan dibûn. Lê Mîtra, weke xwe ma. Riha wî derket. Di nava dewlemendiyekê de bû. Lê cil û bergên li ser wî qatîyan û lewitîn. Mîtra, wwusa di rewşekê de ma. Mîtra, di serê xwe de bi rohniyekê bû. Ew jin, gelo farîşteyek bû.? Mîtra, ev pirs jî ji xwe kiribû. Navê cihê ku çûyê de ji Mîtra re hanîbû ser ziman. Ewder, ´weşûkanî´ bû. Ji wî ne dûr bû. Mîtra jî, di nava sînorê wê herêma ku di xweşîyê de sînor ji xwe re ne hiştîya.

Dem hat roja ku wê cejn bûba. Ew cejn jî, cejna Mihregan bû. Cejna pîrozîkirina li ardê bicihbûna bi pîrozîya xwe re ya cihê berga wan jî bû. Ew roja ku rohnîya li ardê de dibû. Yazdanê mazin, çav li ardê dide. Di

wê rojê de, wê di ´ava-paqij, ku ji bihûştê di harikê li dunyê û tenê ew ava pîroza ku keçekaka ku dest lê neketî wê xwe bişoyê û wê zaroyak wê weke peymannêrê yazdanê mazin were ser rûyê ardê.

Ew roja cejnê nêzî bû piştre hat. Agirdadvanan li her deverê, ne hiştin ku agir bi mivrê. Wan karê xwe bi bawerîya xwe dikir. Bi wê jî, li her deverê gerîyan û ew ”agirê pîroz” ê ´tarî´ pêdixistin. Ew ´agirê tarî´, agirekî ku hêza xwe ji ya yazdanê mazin digirt. Rohniya yazdanê mazin geş dikir. Dida nîşandin ku çendî hêza yazanê mazin xorta. Oldaran, bawer dikir û digot ku ”ev agirê li dunyê, çi bikeve nav di şawitêne hindî dijwar a. Lê agirê yazdanê mazin sadhezar qatî ji wê dijwartira.” Ev gotina wan bû. Bi wê yekê, wan gotina xwe dihanî ser ziman.

Mîtra, bi wê rewşê re li ser ´baxtê´ xwe û mirovan pirr hizirî. Piştre, hin bi hin dengê yazdanê mazin weke ku dihat wî. Mîtra, wilo di xwe de hîs diikir.

Dem ku hinekî din di buhurê. Mirovên li dora Mîtra jî, êdî wê farqîtîya di wî de kifş dikin. Bi teybetî, oldar wê kifş dikin. Mîtra, di nava oldaran de, derdikeve li pêş. Ew yekî xwanda û bizane ya. Zanîna wî, pirr zêde heya û divê ku mirov bibêje ku pirr zêde heya. Roj ku tê roja cejnê, êdî cejn hin bi hin bidest pîroz kirinê dihê kirin.

Mîtra, di wê demê de tiştekî jîn dike. Rojekê, dema ku derdikeve derve û devê derîyê xwe vekirî dihêle. Ga´ jî, di wê demê de dema ku derîyê vekirî dibîne derdikeve û bazdide. Mîtra, hingî li ser wê dihizirê. Dixwezê ku wateyekê bide wê rewşê. Lê mîtra, dema ku dihizirê, di serê xwe de digihijê vê hizirê ku ji xwe bixwe re dibêje ku ”yazdanê mazin ku tu(ga) jî û min jî çêkerî ya. Ew li ser me hemûyan re ya. Ew hemû tiştî dibînê. Xwediyê hemû tiştî ya. Ew kifşkar a. Xwediyê hişê herî mazin a. Ew dide kifşkirin.” Mîtra bi hizir û vace xwe digiihijê vê hizrê di serê xwe de.Piştî vê hizrê, Mîtra, dikeve ser rê de û dike û dixwezê ku ga´yê xwe bibîne, Piştre jî, Mîtraga´yê xwe dibînê û cardin têne malê û serê wî ga´yê xwe jê dike. Ev jêkirina serê ga a ji aliyê Mîtra ve, di nava xalkê de di cih de tê bihîstin û herkesek ji wê pirr şaş û acêbmayî dimênê. Herkesek mereq dike ku ka Mîtra çima serê ga´yê xwe jêkir. Ga´pîroz bû. Herkesek jî, wê dizanê. Ew, tiştekî pirr mazin bû.

Di wê demê de, ên ku li Mîtra bi hêrs dikin jî hena. Lê Mîtra, di ya di serê xwe de zelal û safî ya. Ew, weke ku di zanê ku çi dike. Bi wê rengê li ber hemû kesekê li dora xwe tevdigerihê.

Herî zêde oldar, ji wê rewşê û kirina Mîtra bişaş û mat dibin. Piştre ku demek bi ser wê gurandina ga a ji aliyê Mîtra ve di buhurê, wê

oldarekî ku pirr pîr û kal a, wê were û li ber Mîtra bihizirê û ji wî bipirsê ku ka çima wî wusa kir û ga gûrand. Ji ber ku bo wan jî ga pîroz û ti kesek nikarê dest lê bide. Ev yek, ji xwe kirin jî, gunahê wê jî heya. Mîtra, dema ku oldarê pîr û kal ji wî sebeba wê kirina wî ji wî dipirsê, Mîtra, Bersivê dide û dibêje ku ”yekî tenê heya û ew jî yazdanê mazin a.” ”Ew, li ser me hemûyan re ya.” ”Yê ku diafirêne û dide ew a.” ”ji wî hêvî bikin û ji wî re bergê bikin û ji wî bixwezin ku gunehê we afû bike.” Li ser van gotinên Mîtra, wê oldarên li dora wî bidet hizirkirnê û nîqaşên di nava hevdû de bikin. Piştre jî, ên ku wê kirina Mîtra herê dikin bi gotinên wî re dibin. Û ên ku herê nakin jî dibin. Mîtra, piştre, hizrên xwe dihêne ser ziman. Bidest hanîna ser ziman a hizrên xwe dike.

Mitra, biaqil dihêne ser ziman. Piştre jî, Mîtra, divegerihê qasre xwe û bergê ji yazdanê mazin re êdî dike. Mîtra, êdî weke ku di serê xwe de gihiştibê tiştekî din di xwe de lê tê. Di wê rewşa xwe de dihizirê. Mîtra, Haspekî wî ê sipî hebû ku dema ku diket bazdanê de weke ku bifirê lê dihat. Hingî bazek bû û xort bû. Mîtra, piştî ku hat qasrê, piştre weke demekê dimenê û piştre wê li haspê xwe sûwar bibe û wê ji qasrê bi aliyê rojê ve bidest dayîna bazdane haspê xwe bike. Ên ku Mîtra bi wî çûyîna wî ya bi haspê dibînin dibin. Ji wê rewşa çûyina wî, gelek bi bandûr dibin. Mîtra, piştî diçê, wê demeka dirêj bimêne û newê. Lê piştre ku demekê dimêneê, wê êdî vegerihê û were, di wê demê de, ku Mîtra vegerîya, Mîtra di destê wî de tiştek hebû. Hinek nivîsar hebûn. Wan têne û didêne ber oldaran û dibêje ku ev ”fidîya” na û gotinên yazdanê mazin in.

Li ser vê gotina Mîtra êdî oldarên wî wê li nivîsarên Mîtra binerin. Nivîsarên ku Mîtra danîna berwan, ti kesek nikarê gotinekê û tiştekî ji wan re bibêje. Mîtra, piştre tê male. Di male wê de, bi dehan kerîyên wî hebûn. Kerî meh û bizinan, garanên çêlek û ga´yan û hwd hebûn. Garana haspan hebû. Hê ti çi bixwezê hebû. Ku herina ber wan kerî û garanan jî bi dehan şîvan jî hebûn di malê de. Mîtra, wê dewlemendîya xwe hemûyî, bidest dayîn û belavkirina di nava faqîr û xizanan de bike. Ku hinek oldar ji wî dipirsin ku ka çima vê yekê dike, wê mîtra bersivê bide wan û bibêje ku ”yê ku ev dane yazdanê mazin in. Ev dane, dikarê hê zêdetir jî bide.”. Piştre jî, weha jî dibêje ku ”ew ê ku min dan, nasibê ên ku min dane wan in.” Bi vê gotinê Mîtra bersiva xwe dide.

Li ser vê gotina Mîtra, herkesek dihizirê. Tevgerên Mîtra ên ku ew dide nîşandin, herkesek hewl dide ku fahm bike. Lê ti kesek, nikarê bêje ku ez bi tememî û b başî fahm dikim. Rewşek bi vî rengî hebû. Mîtra,

gotinên ku dihanîn ser ziman, ti kesekî ne dikarî ku wan gotinan bêne ser ziman. Gotinên wî pirr bi aqilane bûn. Ên ku li ser gotinên wî ên ku wî dihanîn ser ziman ku dihizirî, ji gotinên wî re ku weke bersiv bide, gotinên di serê xwe de ne didîtin. Bo vê yekê, kê ji wî dibihîst, digot ku ”ev van gotinan ji kûderê dibînê di serê xwe de û dihêne ser ziman.”

Mîtra, wê di wê dema xwe de di demek pirr kin de, navê wî bi wê re pirr zêde were bihîstin. Li ser wê yekê jî, wê keyê mîtannî ê demê jî wê bixwe jî ku wî bibînê. Piştre jî, wê key, çend mirovan rê bike ku herîn û wî bibînin û werênina ber wî.

Keyê Mîtannî, serdestîya wî mazin bû. Di qasre wî de, weke şêwirmend û wezirên wî, bi dehan mirovên ku li dîwane wî bûn hebûn.

Key, piştî ku mirov şandin pay Mîtra, êdî ne bi gelekî re ku Mîtra di nava wan de ya, wa mirovên ku key şandibûn wa hatin û Mîtra li ber key dan sekinandin. Di wê demê de, ku Mîtra hat, keyê Mîtannî, hinekî tenê li wî meyîzend. Mîtra, mirovekî levhatî bû. Li ser xwe bû. Dirêj bû. Ku key, weke demekê lê nerî, piştre key, bahse gurandina ga kir û sebeba wê ji Mîtra Pirsî. Mîtra, dema ku key jê pirsî, êdî wî jî bi awayekî ji xwe biêmin bersiva key da. Key, dît ku wa Mîtra ji xwe û gotinên xwe bi êmin û ewla ya. Êdî piştre key weha ji Mîtra re got, ”nûha tû bi van gotinên xwe dibêje ku ez ji van mirovên li vir hemûyan bi zanetir im.” Ku key wusa gotinaka weke pirsekê kir ji Mîtra, êdî Mîtra hinekî ma sekin. Ev gotina weke pirsekê, weke ku Mîtra jî ne li bendê bû. Lê Mîtra, li pişt gotina xwe ma û di temenê ku bêje herê de çend gotin li ber key gotin.

Piştre, key, şêwirmend û aqilmendên xwe yên herî zane derxistina li pêş û ji wan xwest ku bi aqilê xwe re bi Mîtra re bikevina axiftinê de. Ew jî, mirovna ji xwe bi bawer û ji aqilê xwe bi bawer bûn. De na, car bi car, di nava me kurdan de dihê gotin, weke gotinaka xalkê ku ”mirovê biaqil, ji aqilê xwe razîya”. Bi wê re, dîsa weke gotinaka xalkê dibêjin ku ”mirovê ku ji aqilê xwe razî jî, mirovê ku ji xwe qayîl a.”

Vêca, divê ku mirov bibêje ku rewşa wan şêwirmend û aqilmendan jî hema bêja wusa bû. Bi aqilîya xwe pirr bi bawer bûn. Piştre, ku ew derketina li pêş, êdî bidest axiftinê kirin bi Mîtra re, Demeka dirêj, ew bi Mîtra re axiftina û çi ji mitra pirs kirina, mîtra, yek jî ji pirsên bêbersiv ne hiştîya û hemû bersivandina. Herkesek li wir maya pirr şaş û mat. Piştî ku êdî şêwirmend û aqilmend, êdî weke ku tiştek di serê wan de nema bê ku bipirsin mana sekin. Lê Mîtra nema sekinî. Mîtra, bi dest pirsîna ji wan kir.

Mîtra, di derbarê aqil yazdanê mazin de, pêşî axift û piştre hizrên xwe hanîn ser ziman. Mîtra, bi gotinî çi hanî ser ziman, herkesekî pirr bi heyîderî lê hisand. Ji gotinên Mîtra, herkesek ma şaş û acêmayî. Mîtra, ew gotinên wusa mazin û bizane ji ûderê dihanîn di serê xwe de? Ev pirs, weke pirsekê di wê de, di serî hemû mirovên li wir bûn de bû. Herkesekî bi çavna raq li Mîtra nerî. Mîtra di nava wan çavên raq û nerînî şaşmayî de, axiftina xwe bi dawî kir. Piştre jî, ji wan, weke ku gotinê bixwezê bihisêne li wan nerî. Lê di wê demê de deng ji ti kesekî derneket. Her kesek bêdeng mabû sekinî di cihê xwe de. Key jî, bêdeng bû. Çavên key, hem li ser şêwirmend û aqilmendên wî bû û hem jî li ser Mîtra bû. Key, weke ku bixwezê bibêje ´dê gotinekê bibêjin´ li nava çavên wan nerî. Lê deng ji wan derneket.

Mîtra, piştre, ku demeka din jî li wir dimêne û piştre, êdî ji dem key û şêwirmendan bi xwestina destûrê re derdikeve. Mîtra, dema ku derdikeve, êdî rastûrast tê parastgehê. Li wir, oldar û mirovên pîr û kal bi hevdû re rûniştî bûn. De na, mirovên pîr û kal, weke oldar jî jî dihatina dîtin. Weke mirovna dihatina pêşwazîkirin.

Mîtra, piştre ku hat parastgehê li parastgehê, wê demekê bimêne û di nava wan oldar û mirovên pîr de rûnihê.Hinekî wê bi wan re biaxifê.

Di wê demê de, Mîtra, heya wî çû li ser kûncûka ´lelînîşê´. Li wir, li nêzî wir, ew jina ku wî berê dîtibû li wir. Mîtra çavên wî bi wê jinê ketibû. Jinê jî, piştî ku ew dîtibû, êdî heya wê çûbû bû li ser wî. Jin li wir, weke karmendekê disekinî. Ji rewşa wê ya wê kêlîkê ev yek wusa dihat dîtin û fahm kirin. Mîtra jî, wusa fahm kir.

De ne, li parastgehê, jin û mêr bi hevdû re man di deman bergkirinê de. Bi hevdû re û di rex hevdû de disekin in. Di parastgehê de, «jinên pêşeng» hebûn ku ew karekî wan ê pîroz jî li parastgehê hebû. Jin, xwedî gotin bûn. Wekhevîya di nava jin û mêr de, li wir di dema li rex hevdû de di sekinîna wan de dihat dîtin û fam kirin.

Mîtra, piştî ku hat parastgehê, êdî tevlî oldaran bû. Lê aqilê Mîtra di wê demê de weke ku li devereka din bê dihat berçav. Dema ku mirov li rewşa wî dinerî, mirov ev yek ji wî fahm dikir. Mîtra, Çi dihizirî? Gelo, li wê dema ku bi şêwirmend û aqilmendan re diaxift dihizirî? An jî, gelo li tiştna din û deverna din dihizirî? Ew di wê demê de di serê wî de bû. Ku wî ya di serê xwe de ne gotiba, wê kê zanîba?

Mîtra, di wê demê de, weke demekê bi hizir bihazn ma. Di serê xwe de dihizirî. Ew jina bi navê Xûrê jî, li wir bû û heya wê li ser wî bû. Mîtra, dibêt ku ew farq dikir. An jî, dibêt ku hingî di serê xwe de dihizirî

û bi hizirkiirna xwe re di wê demê de li deverna din bû û heya wî ji wan awirên li ser wî ên wê demê tûna bû.

Mîtra, piştre demek têve çû bi ser wê rewşa wî û hizirkirina wî de. Mîtra, pirr bi hizir ma. Mîtra, di wê demê de, demeka dirêj wusa ma. Lê tevî ku wusa bi hizir jî bû, pirsên ku ji wî dihatina kirn û hizrên ku ji wî re dihatina ser ziman, wî di bersivand û li wan dihisand. Ew, di wê demê de dihişê hisandina xwe de bû. Mîtra, lê dihizirî. Tişta ku wî pirr zêde didane hizirandin di serê wî de di wê kêlîke de hebûn. Mîtra, ev yek ji wê rewşa wî dihat dîtin û fahm kirin.

Mîtra, di wê demê de, heta ku ro diçe ava dinava oldaran de dimêne û diaxifê û li wan dihisêne. Lê ku ro çû ava, êdî Mîtra jî, ji parastgehê buhurt male xwe. Li wir, li ber koza êgir rûnişt û ma sekinî.

Mîtra di wê demê de, weke ku di serê xwe de li ser yazdanê xwe yê mazin dihizirî. Li ser wî, di serê xwe de diçû dihat. Di wê dema ku wî bi şêwirmendên key re danûstandin kiribû, yazdanê wî alî wî kiribû ewqas gotin di serî wî de bicih kiribûn bi rêya gîyane wî. Di bawerîya Mîtra de, ew hebû ku ”mirov bi gîyane xwe re digihijê yazdanê mazin.” Ji ber ku ”gîyane mirov ne mir bû.” Lê laşê mirov dimirê û diçê axê. Ew dimir. Lê gîyan namirê. Ew nemir bû. Gîyane , her mirovê ku mir, wê herê azmana. Li wir, piştre, wê bi laşekî û ankû rewşeka din ya jîyanê were û li jîyanê bijî. Her tişt, di jîyanê de dijî. ”Herkes û her tiştê dijî li jîyanê, mafê jîyane xwe ya ku dijî ji yazdanê mazin girtîya.” ..

Mîtra, xwe weke ”zarastê” yazdanê mazin didît. Zarast, ê ku ji nûrha yazdanê mazin a. Ji rohniya wî afirîya ya. Ew, ji wê rohniyê bû. Yazdanê mazin, mirov bi gîyane mirov ji wê rohniya xwe çêkirîya.

Mîtannî, navê yazdan, di nava wan de bicih bû. Pergale wan ya bawerî û olî xort bû û pêşketî bû û bi hizir bû. Mîtra, hizrên xwe li gorî wê dihêne ser ziman. Mîtra, gotina ´yazdan´, dike temenê pêşketina civatî a ku êdî wê pêşbikeve bi demê re. Bi wê re Mîtra, ol bi aqil hanîya ser ziman. Lê divê ku mirov vê yekê bi teybetî bibêje ku Mîtra aqilê bivac kirî kifşkirîya û dihêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov heyîna aqilîya vacî, di serî de bi navê Mîtra re kifş bike.

Mîtra, di nava oldaran de, di bin nerînên lêpirsîbar de bû. Piştî ku wî ga´ gurandibû û pê de, ew nerîna lêpirsîbar çûbû bû li ser wî. Di wê demê de jî, ew di bin wan nerînên lêpirsîbar de bû.

Mîtra, di wê demê de di cihê xwe de bêdeng bû. Lê ew dem jî, dema cejnê bû û pîroz bû. Mîtra, piştî ku wusa demekê mabû bû, piştre bi tevger bûbû û ji cihê xwe rabû bû. Mîtra, piştra li ser ga´ hin gotinên din

jî gotibû. Mîtra, ew gurandin, weke ´baxt´ bi nav kir û li ber oldaran hanî ser ziman. Hinek oldarên ku wê rewşê ji oldarîya xwe re weke hêrîşekê jî dibînin, di wê demê de li wî hisandina. Mîtra, gotinaka li ser gurandina ga´ got û weha got, ”ev baxt bû ev da kirin, Yazdanê mazin ew da kirin. Ku ew baxtê ku yazdanê mazin xatkirî, bo ku li dijî wê û vajî wê nebin, divê ku win xwe tevlî wê xatê û baxtê bikin.” Mîtra, ev gotin, weke bangekê li ber oldaran û ji wan re kiribû.

**´Ga´ û ´gurandina ga´ û ´xwarina pîroz´.**

Mîtra, bi gurandina ga´ re mazinatî, serdestî û yekîtîya yazdanê mazin denezend. Lê Mîtra, bi gurandina ga´ re kevneşopîyek û bawerîya wê ya bi hezaran salan ku hebûna xwe heta wê demê domandibû dabû bû berxwe. Ew, kevneşopîya bi hezaran salan, heta wê demê civat afirandîya. Bawerîya li wê, li her deverê welêt heya. Wê ev çawa bûba? Mîtra, bi vê rewşê, rewşeka nû afirandibû. Di derbarê wê kirina mîtra de, herkesek di serê xwe de û bi zanebûna xwe re ne têr bû.

Lê Oldaran û pîran jî, dixwestin ku wê rewşê fahm bikin. Di nava civatên xwe de, li ser wê rewşê pirr didan û distandin.

Mîtra, dema ku ga gûrandibû, di rewşeka cuda de bû. Piştre jî, dema ku ji qasra key hatibû parastgehê û li wir tevlî oldaran û pîran bû, li wir, hine oldaran ji wî pirsî bû ku ka çima û çawa ga gûrand. Ew bûyar, bûyaraka ku dimejîyan de pirr deng veda bû.

Di wê demê de, dema ku oldarakî ji Mîtra pirsî ku ”tu dibêje ku min bi navê yazdanê mazin ew gurand.” ”Min, bo ku bidina nişandin, yazdanê mazin, rabê me ya û wî em hemû û ew ga jî afirandîya.” Yê afrîner ew a.” .. Ku oldar, bi vî rengî li ber Mîtra axift, dibêt ku wê hin gotinna din jî, bi ser gotinên xwe ve kiriba. Lê Mîtra, di wê demê de cih de mafê axiftinê girt û weha ji Oldar û pîrên li dora xwe re got.

”Ew hîs û hişa wê, ji yazanê mazin hat. Dema ku min bidest gûrandina ga kir, li dunyê tu tiştekî ku wî ga´yî bigûrêne min nedît. Di wê demê de bi fermane yazdanê mazin dunyayakê ji azmana xwe kir rê û xwe gihand min ew şûrê tûj ku ´tîrêja rojê hatîya çêkirin´ da destê min û piştre bi wê min ew ga gûrand. Piştre jî, dema ku min ga gûrand, bi ferman xwûdê, ew ga, xwûna wî li ser rûyê ardê belav bû. Her dilopa xwûna ga, bi ´tirh´ek û li ser rûyê ardê wê xwe şîn bike. Ew goştê ga´ wê bê kelandin û wê bê danîn li ser sofrê û wê cihê yazdanê mazin lê were kifşkirin. Ez jî, ezê li rûniştî bim. Wê her xizan û faqîrên ku hena, wê li ser wê sofrê rûnihin. Bi navê yazdanê mazin ez dibêjim ku di wê demê de

ga bi ziman bû û weha li ber min got ku ´bo ku win bi min re bibina yek û ez jî bi were bibim yek, ên ku ji laşê min nexwûn û ji xwûna min nevexwûn, wê xilasbûnê nasnekê û yazdanê mazin re nebê yek´" Vêca, ez nûha, gotinên ku bi navê yazdanê hatina gotin û ên ku ´ga´ ji we re hanîna ser ziman, ez jî ji were tênima ser ziman."

Mîtra, ku ev gotin li ber oldar û pîran got, êdî dii cihê xwe de ma sekinî. Mîtra, li navê çavên oldar û pîran nerî. Wan jî, bi bêdengî li nava çavên Mîtra nerî. Mîtra, Piştre jî, hê ku ti oldar û ankû pîran gotin li ber wî negotî, ev gotin jî, bi ser gotinên xwe ve kir. "ên ku balix bûyîna, ên ku piştre ku zewicîna, ên ku kurd in, ên ku şervan in û ku dikarin ´tîr û kavan´ biavêjin û şaş nekin, ên ku mar bi wan rêhevalîyê bike, ên ku bawerîya bêgûman bi yazdanê mazin û rojê hanîna, wê li dora wê sofra ku piştre ji xwarina goştê ga çê bikin bila li hevdû rûnihin." Bila nanê xwe di nava ava haoma de bikin. Lê bila xwe winda nekin. Bila, aqil û hişê hertimî li xwe bigrin û bihêlin. Ew, dema ku wan ev kirin, wê hingî yazdan mazin hîs bikin û wê bi wî re li ser heman sofrayê bin., Ne win dizanin ku yazanê mazin, ev cihê bergê ji were ji azmana hanî û danî ser rûyê ardê. Ev jî, cihê pîroz a ku ji wî ya."

Mîtra, piştî ku ev gotin jî, bi ser gotinên xwe ve kir, êdî piştre ma sekinî. Oldar û pîran, li ber wan gotinên Mîtra, gotin di serê xwe de ne dîtin ku bibêjin. Mîtra, pirr xweşîk dihaxft û dihanî ser ziman. Gotinên xwe pirr xweşîk lev dihanî. Gotina "zanînê" û "hiş", gotinên ku wî hanîbûna ser ziman.

Di wê demê de, çend ku hê di serê xwe de ne têr bûn û bi tememî ne xwediyê zanînaka mazin jî bûn, hinek oldar û pîrên ku ne bi dijberî û başî li gotinên Mîtra dinerîn hebûn. Lê ew jî, bêdeng bûn. Weke ku li rewşê dinerîn ku ka wê oldar û pîrên din çi bibêjin. Ji ber ku ew rewş, rewşeka pirr giring bû. Tiştekî din jî, pirr zêde bandûra wê li ser oldaran jî û li ser xalkê jî ku bûbû bi navê Mîtra re, ew bû ku çûyîna qasrê û bi şêwirmendên key re ketîna wî ya danûstandinê û piştre bi serketî ji wir derketina wî bû. Xalkê jî, digotin ku "dema ku key, li ber wê derneket û zanayên li dora wî, gotin li dijî ne gotin, wê çaxê ev rast a. Mîtra rast kirîya!" Bi vê gotinê, li Mîtra dihiizirîn. Mîtra, bo vê yekê, ne di nava xalkê de û ne jî di nava oldaran de çend ku hinekî dijberî di nava wan de li ber wî hebû jî, ew bidengekî bilind ne hatibû ser ziman. Lê Mîtra, dema ku ga gûrandibû, Mîtra, ga û pîrozîya ga red ne kiribû. Mîtra, got ku "her ga´yê ku were gûrandin, wê gîyanê wê bi destê yazdanê heyvê´ wê herê heyvê û li wir wê pêşengîyê li cem xwûdê bikin. Wê ew bidina kişavanên

taxtê yazdanê mazin bin. Her gîyane ku mir, wê li sûwergeekê sûwar bibe û ew ga, wî wî bikişênin bi ber azmana û rojê de ku wan bigihênina cem xwûdê. Wê hingî, ew ga, bina rêya we ya gihiştina cem yazdanê mazin. ..”

Mîtra, ev gotin li ber oldar û pîran got. Ev gotinên Mîtra, gotinên nû bûn. Mîtra, pîrozîya ga red nakê. Ew herê dike. Lê ew bi rengekî din şîrove dike. ”Bi xwûna ga ya ku rijiha li ser ardê wê jîyan bitirh bibe.” ”bi goştê wî, wê sofra pîroz ya yazdanê mazin ku herkesek jê bixwê wê bê danîn.” ”Bi alîkarîya Lûna(weke yazdanê heyvê tê tefsîrkirin..)′ jî, wê li heyvê li azmana ku gîyane dibina ber yazdanê mazin û rojê de wê bijîn. ”Van rastîyên ji bîr nekin.” Piştre Mîtra, gotinaka din jî, got. Ew jî, ew bû ku got ku ”wê ti kesek ji baxtê wî yê ku yazdanê mazin li ser navê wî nivsandî wê nikaribê bi ravê.” Ev gotinên Mîtra, gotinên bi aqil û zane bûn. Ev gotinên Mîtra, bandûra wan, hin bi hin xwe li ser oldar û pîrên civatê xwe dide der.

Mîtra, rastîyek mirovî jî bû. Mîtra, haspekê wî yê sîpî ku weke berfê sipî bû, hebû. Di bazê de, ti haspî ne dida pêşîya wê haspê. Haspê, Mîtra, bi ferman yazdanê mazin dikarî bifirê û bi ber rojê ve bifirê û herê. Mîtra, ku li haspê xwe sûwar bû, tîr û kavana li pişta wî jî hebû. Bi wê re diçû daristanê**. Lê dema ku haspê wî diçû li aliyê rastê ê hasp marekî rêwîtî bi hasp û mîtra re dikir. Li aliyê çapê jî şêrekî rêwîtî bi wan re dikir**. Mar, dagerek pîroz ya jîyanî bû. Lê mar, ew ahanga di çûyîna wî ya li ser ardê de Mîtra ji wê heyîna fezeyê jî didît û dihanî ser ziman. Mîtra, Li azmana, heyîna dunyayên din, dihanî ser ziman. «Heyîn û hebûna haft dûnyayên mazin ên li azmana», Mîtra li ser wan dihizirî û ew dihanîn ser ziman. Mîtra, ew heft dûnya, biawayekî din jî dihanî ser ziman. Mîtra, weke «haft, qatên dunyê» dihanî ser ziman. Yanî, weke «heft tabaqa» dihanî ser ziman. Mîtra, ku yazdanê mazin dixwest, ew li haspê xwe sûwar dibû û berê haspê xwe dide bi rojê ve û diçû bi ber azmana ve û ew her «heft qat» didît in.

Lê Mîtra bawer dikir ku «dema ku mirov mir û gîyane wî ji dunyê goçî dunya din kir, wê «taxtê» ku ga, wê dikişênin, wê ew gîyan li wê sûwar bibe û wê berê xwe bide bi ber yazdanê mazin û rojê ve û wê herê.

Ev bawerîya ku Mîtra dihanî ser ziman, berî Mîtra jî hatîya ser ziman. Lê Mîtra jî, ew hanîya ser ziman, Mîtra, hemû vegotin û şîroveyên olî ên berê, di dema xwe de weke ku ji nû ve şîrove bike û werêne ser ziman, hanî ser ziman. Mîtra, bi vê rengê, ji nû ve bi aqil û hişekî nû ê demî dihanî ser ziman. Teybetmendiya hanîna ser ziman a

Mîtra ya di wê demê de ew bû ku Mîtra, bi aqil di jîyanê de dihanî ser ziman.

Mîtra serî li ser xweza û heyîna jîyanê û destpêka wê dihanî ser ziman. Her wusa, car bi car, dema ku Mîtra serî li ser heyîna jîyanê û bûyîna wê diwastand, digot ku «dema ku Ahûra mazda û ard gihiştin hevdû û bi hevdû re bûn, hingî jîyan jî ji wê gihiştina wan a hevdû û ji wê bi hevdû re bûna wan afirî. Yanî, li vir, ard, temenê jîyanê ya. Jîyan li ser rûyê wê ya. Av jî, yazdanê mazin hanî ser rûyê ardê. Dema ku av û ard gihişt hevdû, jîyanê mey girt. Wê ´mey girtina jîyanê´, bi armancaka ku di serê yazdanê mazin de bû. Mey girtina jîyanê, ji wê gihiştina hevdû a av û ardê, êdî jîyan jîndî û zîndî kir. Xweza afirî. Daristand afirî. Her cûreyên zîndîyan afirî. Her zindî, bo ku bijî hatîya dunyê. Hemû jî, di jîyane de bi hevdû re û bi xwezaya xwe re diahangekê de na.

Mîtra, di heyîna jîyanê de û di temenê wê de, ev didît. Av û ard, bi hevdû re, dûnya afirand. Lê piştre yazdanê mazin dît ku av û ard, dema ku digihijina hevdû çendî ku diafirênin jî, ew ahang di nava wan de nabê. Piştre weke ´elementa sêyemin´ ji wan afirî, ew jî hewa ya. Hewa, wê her zindî wê biikişênina hundurê xwe û bi wê bijîn. Wê avê vexwûn. Wê ardê temenê wan û jîyane wan biafirêne. Ard, diafirêne. Piştre yazdanê, bo ku hebûna xwe jî di nava mirovan de bicih bike rohnîya xwe da dûnyê. Ji xweşîkatîya xwe, xweşîkatî da mirov û zindîyan. Agir, ji wê rohniyê afirîya. Her tîrêja rojê, di wê çîrûskên êgir hena. Ew çîrûsk, her yekê di wan de peyamek heya.

Mîtra, dihanî ser ziman ku laşê mirov divê ku bi gîyane mirov re di ahangê de bê. Ji xwe ku laşê mirov bi gîyane mirov re ne di ahangê de bê, wê jîyan jî pêre pêşnekeve. Gîyan, ji azmana yazdanê mazin hanîya xwerê li dûnyê. Gîyane mirov, zanîna wê pirr zêde heya. Em laşê mirov nikarê di jîyanê de xwe bigihêne hemû zanîna wê. Dema ku yazdanê mazin, gîyane mirov ji azmana ji cem xwe şand ardê, ew gîyan di her heft qatên dunyê ên azmana de di buhurê û piştre tê dûnyê û di laş de bicih dibe. Piştî ku bicih bû jî, êdî ew baxtê wê ya ku heta ku ew laş, li gorî baxtê ku yazdanê mazin nivîsandîya wê bijî û ew gîyan wê di wê de bicih bê. Piştî ku laş mir û çû û bû ax, wê êdî gîyan jî ji laş serbest bibe û piştre wê carek din bi ber azmana de di ”taxtê” ku ga dikişênin de wê herê azmana. Lê dema ku gîyan bilindî azmana bû, wê dîsa tiştên ku berê jînkirina wê bibîr bike. Wê ji bîr nekê. Dema ku ew gîyan, ket laşekî din de jî, wê tenê di çerçoveya baxtê wî laşî de bi bîr bike. Ev jî, ji aliyê yazdanê mazin ve hatîya kifşkirin.

Gîyan, serpêhatîya wê,  ev a. Lê gîyan nemir a. Ew, heta ku yazdanê, nebêje bimire, ew jî wê nemirê.

Mîtra, dema ku gîyan tefsîr kirîya, gotîya ku ´piştî ku gîyan di laş de bcih bû jî, wê xwestekên wê li gorî wê bin. Lê xwestek, mêr û hwd, ên laş jî hena. Lê divê ku mirov bi hişê xwe di farqê de bê ku gîyane xwe neke dil û ´esîr´ ji wan xwestek û mêlên laş re. Divê ku mirov karibê gîyane xwe biparêzê. "Ji xwe, hiş jî bo vê yekê ji aliyê yazdanê mazin ve hatîya afirandin." Bi hiş, mirov wê farq bike û kêmesî û xelatîyan di jîyane xwe de nekê. Mirov, wê gîyane xwe nekê dil ji laşê û xwestek û mêlên wê re. Laş, dikarê xwestekên ne baş jî bixwezê ku bime bide kiirin. Dema ku mirov li gorî wan xwestekên laş tevgerîya û ew kirinên xirab û xelat kir, wê gîyane mirov jî di nava laşekî lewitî de bijî. Ev jî, wê êdî nikaribê li gorî xwesteka yazdanê mazin bijî û pêwîsîtînîyên wê bêne li cih. Laş, ajoya wê heya. Gîyan hişê wê heya. Ajo, bi gîyanê re şer û tekoşînê dike.

Mîtra, vê jî dihêne ser ziman, ku mirovê ku ne li gorî xwestekên laşê xwe lê ku li gorî gîyane xwe jîya, ew mirov wê bi rewîst(ahlaq), xawênî û rast dikarê bijî. Ev mirovê ku li gorî rastîya gîyane xwe jîya, ew mirovê ku êdî wê bi rewîst, xawênî û rast bijî ya.

Mîtra, ku weke peymanekê di nava wî û yazdanê mazin de, piştî ku wî ga´yê xwe gûrand, pêşî wî bi yazdanê xwe yê mazin ê rojê re rûniştîya û xwarîya. Ev sofra û xwarina Mîtra û yazdanî wî ê rojê ya bi hevdû re, weke peymane wan ya li ser rûyê ardê ku divê ku mirov li gorî wê bijîn a. Ew peyman, paymane di nava mirov yazdanê mazin de jî ya. Ew peymanek pîroz a. Rêya qancî û başîyê bi xwe re şanî mirov û jîyane mirov dide.

Mîtra, li ser wê peyamê ga boraq kirîya. Yazdanê mazin ji wî xwestîya ku ew ga ji wî re pîroz bike. Piştre, yazdanî wî ji wî re gotîya, "ezê ji xwûna ga´ jîyanê, ji heyîna wî jî heyînê bidina çêkirin. Wê jîyane bi xwe bi wê dewrûdayîm bike." Piştre jî yazdanê mazin ji Mîtra re gotîya, ku "êdî winê tenê bawerîya xwe bi min bênin." Bi vê yekê, hinekî gûrandina ga´, vê rastîyê û peymane di nava Mîtra û yazdanê wî yê mazin ê rojê de tefsîr dike û dihêne ser ziman. Bi wê re jî, dihêne ser ziman, ku wê ti tiştek li ser heyîna yazdanê mazin re tûnebê ku ji wî re berg were girtin. Wê tenê, heyîn û hebûna yazdanê mazin wê hebe. Mîtra, bi vê yekê, gûrandina wî ya ga, peymane wî ya "´peymane di nava wî û yazdanê wî de ya."

Mîtra, bi wê peymanê, êdî diçê û serî li mirovan dide.Yazdanê mazin ê rojê, jîyan daye dunyê. Dema ku berg were kirin, wê ji wê re were kirin. Mîtra, vê têne ser ziman.

Mîtra, ”jîyan, bo vê yekê pîroz a.” Divê ku jîyan, ne wê lawitandin. Jîyan, divê ku ji xirabîyan were dûr girtin. Yazdanê mazin ew jîyan daye dunyê û dadî û aramî bi wê re di dûnyê de daye çê kirin. Mîtra, bi vê yekê re dema ku bahse aramiyê dike, ji du aliyan ve bahsê dike. Aliyek, ew a ku Mîtra dibêje ku ”divê ku laşê mirov bi gîyane mirov re di ahangê de bê. Kengî ku laş bi gîyane re di ahangîyê de bû, wê aramî bibe. Wê ji xirabî û neqancîyan dûr bisekinê.” Bi wê re jî, aliyê din ê duyemin ê gotina aramiyê jî, ew a ku ”yazdanê mazin li dunyê jîyan bicih kirîya û divê ku ew rêz ji wê re were girtin û bêparastin.” ”Ji xwe gurandina ga jî, peymane wê jîyane li dunyê ya bi yazdanê mazin re ya.”

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku Yazdan, piştî ku jîyan li dunyê bicih kir û piştre gelek rêyên ku bi wê re û bi yazdanê mazin re têkilî were danîn jî afirand. Hiş, rêyek ji wan rêyan a. Agir, ji rêya ji wan rêyan a. Hiş, pirr derketîya li pêş. Bi vê yekê, rêmildarî di nava Mîtannîyan û oldar û pîrên wê pêşketîya. Hertimî, kirina ku ji pêşarojê gotinê bibêjin. Oldar, mirovna ku yazdanê mazin, aqilê di serê wan de, di rêya wî aqilî de hin wateyên ku bihanîna ser ziman a gotinan re ku li wan hatîya kirin re, bi wan wateyan nîşanakên pêşarojê jî û bûyarên ku di pêşarojê de were serê mirov jî dane nîşandin. Bi vê yekê, Mîtra, mirovên ku hin bi hin bawerîya xwe bi wî dihênin, bi vê yekê, rêmildarî, bi aqil û hiş di nava wan de pêş dikeve û li pêş a. ´Fal´ vekirin, di nava wan de pêşketîya. Bi falan, li xatên destê mirov û kirinên mirov dinerin û ji wan wateyan derdixin ku wê di demên pêşaroja mirov de çi were serê mirov. Ev yek, weke aliyekî giringa ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Mîtra, bawermendên wî di derbarê kosmosa azmana, stêr û heyv û dunyên din de hewl dane ku hizir pêş bixin û pêşxistin. Bi vê yekê, di nava wan de, weke rêbazekî vegotin û dane fahmkirinê werze pirr zêde bi ´stêrzanîyê´ re pêşketîya bi wan re. ..

Mîtra, bixwe jî, ji kevneşopîya melekê Tawis bi bawer bû. **Bawerîya melekê Tawis**, berî Mîtra jî hebû. Oldarên ku hebûn û pîrên ku hebûn, bawermendîya Melekê Tawis dikirin.

De ne, Melekê Tawis, yazdanê mazin ´laleş´ bo wî û bo navê wî û bawerîya ku pêş bikeve di nava mirovatiyê de hanîbû ser rûyê ardê. Laleş, berê li azmana bû. Li wir, melekên yazdanên mazin ku wan hemû karên mazin bi navê yazdanê mazin kifş dikirin û dihanîn li cih lê di

rûniştin. Pêxemberîya melekê Tawis, di laleşê de û di roja ku ew nazîlî ardê bûya de, hatîya.

Mîtra bixwe jî, weke wan oldar û pîran, berê wî bi melekê Tawis ve bû. Bi wî, bi bawer bû. Mîtra di xate wî de ya.

Mîtra, piştî ku hizrên xwe hanîna ser ziman û piştre ku hinek bertek jî di dema wî de li ber wî hatina dayîn nîşandin jî, Lê Mîtra ne di wê bawerîyê de bûya ku ew derketîya dervî wê xate yazdanê Mazin û Melekê Tawis. Lê hinek oldaran di wê temenê de gûmane xwe dihanîn ser ziman. Lê ên ku dihanîn ser ziman jî, piştî ku key û şêwirmend û aqilmendên wî ên pîr ku bertek ne dane nîşandin, ev weke nîşanaka ku ew di rêya rast de dimeşê jî hatîya şîrove kirin û ser ziman.

Mîtra bixwe re û pêşketina xwe re wê ”sersalekê” bide dest pê kirin. Wê di nava wê de, heyvên wê kifş bike. Wê cihê rojê di wê de kifş bike. Wê cihê heyvê di wê de kifş bike. Wê cihê **´heft dunyê´** din jî di wê de bide kifşkirin. Wê bi wê re sersal were pîroz kirin. Sersal, weke destpêkekê ya.

Mîtra, ev destpêka wî bi re ku bûya, wê piştre di nava hemû mîtannîyan de bicih bibe. Wê piştre ji nava mîtannîyan jî bi buhurê û wê di nava gelek xalkên din de jî were dîtin. Wê ew sersalîya ku Mîtra bi xwe re da destpêkirin, wê were herê kirin.

Mîtra, wê çar demsalên bi avê `Sadê´ kifş bike. Ev çar demsal, her yekê wê çar heyvan bike nava xwe de. Her yekê, wê destpêka demekê û demsalekê bê. Demsala yazdanê mazin jî di nava wan de kifş kirîya. Ew demsal, demsale herî germ ya demê ya.

Mîtra, weke ku wî her 12 heyvên ku wî kifşkirina her yekê bi navekî, nirxekê û dunyeyekê bi wate kir, her wusa her çar demsal jî wî wusa bi wate kirina û wateya wan hanîya ser ziman. Wî, ew 12 stêrên li azmana ku pirr geş in, ji wê mînaq girtîya û ew gotina ´duwanzdeh(12)´ kifşkirîya. Bi wê re jî, Mîtra, bi navê yazdanê mazin weke wan herçar demsalan, di temenê çaran de çar bayên ku dihên kifşkirina. Ew jî, piştre hatina gotin ku ´yazdanê mazin, ew her çar bayên mazin kirina destê wî de. Ew ba jî, yek ´ bayê xarbî´ ya. Yek ´bayê şerqê´ ya. Yek jî, ´bayê felekê´ ya. Yek jî, ´bayê ziztanê´ ya. Ev ba, ne tenê weke ´ba´ hatina şîrove kirin. Wateyên hişmendî jî li wan hatîya kirin. Minaq, bayê felekê, bi baxtê re hatîya tefsîr kirin. Bayê xarbî, bi sitt hatina xwe û di wê de carna heyîna germe û carna jî heyîna cemide heya. Bayê ziztanê, tememî cemidandin û xwediyê cemide berfê ya.

Mîtra, bi wan xweza şîrove kirîya. Di şîrovekirina xwezayê de, afirandina bi wê ku yazdanê mazin dike, Mîtra derxistîya li pêş. Dema ku ga´yê xwe gûrandîya jî, ev li berçav girtîya. Dema ku ga´yê wî li ardê dirêj bûya. Li dora dûvê ga´, genim weke dager(sembol)a bereketê li dora dûv li rijandîya û belav kirîya. Bi wê re, li ser bereketa xwezayê û şînbûn û afirîna wê hanîya ser ziman.

Mîtra, bi heman rengî nêzîkatî li civatê û beşê civatê jî kirîya. Wî, pîr weke mirovna ku li gorî kevneşopîya mîtannîya jî hebû, li ber wan ti carî bêrêzî û bêhûrmetî ne dihat kirin. Ew weke serokna xweza ên civatî bûn. Gotina wan, dihat hanîn li cih. Ew, ji zanebûna wan jî gûman ne dihat kirin.

Di mazinkirina zarokan de Mîtannîyan, giringî dane çar tiştan. Bo zarokan, weke çar tiştên ku nebin nabin a. Ew jî, di rêya gotina yazdanê mazin de, wê hê ji piçûkatîya ku mazin dibûn, wê weke tişta pêşî li zarokan bi hata fêrkirin ku ew fêrî sûwarîya haspan bibin. Weke tişta dûyemin jî, wê fêrî avêtina tîr û kavan bûban. Weke tişta sêyemin wê zarokan hertimî rastî bigota û wê ti carî derew nekiriba û wê hertimî ya rastî ji devê wan derketiba. Weke çare çaremin ya pirr giring jî ku zaro balix bû, wê biheta zewicandin. Ev xale çaremin, pirr giring hatîya. Heta ku Mîtra, weke bergirna vê xalê ku hertimî were li cih, hanîya ser ziman, ku «mirovê ku ne zewicî û nebûyî bav, wê gîyane wî jî ji wê tirba ku laşê wî hatî xistin de bimêne û wê dernekeve li azmana li cem yazdanê mazin.» Bi vî rengî Mîtra, giringî daye zewecê jî. Di zawacê de, mahr dihat kirin. Mahr, temenê zewecê û bi wê zewcecê ew malbate ku dihat avakirin bû. Temenê wê yê bi peyman ku bi navê yazdanê mazin dihat çêkirin bû. Bo bê yekê, rêz û hûrmeta ji malbatê re bêgotin dihê nîşandin. Ti kesek, nikarê gotinê ji malbatîyê re bibêje. Ti kesek nikarê bêrêzîyê li dijî rûmeta malbatê bike. Ti kesek nikarê malbatê piçûk bixe. Bi vê yekê, di nava malê de ku di hundurê malbatê de, kevneşopîyên wê dihênina ser ziman, hena. Cihê dê û bav, keç û kûr û hwd, kifş in. Kevneşopîya wan heya. Her yekê, bi kevneşopîya xwe re di nava jîyane civatî de dihîn û tevdigerihin.

Mirov, vê yekê divê ku fahm bike ku jîyane domandina wê bi malbatê re heya di nava civatê de. Mîtra, nêzîkatîya wî ya li malbatê, bi vê yekê û rengê divê ku mirov bi teybetî werêne ser ziman. Berpisîyarîya dê û bav li ber zaroyan, giring in.Li gorî wan her çar destûrên bingihînî wê zaro werina mazin kirin. **Ya yekemin, fêrbûna sûwarîya hasp a. Ya duyemin, fêrbûna avêtina tîr û kavan a. Ya sêyemin jî, hertimî**

**gotina rast ji dev gotin a. Ya çaremin jî, ku zaro bû ciwan û balix bû, êdî zewicandina wî ya ku malbate xwe ava bike**.

Mîtra, ev rewş hemû li gorî zagonên yazdanê mazin û di xate Melekê Tawis de hanîya ser ziman. Melekê Tawisê ku li laleş´ê dijî, Mîtra di xate wî de ya. Yazdanê wan yek yazdan a. Xwûdayê wan herdûyan jî «yazdan» a. Ew, yazdan, yazdanê hemû gerdûnê û deman a.

Mîtra, ji ber çi di nava çar destûrên wî ên ku zaro li gorî wan werina mazin kirin de ´fêrbûna sûwarbûna hasp´ û ´avêtina tîr û kavan´ heya? Ji ber ku Mîtra bixwe jî, weke şervanekî jî dihat dîtin. Ew, bişervanîya xwe ve jî di jîyanê de bo zarokan û mazin kirina wan minaqek ku esas were girtin bû.

Mîtra, bi hebûn û bûna xwe re jî, oldaran ew dihanî ser ziman û ew bûyîna wî weke **behîtekê** hatîya hanîn li ser ziman. Mîtra, piştî ku bû û hat dunyê, wî cihê mazin ê li dunyayekê ê pîroz girtîya. Bi wê, ew êdî di asta li cem yazdanê mazin e hatîya tefsîr kirin. Mîtra, bi vî rengî, ew weke rastteqîniyekê ku li jîyanî bûyî û hatî dunyê hatîya ser ziman û ji wî bahs hatîya kirin. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku Mîtra, di dema ku piştî Şûr da sûkra ga´yê xwe û gûrand, yazdan ew dît û êdî Mîtra derxist asta xwe. Li jîyane, êdî bi wê re tenê mazinahîya Yazdanê mazin wê di laş û gîyane Mîtra de li dunyê bijî. Ew zaroyê ji rohniyê ya. Bi wê yekê ew hatîya ser ziman. Mîtra, bi vê rengê hatîna wî ya li ser ziman, ew li jîyanê êdî hatîya herêkiirn û pîroz kirin. Pîrozkirina wî, êdî wî bi kirin û gotin û bawerîya wî re li jîyanê serdest kirîya. Mîtra, aqilê ku di serî wê de hebû bi hiş bû. Wî hişê xwe bi rêya gîyane xwe ji yazdanê mazin girtibû û ji dora xwe re jî dihanî ser ziman. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku Mîtra, têkiliya wî bi yazdanê mazin re hebû.

Dema ku yazdanê mazin ard çêkir, ji wê ardê laş çê kir, ´gîyane pîroz´ da wê laşê. Ew laş jî, êdî piştre in bi hin mazin bû û ji wê Mîtra derket. Bi wê yekê, yazdanê wî yê mazin, ard û afrînerîya wê û Mîtra, sê heyînîyên ku bi vî rengî weke ku oldarên ku bawerî bi wî hanîn digotin ku «hevdû temem dikirin» bûn.

Mîtra, dema ku ga´yê wî ji destê wî ravî û piştre ku Mîtra ket pay dîtina ga´yê xwe de, wî li devereka beyer dibînê. Piştre li wir, dike û dixwezê ku ga bigrê. Ga li ber xwe dide.Ga´, pêşî naxwezê ku were girtin û bikeve destê Mîtra de. Lê Yazdanê mazin, ´baxtê´ gê´ bi bîrê dixe. Piştre ga´ ji baxtê´ xwe yê bi destê yazdanê mazin razî dibe û piştre xwe dide girtin. ..

Ku Mîtra ga girt, êdî wî têne û li ber devê şikeftê şerî jê dike. Ku şerjê dike, bi libên genim re tirhikên tirh li dora dûvê wî dirijêne. Piştre Mîtra, sofra xwarina pîroz didêne û êdî peymane xwe bi yazdanê xwe re çê dike. Haçîyê ku ji wê xwarina pîroz a wê sofrê bixwê, wê gîyane wî azad bibe. Wê qancî li laşê wî serdest bibe. Bi wê xwarinê wê sofrê, wê peymane xwe bi yazdanê mazin re çê bike. Wê bi wî nanê ku ji destê jinekê destlêneketî ku dihê belavkirin ku wî bixwe, wê weke pîrekê bizane bê û weke oldarekê di rêya yazdanê mazin de bê.

**«Mîtra, tîr ji kavanê avêt û tîr li nîvê kevir ket, kevir ji nêvî ve qalişî û bû duqat û piştre ji wê qalişîna kevir avê bidest herikîne kir»**

Mîtra, mirovekî ku çawa ku yazdanê wî hemû tişt û kûdret dabûbû wî, her wusa, mazinatiyên ku hebûn jî bi wî baxş kiribûn. Mîtra, şervanekî ku zaro û şervanan ji wî mînaq digirtin bûn. Zaroktîya wî, zaroktîya hemû zaroyan bû. Ew, serokê oldaran bû. ..

Mîtra, gelek behîtên wî hebûn. Ew bi wan behîtên xwe re jî di jîyane de hatîya tefsir kirin. Minaq, behîta wî ya bi tîr û kavan re oldarên wî, bo ku zarok û mirov jê sûd û minaq bigrin, li her deverên parastgehê bi naqş tefsîr kiribûn. Mîtra, dema ku tîr û kavan bikardihanî, wî şaş ne dikir. Şaşî ne dikir. Tîrê ku ji kavana wî derdiket, kûdreta Mîtra pêre hebû.

Bi jîyane Mîtra re, ku pirr jî oldarên wî ”metranan” bahse wê kirîya, dibêjin ku rojekê Mîtra, çûya daristanê, Li daristanê xezalek dîtîya. Li çavên xezalê nerîya. Kavana xwe ji pişta xwe kirîya ku tîr bikiyê de û bi avêje wê. Lê piştî ku wî li çavên xezalê nerîya, êdî dilê wî û hîsa wî ya dimejiyê wî de jê re gotîya ´neavêja´ û wî jî ne avêtîya. Piştre ew tîrê ku wî kirî kavana xwe de wî li şûna k biavêje xezalê, wî avêtiya kevirekî û tîr di kevir ve çûya û kevir ji nêvî ve qalişandîya û kirîya du-qat. Dema ku kevir ji nêvî ve qalişîya û bûya du-qat, êdî ji wê qalişîna kevir ji nava kevir avê bi dest herikînê kirîya. Di wê demê de çend mirov jî bi Mîtra re bûna û tî bûna. Piştre jî, dema ku wan mirovên tî, dîtîna ku av ji kevir derket, mana şaş û mat li ber wê behîta Mîtra. Piştre ji wê avê vexwertina û dilê xwe hînîk kirina û tîbûna xwe re jî buhurandina.

Lê Ev bûyar, êdî piştre jî, ne hatîya ji bîr kirin. Piştre, di nava xalkê de jî hat bihîstin. Ev, weke behîteka Mîtra ma û ji guh çû guh. Ên ku ev ne bihîstî li welêta Mîtannîyan nema.

Lê bûyar bi wê re bi sînor jî nemaya. Mîtra piştî ku tîrê xwe bi kavan avêt û kevir ji nêvî qalişand û ji nava kevir av derket û herikî, piştre jî Mîtra li haspê xwe sûwar bûya û xwestîya ku nêçîra xwe bike. Di wê

demê de, li raxê wî yê rastî Mar û li raxê wî yê çapê şêr rûdaya û bi wî re rêwîtî kirina. Çendî ku Mîtra haspê xwe daya bazdanê, wî marî û şêrî jî rabûna ser du lingan weke mirovan û bi wî re çûna. Yazdanê Mazin, ew herdû dabûn rex wî. Herdû (mar û şêr) jî, di tefsîrên di parastgehên Mîtra de agir û rûyêardê nimînêr dikin. Ew jî, di nava wan de ku li ser hasp dimeşê, weke ”xwedîyê gerdûnê” dihê tefsir kirin. Mîtra, weke ´key(hikimdar)´ gerdûnê dihê tefsîrkirin.

Mîtra, li nêçîrê ti tişt nêçîr nekir. Ji ber ku di çanda wan de, kuştin, weke karekî aliyê xirab dihat dîtin. Hîsa ku ketibû dilê Mîtra de, ne hiştibû ku ew wê bike. Lê Mîtra, di wê demê de gelek behît dabûn nîşandin li berçavên mirovên ku bi wî re bûn. Bi wê jî, êdî ew mazinatîya wî û kûdreta wî bêhtirî û zêdetirî hatibû dîtin. Mîtra, hişê wî yê ku di serê wî de hebû, ew hişê wî ji yazdanê wî yê mazin bû. Bo vê yekê, sînorê wê hişê bi wî re nebû. Serdestîya wê li jîyanê hemûyî pêş diket.

Di jîyane de Mîtra, hertimî berg ji yazdanê xwe dikir. Mîtra, navê li tîrêja rojê kiribû ”sor” bû. Bi wê re dema ku berg dikir, navê ”sor”ê jî di nava bergkirina xwe de bikardihanî. Mîtra, bergkirina xwe li parastgehê dikir. Li parastgehê, oldarên mêr jî û ên jin jî hebûn. Xûrê, ew jina ku Mîtra di destpêkê de dîtibû jî, li parastgehê bû. Jinên li parastgehê, jinên ku dest li wan ne ketîya bûn. Ew jinên ku weke karmendên yazdanê mazin bûn. Karê pîroz ji destê wan dihat kirin.

De ne, di bawerîya Mîtra û bavûkalkên Mîtra de, jin û mêr bi hevdû re weke hevdû dikarin li parastgehê bimênin. Lê jinên ku li parastgehê dimênin, jinên ku dest li wan neketî na. Ew jinna ku bi karê pîroz ve diçûn û dihatin bûn. Ew, bergê ji yazdanê mazin û ´keyê gerdûnê´ Mîtra re dikirin. Mîtra jî, ew didîtin û bi pîrozî ew pêşwazî dikirin.

Di parastgehê de, kî wê çî kar bikira, karê wan kifş bû. Herkesekî dizanî ku wê çi bike. Ji karê xwe ve, ti kesek ne bi şik û gûman bû. Ku tîrêja serê sibehê ya rojê derket, wê jîyane wan jî dest pê bike. Ew tîrêja rojê ya serê sibehê, Mîtra pirr bi giringî didayê û bi pîrozî ew pêşwazî dikir. Ew tîrêja serê sihebê ya pêşî, tîrêja pêşî ya yazdanê mazin bû ku dide dunyê û bi wê xwe care pêş dide nîşandin. Mîtra jî, bi vî rengî ew pêşwazî dikir û pê bawer dikir. Xûrê, navê di wateya farîşteyê de jî bû. Lê navê warê wê jî bû. Jinek, welatek a. Mîtra, rêzeka mazin daye jinê. Xûrê, jineka ku bi nanê pîroz ê ku di dema cejnê de belav dikir, çê dikir. Herkesekî ji destê wê nanê pîroz digirt. Nan, bi vê yekê ”pîrozîyek” bi wê re dihat dîtin. Ev pîrozî, heta roja me jî, di nava kurdan de dihê parastin. Ku gezek nan bikeve ardê jî, weke gunahakî mazin dibînin.

Ew nanê, pîroz li parastgehê dihat dayîn. Berî dema Mîtra jî hebû. Lê Mîtra, pirr rêzeke mazin ya bi hûrmet daye wê kevneşopî û bawerîya bavûkalên xwe jî. Jin, teybetmendiya wê heya di nava wê bawerîyê de. Heta ku pova serê wê bixwe jî di nava wê bawerîyê de hatîya tefsîrkirin û ser ziman. Jin, bi çêkirina zarokan re ew pîrozîya wê ya bi daykîtîya wê re jî hebû. Ev jî, dihat dîtin û bi pîrozî dihat pêşwazî kirin.

Mîtra, kevneşoîya wî û bawerîya wî, divê ku mirov hinekî li vir bibêje ku kevneşopîya bavûkalên xwe baş dizanî. Cil û bergên bavûkalî li xwe dikirin. Ew, bi vê yekê, bi hizrên xwe re xwe daye herê kirin. Lê Mîtra, divê ku em li vir dûbare werênina ser ziman ku pirr zêde jî rastî bertekên mazin jî hatîya. Lê di dawîyê de wî xwe daye herê kirin. Wî karîya ku xwe bide herê kirin. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku Mîtra, piştî ku xwe da herê kirin êdî weke ”keyê gerdûnê” ê li ser navê yazdanê mazin li dunyê jî hatîya dîtin û tefsîr kirin. Bi wê rengê jî, bahs ji wî hatîya kirin. Mîtra, weke ´keyê gerdûnê´ hatîya tefsîr kirin. Ew di nava tefsîrkirinên ji dema Mîtannîyan de, divê ku mirov bibêje ku bi vî rengî jî pirr zêde hatîya ser ziman. Mîtra, hizrên wî ên ku wî hanîna ser ziman di nava oldar û pîran de jî, piştî wî re bi naqşên li hundurê parastgehê bê û ankû bi rengên din ên tefsîr kirinê û hwd bê, hatîna ser ziman. Bi wê rengê, tefsîrîkirina wî hatîya kirin. Mîtra, hizrên xwe hanîya ser ziman. Di hizrên wî de aqil û hişmendîya aqlî pirr zêde li pêş bûya. Bi vê yekê re, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku ´vace´ aqil jî, li pêş bûya. Mîtra, dema ku ga´yê xwe girtîya û gûrandîya, li vir, bi vace xwe di serê xwe de hebûna yazdanê xwe yê mazin kifş kirîya  bi mazinatîya wî re û li gorî wê mazinatîyê û herêkirina wê ya li ser hemû tiştî re ew kirîya.

**Pergale stêrzaniyê a Mîtra. ..**

Mîtra, Pergaleka ´gerwêrkî´ û ankû ´tîr´î li azmana hanîbû ser ziman. Di bawerîya olî a olzanî de navê heft ”qadên binê ardê” û ankû ”heft qat(tabaqa)ên li azmana” hatîya kirin. Ev di temenî bi bawerî de di bawerîya bavûkalên Mîtra hebû. Lê Mîtra jî, ev hanîna ser ziman. Navê Rojê(”sol” û ankû ”sor”)ê hanîya ser ziman. Roj, navek ji wan navan a ku navê yazdanê mazin jî ya. Mîtra, bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku ew her heft qat(tabaqa)ên li azmana, weke **tabaqayên ”dunyayî”** ku li wan jîyan heyî û ankû awayna **darêjkên jîyanî** ku yazdanê mazin li wan bicihkirî dihên ser ziman.

Bi vê yekê, navê heyvê jî her her wusa heya. Lê bi navê ´heyvê” re navê ”meh” jî heya û bi wê re di dema Mîtra de ji wê re navna din jî

”rona” ku di wate rohniyê de hatîya ser ziman li heyvê hatîya kirin. Li wê herêma berfiratê, heyvê, hertimî di demên havînê de bi şevê reşî dikir rohnî. Di wê şevê de kirina rohnî ya reşîya şevê, ji wê re di kurdî de dihat gotin ”şêwîn”. Ev jî, navekî din ê wê rewşa rohniya heyvê ya.

Mîtra li azmana hizirîya û hizirkirîya û hanîya ser ziman ku li azmana gelek ´tîr´ û ankû ´gerwêrk´ hena. Bi wê re jî, ev gotina ”qat(tabaqa)ya” şîrove kirîya û her yekê, ´weke dunya me ku li azmana´ şîrove kirîya. Gotina, ´heft´ê, ku heta roja me jî di êzîdîtîyê de heya û bi gelek rengên wê hatîya biwate kirin û ser ziman, di wê demê de di temenê ´heft qatên azmana´ de hatîya ser ziman. Di têgihiştinkirin û hişkirinê de, weke heft qatên ku li ser hevdû hatina danîn jî hatîya fahm kirin. Lê Mîtra, di dema xwe de, ji dunyê û heyîna heyvê ya li berçav gav diavêje û weke dunyeyek biserê xwe şîrove dike û dihêne ser ziman.  Bivê yekê, navê **Stêr**an ku heya, lê bi wê re navê tîr(gerwêrk)ên ku heya ên weke **rojê, heyvê, keywanê, Berçîsê, gelawêjê, behramê û tîrê** hanîya ser ziman. Ev heft gerwêrk, giring û hatina bi wate kirin û gelek tefsîrkirinên bi wan re û bi navê wan re ku hatina kirin in hena. Di tefsîrkirina Mîtra de cihekî teybet ji pîrozîya ga´ re hatîya vaqatandin. Mîtra, çend ku hin tefsîrna bi heyvê re û li ser heyvê re bi ga re dike(ev rengê tefsîrê, di demên berî Mîtra de bi anû re û bi navê ga´ re hatîya kirin bi heyvê re), lê Mîtra ga´ li cihê qat û ankû gerwêrka gelawêjê bicih dike. Navê **gerwêrka gelawêjê, bi navê ga´** re ew tênê ser ziman. Heta ku li cihna navê gerwêrka gelawêjê, tefsîra ga´ dide tefsîr kirin. **Gerwêrka gelawêjê**, weke gerwêrkeka giring a.

Gerwêrka gelawêjê, weke ku Mîtra jî hizir dike maztira. Ew li wê mazinahiyê ga bicih dike. Hinekî, di hundurê wê mazinahiyê de wê pîroziya ga´ di rex ya yazdanê mazin de bicih dike. Dema ku oldar û pîrên demê li wê gerwêrkê(li gerwêrka gelawêjê) hizirîna, ga û pîrozî û ew tefsîrên ga´ hatîna bîr û berçavên wan.

**Piştre, ku Mîtra ji dunyê goç dike, êdî oldar û pîrên olî tefsîra wî bi gerwêrka keywanê bicih dikin. Di regenekî de weke ku di ´mîtolojiya yewnanîyan´ de dihê ser ziman rewşa ”tîtanê” pêşî bi Mîtra re şîroveya wê hatîya pêşxistin. Bi navê Mîtra re ”rewşa tîtan” hatîya şîrove kirin û ew li gerwêrka keywanê hatîya bicih kirin. Bi vî rengî, Mîtra, hatîya xwestin ku hê zêdetirî mazinatî û pîrozîya wî hê zêdetir were dîtin û ser ziman. Bi vî rengî, oldarên Mîtrayî, Mîtra, li keywanê bicih kirina û keywan jî di rex rojê de bi şîrovekirinê hanîna ser ziman. Nêzî wê hanîna ser ziman.**

Mîtra, bi vî rengî ji aliyê kozmosaka teybet ve jî hatîya şîrove kirin. Weke ku çawa ku di stêrzanîya dema berî dema Mîtra de bi navê ”Zerwan, Mazda û Mîtra hatîya ser ziman, di rewşeka bi vî rengî de lê li gorî zanîn û teybetmendiyên hişmendî ên demê Mîtra hatîya tefsîrkirin û ser ziman. Li vir, Mîtra, dema ku em bahse wî bikin, divê ku em hinekî bi teybetî li ser vê nûqtayê bi navê wî re bisekin in. Mîtra, rastîya wî, dema ku em hildina li dest û hewl bidna ku hizira wî, rengê bawerî, pêşketin û hişmendîya wî fahm bikin, ev rewşeka teybeta ku divê ku mirov bi teybetî lii ser bisekinê wê were ser ziman. Mîtra, Bi vê rengê, pergaleka stêrzanî bi wî re hatîye afirandin, şîrovekirin û ser ziman. Bi wê re jî, Mîtra, di temenê hişmendîyê de, hizirîya û aqilê ´felsefe´ ê bi vac bi wî re pêşketîya. Bi vê yekê re, wê êdî piştî Mîtra re bandûra wî li ser hemû pêvajoyên felsefe û felsefeya vacê bi vî rengî wê hebe. Mîtra, bi vê rewşa ve ji binî û temen ve kifşkarê wê ya.

**Bi teybetî, pergale ´heft qatan´ bi rengê rojê, heyvê, keywanê, Berçîsê, gelawêjê, behramê û tîrê, binavkirina û tefsîrkiirn û hanîna ser ziman, aliyekî teybet ê vê şîroveya Mîtra û piştî wî re a oldarên wî yên ku bi wî bawer in. Bi wê re jî, stêr, pirr zêde hatina şîrove kirin. Ji wan û rewşên wan ku diafirin wate û şîroveyên stêrzanî hatina derxistin. Stêr, ji aliyekî din ve jî, her yekê bi ´gîyanekê´ jî hatîya şîrove kirin. Her stêr li azmana pêketî û bi rohnîya. Lê rohniya hemû stêran ne wek hevdûya. Hinek rohniya wan zêde heya. Hinek jî, rohnîya wan kêm heya. Lê hemû jî weke ´çîra´yna rohniyê ku bi şevê dayimî pêketî na û bi rohnî na. Bi wê yekê, re gîyan, hatîya şîrove kirin. Gîyanên bizane û zêde bi gûnah nebûna, ew weke ku bi stêrên geş re hatina şîrovekirin û ser ziman. Lê ên din jî, vajî wê hanîna ser ziman. Gîyan, ji ber ku ji yazdanê mazin a, ew wê hertimî di asta dawîyê de derkeve azmana û li wir cihê xwe bigrê. Bi baxtî, ku tê gotin, li azmana her stêrek cihê wê yê teybet heya. ´Komên stêran hena´ ev jî, di nava oldarên Mîtra de bi hişmendîya Mîtra hatîya dîtin, kifşkirin û ser ziman.**

**Bi wê re Mîtra, di derbarê ´heyv´ê de dibêje ku heyv bi rohniya xwe re bizrê ga paqij dike, hemû şînahîya ku heya û şîn dibe ´paqij dike û dike ku ew pêşbikevin´. Di nava wan şînahîyan de, ´rehek´ên bo dermankirinê şîn dike.**

Li vir, dema ku em rastîya Mîtra bi hişmendîya wî re bênina ser ziman, ji şîroveyeka mîtolojikî zêdetir, şîroveyeka bi aqil û felsefekî ew çêtir dihê ser ziman. Ev jî, weke rastîyaka wî ya. Ji ber ku Mîtra di dema

aqil de bi aqilê felefê wî xwe hanîya ser ziman û di serê mirovan de bicih kirîya.

Di vê rewşê de, dema ku em bahse rastîya hizrî ya Mîtra bikin, emê di serî de bi hizirkirina wî ya aqilî re wî bênina ser ziman. Bi wê yekê, tehera wî ya hizrî, li vir di serî de, em kifş dikin. Tehera Mîtra ya aqilî, di serî de, di temenekî aqilê hemdem de, di dema wî de bûya temen ji pêşketinaka nû ya demî a aqilî re. Wî, weke ku bi aqilê xwe re û dema xwe re dawî li demekê hanîbê û demek dabê destpêkirin, em bi wî re û bi pêşketina wî re rastî tên. Mîtra, li vir, bi teybetmendiyên aqil ku derdikeve ber me, em dibînin ku ew aqilê wî, wê di dema wî de baş newê kifşkirin. Di demên piştî wî re wê ew çêtir weke ku were kifşkirin. Pergalîya hizrî ya wî, di rengê pergale wî ya stêrzanî û hişmendîya wê de dihê dîtin û dikeve berçavan de.

Em li vir, li ser rengê hizirkirina wî jî pirr bi hizir in. Em divê ku bi wê jî hinekî werênina ser ziman. Mîtra, ew rengê hizirkirina wî bi felsefeya aqilî a vacî ya. Vac, weke teybetmendiyeka hizrî ya hizirkirina wî derdikeve li ber me. Divê ku em vê yekê jî werênina ser ziman ku Mîtra, bi vê yekê, bi hemdemiyeka ji ya dema xwe maztîr jîya ya. Mîtra, li vir, divê ku em vê yekê jî bi wî re werênina ser ziman, ku ”sersal”, ku di wê de ´**duwanzdeh heyv**´ hena, bi wî re destpêkeka wê ya teybet heya. Ev destpêkeka sarsalî, em divê ku bi teybetî, bi Mîtra re fahm bikin û werênina ser ziman. Mîtra, destpêka sersalê, weke destpêka bûyîna wî ya**. Di temenê bûyna Mîtra de jî gelek şîroveyên giring ji aliyê oldarên wî ve hatina kirin. Mîtra weke yazdanakî şîroveya wî hatîya pêşxistin. Bi wê şîroveyê re jî, ew li dunyê li ardê ne hatîya hiştin û hatîya derxistin li azmana û li azmana li gerwêrka Keywanê hatîya bicih kirin**. Di hin tefsîrna de, oldarên Mîtra, ew wusa tefsîr kirina ku weke ku ew ji ”kevir” hatibê dunyê hanîna ser ziman. Di destekî wê de agir û ê din de gerwêrkên din ku hena, bi wê bi pîrozî dihê tefsîr kiirn. Piştre jî, di nava jîyanê de ew hatîya bicihkirin û bi wate kirin. Bi wê re jî Mîtra, di jîyane mirovatiyê û destpêkîya wê de, weke destpêkekê hatîya şîrovekirin û ser ziman. Bi wê re jî, sersal bi wî re hatîya dayîn destpêkirin. Kevneşopîya sersalê, hatîya dayîn destpê kirin. Kevneşopîya sersalê, heta roja me jî, di nava kurdan de bi rengna cuda dihê pîroz kirin. Ev rengên cuda, di temenê têgihiştinên û rengên têgihiştinê ên wê demê de na.

Li kurdistanê, her serê salê, li gorî, «salname kurdî» dihê pîroz kirin. Di **salname kurdî** de, ku tu bêje 1´ê heyvê, wê li gorî zayîna Îsa, bê 14´ê

heyvê. Ev salname kurdî, hê ji wê demê maya. Lê hijmartina rojmêrê hinekî weke ku cuda bûya. Minaq, dema ku li gorî wê salname kurdî tê ser ziman û hasibandin, Nebî Nûh tê gotin 960 salî ya. Ev di tewarata Nebî îsa de jî bicih bûya.

Di salname kurdî de, her serê salê li gorî wê salname zarok hevdû dixamilênin û xwe jê dixamilênin û li malan derî bi derî digerihin û hêk û genim berhev dikin. Lê dema ku hatina ber devê dêrî jî, wê keçikek û kûrikek derkeve pêşîya komê û wê bibêje ku ”serê salê/ binê salê/ Kebenîyê destzêrînê/ destê xwe biavêje kûlînê/ Bahre yazda bi vir de bêne/. ..

**Pîrozkirina serêsalê**, weke ku dihê dîtin, di temenê destpêkekê û pîrozîyekê de dihê kirin. Bi wê yekê re, ew rewş dihat kirin. Mîtra, weke yazdanakî şîroveya wî hatîya kirin û pêşxistin û destpêka wî wusa hatîya pêşxistin.

**Ev demên Mîtannîyan**, divê ku mirov herê bike ku Mîttannî, di wê demê xwediyê pêşketinaka mazin in. Berî wan, demên pêşketinê ku bi aqil bûna, wan ji xwe re kirina temen û li ser wê re demek nû bi xwe re û di dema xwe de û her wusa di nava xwe de li herêmê dane destpêkirin. Ev dema Mîtannîyan, dema ku em wê bi tememî sadî sad bi aqilê felsefê wê şîrove bikin û werênina ser ziman.

Dema Mîtra, dema ku em lê dinerin, em dibînin ku çand û kevneşopî û pîrozîya melekê Tawis lê serdest bûya. Pergale olî bi rengê bawerîya wî bûya. Pêşketinên weke pêşketina Mîtra bixwe jî, di nava wê pêşketinê de bûna û ew ji xwe re kirina temen û li ser wê re pêşketina. Divê ku em vê yekê di serî de kifş bikin û werênina ser ziman. Mîtra,  weke ku mirov ji tefsîrên wê demê kifş dike, piştre jî, di wê **xate melekê Tawis** de dimeşê. Yanî, ev rewşa wî ya gûrandina ga´, çend ku di rewşna cuda û weke ku di temenê li berrabûnekê de dihên li berçav jî, di aslê xwe de, em nikarin bi tememî di wê temenê de fahm bikin û werênina ser ziman. Herî zêde rengê şîrovekirina di derbarê Mîtra de ku wî weke yazdanakî şîrove dikin em dikarin wê weke nîşanaka vê yekê bidina nîşandin. Melekê Tawis bixwe jî, di wê temenê de û di wê rengê berî wî hatîya şîrovekiirn û hata ku dem hatîya wê demê jî, bi wê rengê, ji wî re berg hatîya kirin û bawerî hatîya dayîn nîşandin. Melekê Tawis, pêxemberê serdemeka mazin ku em nikarin bin 2 hezar salan re şîrove bikin a. Ev dem, tenê heta dema Mîtra wusa ya.

Di temenê pêşketina hûrîyan de jî û Mîtannîyan de jî, çand, kevneşopî û bawerîya **melekê Tawis** û bi pergalî pêşketîya heya. Mîtra li ser wê re

pêşketîya û xwe hanîya ser ziman. Ku em bibêjin, di wê pêşketinê û xatê de mîtra demek nû bixwe re û pêşketina xwe re daye destpêkirin wê ne xelat bê û rast bê.

Her wusa, di berdewamê vê de em divê ku werênina ser ziman ku rengê pêşketina Mîtra bi rengê têgihiştin û hişmendîya stêrzanîya wî û hwd ve giring a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahm bike. Mîtra, di vê temenê de divê ku em wî bênina ser ziman ku wî weke ku ji nû ve hemû demên xwe yên berê di şîroveyeka teybet a bi aqil de derbas kirîya. Bi wê yekê, wî di dema xwe de, temenekî giring di dema Mîtannîyan de jî bo pêşketina wan afirandîya. Mîtra, li vir, rengê pêşketina wî, ji aliyekî ku ku em fahm bikin, wê aliyekî giirng ê pêşketina mîtannîyan jî bi wê re were dîtin û fahm kirin. Ev alî jî, wê bi pergalî têgihiştinî û hişmendî û hwd bê.

Mîtra, divê ku em di vê temenê de rengê hizirkiirna wî hildina li dest. Dema ku em hewl didin ku dema wî bi serborîya wî, em xwe nagrin û dikevina nava şîroveyeka hişmendî û aqilmendî de. Ji ber ku ev weke teybetmendî û pêşketina wî ya. Ya ku me dikişêne nava wê reng şîroveyê jî, ev rengê pêşketina wî ya. Divê ku em vê yekê jî bi teybetî werênina ser ziman.

Mîtra, divê ku em bibêjin ku destpêkeka giring û pêşketî di destpêka serdema aqil de ya. Wî bi pêşketina xwe re demek girtîya û yek vekirîya. Bi vê rengê, ew zayînaka dîrokî ya. Divê ku wî jî bi vî rengî werênina ser ziman. Ji ber ku ev giringa ku divê ku mirov wê baş û qanc fahm bike.

Dema Mîtannî, ji xwe demeka aqil a. Di wê de aql bidest pêşketina xwe kirîya. Her wusa, di wê destpêkirna pêşketina aqil de, Mîtra jî, weke pêvajoyeka teybet divê ku mirov hewl bide ku wî fahm bike û werêne ser ziman. Wê hingî, ew jî, û dem jî û rengê pêşketina wî û bi bawerîya wî re û her wusa bi hişmendî û aqilîya wî re were dîtin û fahm kirin. Mîtra, destpêka van demên ku em dijîn ku em çawa wan bijîn bi têgihiştin û rafaransên wê ên hizrî û têgihiştinî re bi hiş û aqil daye destpêkirin. Piştre jî li ser wê re dem bi dem êdî mirov û dem hatina û pêşketina û lê zêdebûna.

Di van temen û teybetmendîyan de Mîtra weke aqilîyeka mazin ya demê ya bi hişar û têgihiştin a. Mîtra, di aslê xwe de, çend ku hemû pêşketinên hizrî ên pêşketî wî re wî temenê wan ê hizrî bi rafaransên wan re afirandîya  hanîya ser ziman jî, ew bi tememî û li gorî rastî û mazinahîya xwe hê bi başî ne hatî kifşkirin û fahm kirin.

Bi vê yekê û rengê, divê ku mirov Mîtra biteybetî wî hilde li dest. Mîtra, bi vî rengî divê ku em dûbare werênina ser ziman ku destpêkeka dîrokî, zayînî û hiş a felsefîkî ya. Di vê temenê de, divê ku em pêşketinên piştî wî re baş bixwênin.

Di dema wî de, Mîtra, hinekî ji aliyê oldarîn ku bi wî bibawer bûn hatibû dîtin û fahm kirin. Lê ew jî, ne bi tememî. Mîtra, di dema wî de, ew mazin hanîna wî ya li ser ziman bû û ew hişê wî yên ku di serê mirovan de rûniştibû ku ew weke ´yazdanakî´ dide şîrovekirin bi wan bawermendên wî re.

Weke ku me di destpêka vê beşê de hanî ser ziman ew stêrzanîya wî divê ku em carek din li wê vegerihin, ew giring a. Ew giringa ku divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Mîtra, li azman dinerî. Stêr, gerwêrk û hwd, hemû wî xwestîya ku wan şîrove bike û fahm bike. Kirîya jî. Wî, di dema xwe de, di nava mirovan de di vê warê de zanînaka mazin ya xort û kûr daya çê kirin. Êdî li ser wê zanînê re hin bi hin pêşketin dibin û rû didin. Bi bawermendên wî û pîrên civatê re wê piştre gelek dordorên din jî wî kifş bikin û hewl bidin ku werênina ser ziman. Di vê temenê de, ew mazinê wê dema xwe ya bi navê Mîtannîyan a.

Dema mîtannîyan, hê jî, ew bixwe jî bi başî bi pêşketinên xwe yên dîrokî re baş ne hatîya fahm kirin. Di şîrovekirinên wê de jî, ne li gorî rastîya wê, her wusa li gorî, hin nêzîkatîyna dihê kirin.

Mîtra jî û dema wî dema Mîtannîyan bi xwe jî divê iu em bi teybetî biserê xwe hiilde li dest û hewl bide ku fahm bike. Mîtannîyan, serdemek bi hemû lingên wê re pêşxistin. Ew demên wan ên aqil, piştre, çendî ku baş hatina xwandin, bi wê aqil û pêşketin pêşket û bû. Ew pêşketina demên Mîtannîyan, bo ji demên piştre ên hemdem ku tên û pêşketin jî. Bi vê rengê, dema Mîtannîyan giirng a.. Di nava wê giringîyê de, divê ku mirov li wê girîngîya Mîtra binerê û hewl bide ku fahm bike. Têgihiştina stêrzaniyê ya Mîtra û bawerîya wî, giringa ku rengê pêşketina wî bi me dide têgihiştin û kifşkirin. Mîtra, bi wê re, piştre jî, weke ku li gerwêrka keywanê rûnûştîya ku li dunyê dinerê û li wê pêşketina dibe dinerê. Ku dinerê, dibêje ku ev raste û ev ne rast a.

**”Mîtra ku li taxt rûniştîya û ga, taxtê wî dikişênina bi ber azmana û rojê ve. .. ”**

Mîtra, weke yazdanakî hatîya şîrove kirin. Mîtra, dema ku li parastgehê dimêne, gotin bi gotin ji mirovên li dora xwe re dihêne ser ziman. Yazdanê mazin, hizreka mazin bi hişekî mazin de kirîya serê wî

de. Gîyanê wî bizanebûn kirîya. Mîtra jî, oldarên wî bi vî rengî şîrove dikin.

Mîtra, piştî ku bi çend mirovên li dora xwe re ku çûya daristanê û li wir ku xezalek derketîya ber wî û kirîya ku tîr bi kavana xwe bi avêje wê û piştre ku neavêtiya û piştre ku li şûna wê tîrê xwe avêtiya û li kevirekî xistîya û tîr di kevir de çûya û kevir kirîya du-qat û ji wî kevirî ku ji nêvî ve kirî du-qat û ji nêvî ve qalişîya ku av diherikê, ku ev rewş bi navê Mîtra re tê ser ziman, wê pirr navê wî bide bihîstin. Ev weke hin behîtên ku wî dane nîşandin. Mîtra, piştî wî re wê gelek kirinên wî ên ku bi navê wî re bibin wê werina ser ziman. Li ser avê re meşîn û ne ketina ardê û nava avê de jî, weke vegotinaka ku bi navê Mîtra re dihat ser ziman bû. ..

**Mîtra, weke ku çawa ku ew bi behît dihat dîtin, her wusa ew ´tîr û kavan´a wî jî bi behît hatîya dîtin. Piştre ji aliyê oldarên wî ve bi vî rengî hatîya şîrove kirin: ...**

**”tîra ku ji destê Mîtra bi kavana wî re ji destê wî çû, wê qanciyê bi xwe re bêne. Wê başî û evîndarîyê li dil serdest bike. Wê hijkirinê bike dil. Wê rastîyê bide li berçav.” Bi vî rengî, weke ku ew ´tîr´a ku ji wê kavanê dihat avêtin, ku weke ku bi ”gîyan” bê, dihat şîrove kirin û şîroveya wê dihat pêşxistin. Mîtra, ew tîr û kavana wî jî, wê ji dev bi hanîna ser ziman û şîrovekirinê wê pîrozîyek bi navê wê re û bi wê re were ser ziman. Weke ku çawa ku Mîtra, li azmana li ”qata keywanê” hatîya bicih kirin, weke ku ”ga li gelawêjê hatîya bicih kirin”, wê tîr û kavana wî jî, bi vî rengî bi awayekî stêrzanî û kozmosî wê were dîtin û wê bi dunyekekê re were dîtin. Ew qata azmana jî, wê qata bi navê ”qata tîrê” bê. ”qate tîrê” û ankû ”tabaqaya tîrê”, yek ji wan qat(tabaqa)yên heftan ên ku Mîtra bahse wan kiribû bû. Bi vê yekê, ew tîra Mîtra, divê ku mirov bi teybetî bahse wê bike. Piştre, rêmildarên oldarî ên Mîtrayî, bi wê re weke ku piştre ”fal tên vekirin û lê nerin”, ”pêşaroja mirovan bi wê tê xwandin” û hwd, wê rewşên bi vî rengî ên kozmoskî bi wê re pêş bikevin û werina ser ziman. Dema dema ku em li nava wan dagerên ku ku bi wan ”fal dihatina vekirin” û ankû ”li falan dihatin nerin” û bi wê li ”pêşaroja mirovan dihat nerîn ku ka wê çi werê pêşîya wan bi qancî û ankû xirabî, emê bibînin ku hemû dagerên ku bi Mîtra re bûna. Şêr, dema ku Mîtra li daristanê li ser hasp dimeşê li aliyê wî yê çapê heya. Mar li aliyê wî yê rastê heya. Demsala ku herî germa û ku di wê demê de têhna rojê dide dunyê de ´tûpişk´ derdikeve ser rûyê ardê. Piştre oldarên Mîtrayî, tefsîra wê çêkirina û mirov ku nêvî mar**

**û nêvî tûpişk çê kirina. Hinekan piştra gotîya ku ew nêvî aliyê mirov Mîtra jî ya. Bi wî re jî, n ku hanîna ser ziman jî hena. Wekî din jî, ”dare qaj” ku bi navê ´dare çamê´ jî tê bi nav kirin heya. Mîtra, çûya ser serê dare qajê û dar di nêvî de bûya sê-beş. Ew dare qaj(çam)ê, piştî ku li sê-beşan bûya beş, êdî ew beşbûna dare qajê jî, bûya weke sembelek û behîteka Mîtra. Oldarên Mîtra, wê wê dare qajê ku li sê-beşan bûya beş, di hildin li hêtên parastgehê naqş dikin. Bi wê re jî, dare qajşê, pîrozîyek û tefsîrek pîroz standîya. Ev dare qajê, divê ku mirov bibêje ku di nava çanda Mîtra de û di nava bawerîya wî de, cihekî wê yê teybet ê pîroz jî heya. ..**

**Ga´, ji xwe di nava wan dagerên xwandina pêşarojê de ku bi rengê ´falê nerînê´ û hwd bê û ku rengên din bê, di nava wan de heya. Ga´, ji xwe pîrozîya wê, li ser nayê nîqaş kirin jî. Pîrozîya ga´, piştî ku oldarên Mîtra ew li azmana li qata gelawêjê biich kirin jî, êdî weke ku ew nêzî yazdanê mazin kirin lê nerîn. Mîtra, bi vê rengê, êdî ew jî li qata keywanê hat bicih kirin û pîrozîya wî hatîya maztir kirin. Ga´ jî, bi wê rengê hatîya bicih kirin. Masî jî, aliyekî wê yê teybet heya ku bi Mîtra re. Tê gotin, wî bi masîyan re danûstandin kirîya. Bi wê yekê, ji masîyan, di derbarê azmanan de bihîstîya. Masî, di nava avê de diçin. Ew çûyîna wan ya nava avê de, weke ku li hewayê bifirin dihê li berçav. Mîtra ji wê hinek wate derxistina û bi wê kozmosa azmana û sekna wan ya li azmana bi gerwêrkên din re fahm kirîya. Bi vê yekê re, lê bizêdeyî, axiftina wî ya bi masî re diê ser ziman û bahse wê dihên. Bi wê re oldarên wî, gelek tefsîrên din jî bi vê ve girêdayî bi Mîtra re pêşxistîna.**

**Mîtra, di vê temenê de, divê ku em bibêjin ku ew dagerên ku î ro dihên bikarhanîn bi wê rengê, hemû jî digihijina wî û bawerîya wî. Lê Mîtra, bi wan, ji du aliyan ve fahm kirin dikir. Yek, bi rengê stêrzanîyê ya. Ya din jî bi rengê nîşandina ”baxtê” û bi wê re xwandina pêşarojê ya. Mîtra, ji oldarên xwe re gotibû ku ”yazdanê wê, winê çi dijîyane xwe de bijîn daye kifşkirin û nivîsandîya.” Bi wê re jî gotibû ku farişteyek li ser milê rastî û yek li ser milê çapê ya. Yê milê rastê xêran dinivîsêne. Yê milê çapê jî gûnahan dinivîsêne.**

Mîtra, di vê temenê de, çerçoveya jîyanê bi hizrî kiribû ku ji wan re bêne ser ziman û ji wan re bibêje ku ´divê ku win di wê çerçoveyê de fahm bikin.´ Bi wê re jî, Mîtra li ser oldaran bixwe jî, gotinên wî ên giring hena. Wî digot ku ”dema ku oldar di rêya xwe de bê û rêya xwe şaş nakê, wê bi hîskiirnên xwe re karibê xwe bigihêjena ya rast û wê

rastiyê fahm bike.” Bi wê yekê re, weke destûrekê, di vê çerçoveyê de oldarn Mîtra xwe didane fahm kirina rastiyê û xwe gihandina rastteqîniya wê. Bi vê yekê, ew êdî dibûn weke mirovna ku xwe û jîyane xwe dane fahm kirin û rastteqîniyê û ku rê şanî mirovan bidin. Wan ya rast dizanî. Bo vê yekê, dikarîn bibînin fahm bikin û bênin ser ziman ku wê di jîyane mirov de çi û çawa derkeve ber mirov û mirov wê çawa bijî. Di vê mijarê de, di çerçoveyaka ku Mîtra bahse yazdanê mazin û serdestîya wî ya li jîyanê dikir, ji oldarên xwe re digot ku ´ win jî, ku di rêya wî de bin, winê wê jîyanê weke ku we paşaroja wê dîtîya winê pêşaroja wê jî bibînin.” Bi vê yekê, oldaran jî, xwe dide hizirkirina bi wê. Di vê temenê de, stêrzanî di nava wan de bi vê rengê pirr zêde jî pêş dikeve. Stêrzanî, temenekî fahmkirinê ê jîyane mirov bû. Di wê rastîya wê de, rastîya mirov heya.

Dema ku Mîtra, di vê temenê de dihanî ser ziman, êdî di temenekî hiş û zanînî de rê şanî wan dide. Mîtra, temenê gotinên xwe bi vê yekê li ser zanînê ava kirina. Bi wê yekê, hewldaya ku bide fahm kirin. Nepenî, di têgihiştina Mîtra de, heya. Lê Mîtra, di wê têgihiştinê de ya ku mirov dikarê ”xwe bigihijêne wê nepeniyê” jî. Lê bo wê jî destûra yazdanê mazin pêwîsta. Wekî din jî, ti astengî li pêşîya wê tûna ya. Ji xwe, li gorî Mîtra zanîn, hinekî jî, bo dîtin û fahm kirina wê nepenîyê pêşketîya. Yazdanê mazin di jîyanê de bicih kirîya. Nepenî, ´carna heya ku bibe sedema şik û gûmanê di serê mirov de´ jî. Divê ku mirov wê jî bibînê û fahm kirin. Lê nepenî, hêz û kûdreteka wê ya ku mirov fahm bike heya. Nepenî, li gorî mîtra ne nezanî ya. Li gorî wî, ji xwe hertiştî bi zanebûn û hiş a. Lê nepenî, weke perdeyeka ku bi ser çav de hatî berdana. Dema ku ew berda hat rakirin, wê ew nepenî jî, ji xwe êdî ji holê ra bibe.

Mîtra, di dema xwe de, vê yekê pirr zêde dide fahm kirin. Di dema wî de, pîrozîya ga´, çend ku di nava çanda û bawerîya mîtra jî sereke ya û heya jî, divê ku mirov bibêje ku weke aliyekî bi pirsgirêka jî bo Mîtra. Ew serjêkirina ga´ a ji aliyê Mîtra ve, bi tememî weke ku Mîtra tefsîr dike û dihêne ser ziman, nayê fahm kirin û ev jî dibe sedema domandina bertek û hin dijberîyan jî li dijî wî.

Lê mîtra, di ya xwe de û di ya di serê xwe de pirr safî û zelal bû. Ti şik û gûman bi wî re di serê wî de tûna bû. Mîtra, di vê yekê de, zelal bû. Oldarên wî jî, weke ku Mîtra hanîna ser ziman, ”ên ku tam wî fahm kirina”, ”ên ku hindik wî fahm kirina” û ”ên ku wî fahm kirina û lê ku bi wî re na û weke bawermendên wî dijîn” hena. Bi vê yekê de, ew di temenê sê beşan de wan beş dike. Bi wê yekê re Mîtra, êdî hertimî ji bawermendên xwe dipirsê ku ka ”win ji kîjan komikê ji van in.” Bi wê re

jî, ji wan bersiv digirt û dixwest ku rastiyê fahm bike. Mîtra, bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku li cihê xwe yê teybet ”lelinîşê” ku di rûnişt, li dora wî pirr zêde mirov di rûniştin û lê dihisandin. Bi wî re jî, li dora wî dibûn kom û lê dihisandin. Ji her dordorê, ên ku hatina û li civate wî bûna mêhvan bûna. Mîtra, ti kesek ji cem xwe dernexistiya û ne gotîya ku tu ne ji me yî, newe vir. Ev aliyê Mîtra kirîya ku wî maztir bike.

Mîtra, di nava civate xwe de, dema ku diaxift, dikir ku rastîya yazdanê xwe bi mirovan bide fahm kirin. Ew bivê yekê, di nava hewldanekê de bû. Li gorî ku dihat gotin û ser ziman jî, Mîtra hertimî têkilîyeka wêê ya bi yazdanê wî ê mazin re hebû. ”Ew li rex hevdû bûn.” Ji xwe, ji ber wê yekê ya ku bi wê rengê tê bawer kirin ku di dema xwarinê de cihê yazdanê mazin û Mîtra li rex hevdû hatîya kifşkiirn. Dagera yazdanê mazin hatîya çê kirin ku weke ku yazdanê mazin destê xwe avêtiya ser mil û pişta Mîtra. Di vê temenê de pirr tefsîrkirin ji aliyê oldarên Mîtra ve hatina kirin.

Ev rewşa ”li ser xwarinê bi hevdû re rûniştinê”, divê ku emm hinekî bi teybetî li ser bisekin in û hewl bidin ku wê baştir fahm bikin. Ji ber ku ev rewşa bi hevdû re li ser xwarinê rûniştin, weke rewşeka teybet ku di ”roja pîroz” de dihê kirina û weke ”xwarina pîroz” ku dixwûn dihê dîtin û şîrove kirin. Bi wê rengê, ew roja pîroz, bi navê Mîtra re pirr zêde hatîya ser ziman. Di tefsîrên Mîtra de, hatîya ser ziman ku Mîtra û yazdanê wî li rex hevdû li ser sofrê rûniştina bi hevdû ra xwarinê dixwûn. Ev rewşa Mîtra ku bi yazdanê mazin re rûniştîya û xwarinê dixwe û bi wan re çend bawermend û pîrên bawerîya Mîtra jî li dora wan bi wan re li ser sofrê rûnştî dihê tefsîrkirin û naqşkirin jî. Bi wê re jî, ev bi hevdû re xwarin xwarina Mîtra û yazdanê wî, weke peymaneka di nava yazdan û Mîtra de ku hatî Mohrkirin jî hatîya ser ziman û şîrove kirin. Bi vê yekê gotina **”xwarina pîroz”,** ”bi hevdû re xwarin xwarina pîroz”, ” bi hevdû re li ser sofra xwarina pîroz rûniştina” û hwd, hatîya ser ziman.

Dema ku em bahse Mîtra û wê rewşê bikin, divê ku em bi teybetî û bi giringî hinekî li ser wî bisekin in. Oldarên wî jî, ev rewşên ku me bahse wan kir, bi navê wî re naqşkirina û tefsîrkirina wan jî pêşxistina û nivîsandina. Bi vê yekê re, li ser wê re jî, wê çawa bi mirov bidina fahm kirin, li ser wê jî sekinî na. Ew rewş, weke rewşna pîroz, bi Mîtra re hatina ser ziman û hatîna dayîn fahm kirin ji aliyê oldar û pîrên bawerîya wî ve.

Mîtra, li vir, ev teybetmendî û rewşa bi wî re, aliyekî giring ê di temenê pêşketina bawerîya wî de jî ya. Mîtra, bi wê yekê re, weke

”zarokê yazdanê” mazin jî hatîya dîtin û binav kirin. Weke ”zarokê rohniyê” hatîya dîtin û bi nav kirin. Weke zarokê ji gîyane yazdanê mazin afirî ew hatîya ser ziman û bahse wî hatîya kirin. Gotina zarokê rohniyê, gotinaka ku em li vir, bi navê Mîtra û Yazdanê wî re werênina ser ziman. Bi vê yekê, hertimî, têkilî biwî re hatîya danîn.

Di wê demê de weke yazdanaka dayikê û bereketê jî yazdana dayik ”**hebedê**” weke dayika wî jî hatîya ser ziman. Bi wê yekê re, navê wê dayika wî jî, pirr zêde hatîya ser ziman. Weke yazdanaka jin ku bereketê di jîyanê de pêş dixe û zarokên xwe diparêzê tefsîrkirinên wê bûna.

Li vir, dema ku em ji vê aliyê ve lê dinerin, em rastîya wê baştir dibînin û fahm dikin. Mîtra, bi oldarên wî re şîroveya ku hatîya pêşxistin, nirxên dema Mîtannîyan bi pîrozîyên wan re hewl hatîya dayîn ku cardin werina şîrove kirin û bi wê re ni nû ve werina ser ziman. Bi wê re jî, Mîtra weke nirxekê di temen û heyînîya wê de hebe. Mîtra, weke ku hatîya tefsîr kirin, hertimî di rex yazdan û navê yazdan de ew hatîya şîrove kirin. Weke ”zaroyê yazdan” hatîya dîtin û şîrove kirin. Ev aliyên Mîtra, hinekî jî teybetmeniyên wî êdî maztir dike û giranîya wî nava civate wî de zêdetir û maztir dike.

Mîtra, li ti bawerî û dijberîyê pêşnaxê. Ev teybetmmendîya wî heya ku divê ku em bi teybetî fahm bikin. **Daeva**, ku hena jî, ji aliyekî ve weke ”farişteyna ku dikarin zirerê bidina mirovan” jî hatina şîrove kirin. Ji wan re qancî û berg hatîya girtin bo ku zirerê û tûfanê bi serê wan de û di jîyan wan de newênin. Ev rewşa xêrdayîna ji **daevaan** re ku bo ku zirerê ne dina wan, di bawerîya wan ya berê de jî hebû û wê piştre jî hebûn û heyîna xwe biparêzê.

Oldarên Mîtra, li vir, divê ku em bibêjin ku Mîtra di wê demê de weke yazdanekî hanîna ser ziman. Di wê temenê de tefsîra wî kirina. Mîtra, bi wê yekê mazin kirina û mazin hanîna ser ziman. Bandûra Mîtra, wê bi vê yekê, piştre êdî hin bi hin ji nava sînorê xalkê wî û welatî jî wî derbas bibe. Ji gelek der û deveran ên ku navê dibihîzîn tên ku werin û wî bibînin. Tên jî, Tên û wî dibînin. Mîtra dibînin, nas dikin û fahm dikin. Rastîya wî, baş dibînin û piştre diçin û di nava xalkên xwe de jî dihênina ser ziman. Bivê yekê, Mîtra barî nava xwe jî dikin. Mîtra, bi vê yekê, bandûra wî li herêmê zêdetir û maztir dibe. Li herêmê, di wê temenê de bawerîya Mîtrayî, pêş dikeve û serdest dibe. Mîtra, hê ku li jîyanê ya, vê yekê dijî. Li vir, divê ku bi teybetî, em vê yekê jî bibêjin ku bawermend û pîrên oldarîya Mîtra bawer nakin ku Mîtra mîrîya. Hertimî, dibêjin ku ew dijî. Bo vê yekê jî, tefsîrên ku bi wî û navê wî re kirina, di wê temenê de

na ku Mîtra li ser taxtê xwe rûniştîya û çend bi hevdû re wî taxtî bi berjor de bi ber rojê de dikişênin û Mîtra dibîna cem yazdanê mazin.

**”Mîtra nemirîya.”** Ev gotin, weke gotinaka ku pîroza jî di nava oldarên Mîtra de. Ku yek ji nava oldarên Mîtra rabê ser xwe û bibêje ku ”mîtra Mîrîya”, wê weke ku gûnahak kiribê wê lê were nerîn û wê heta ku bê gotin ku ew ji bawerîyê derketîya. Bi vê rengê wê ew were ser ziman. Tê bawer kirin ku Mîtra bi taxtê wî re ga´yan ew kişandina azmana ber bi rojê ve. Lê Mîtra, ku roja wê hat wê were dûnye. Wê carek din were dunyê û wê dadîyê pêş bixe di nava mirov û jîyane mirov de. Lê Mîtra ji cihê ku nûha lê jî ya, ji wir dûnya û kirinên mirov hemûyan dibînê. Ew tişta ku dibînê ji bîr nakê. Ew li wir li ser taxtê xwe rûniştîya û li dûnyê tamaşa dike. Ji wir, ya rast û ya ne rast bo dunyê û mirov jî kifş dike. Lê wê ew were dûnyê. Ew, wê were dûnyê. Wê carek din dunyê bi dadî bi rê ve bibe. Li gorî ku di nava kurdan de î ro jî tê gotin ev a ku ”wê mîtra were xwarê li dûnyê. Wê piştre li dijî neqanciyên ku piştî ku ew ji dûnyê çû û li dûnyê afirîna wê têbikoşê. Wê di wê şerê de, weke ku yazanê mazin di baxtê wî de nivîsandîya wê bi serbikeve.. Piştre wê 40 salî, li dûnyê bi dadî wê aramî û aşîtî bibe. Di wê aramî û aşîtîyê de wê ´gûr û meh bi hevdû re biçêrin lê wê yek jî zirerê nede ya din´. Wê Ev rewşa dûnyê û aramî û aşîtîya li wê ku Mîtra bi dadwereî û dadî pêşxist, wê ji aliyê yazdanê mazin were dîtin û wê pirr bêacibandin. Piştre wê yazdanê Mazin, rêya bihûştê û dûnyê bi hevdû ve girê bide û bike yek.” Ev rengê şîroveyê, bo oldarîya Mîtra hatîya ser ziman.

Mîtra, tekoşarê dadîtîyê û dadwerîyê jî ya. Tekoşîna Mîtra hertimî bo rastî û dadîyê ya û bo mirovatîyê.

**” Heft qatên azmana ..”**

Mîtra, li gorî ku tê bawer kirin, dema ku dema goçkirina ji dûnyê, bi fermane yazdanê mazin ew ser taxt ku ga wî dikişênin bi ber azmana û rojê ve, wî dibînin û li nêzî yazdanê mazin bicih dikin. Ev, di temenê de heyîna Mîtra dihêne ser ziman. Mîtra, piştî ku çû azmana bi taxtê xwe re, wê li wir êdî heta roja ku ew wê carek din were dûnyê wê li vir bê. Ji wir, wê li dûnyê û kirinên mirov ên di wê de bibînê. Mîtra, hertiştî dibînê ji wir. Piştre jî. Mîtra ji wir, di serê xwe de bi dîtîna xwe re qayd dike.

Mîtra, zaroyê yazdanê mazin ê pirr bi qadr û qiymet û bi rûmet û rêz, ”keyanîya wî li ser mirovatiyê ava ya.” Ew, xwediyê keyanîya xwe ya ku wê ´hetaheta´ bjî ya.

Oldarên Mîtra, di vê temenê de gelek şîroveyên mazin boo wî pêşxistina. Di tefsîrên ku kirina de, di wan de bahse ´taxtê Mîtra´ kirina û ew hanîna ser ziman. ”taxtê wî li cihê herî bilinda ku her dere ji wir Mîtra dikarê bibîne.

Oldarên wî, rewşên wî bi stêran re pirr zêde hanîna ser ziman. Cihê wê li dûnya li azmana danîna di rex ya yazdanê mazin de. Li wir, ew dîsa li ser taxtê xwe ya. Ew dîsa ´weke zaroyê yazdanê mazin´ rêvebirinê dike û rê şanî mirovan dike. Mîtra, bi vê yekê, dihê ser ziman.

Di dema wî de jî, di nava oldarên xwe de wî pirr zêde bahse keyanîya yazdanê mazin kirîya- Mîtra gotîya ku ”yazdanê mazin li ser taxtê xwe rûniştîya û ji wir hertiştî dibînê û bi rê ve dibê. Ji wir bihûşt dojeh çêkirîya. ”Heft qatên azmana´ çêkirîya û li gorî qancî û kirinên mirov ên baş, ew mirov li wanderan bicih dike. Di bawerîya Mîtra de, ”hemû gîyan, wê di dawiyê de bi hewa bibin û herina azmana.” Lê hinek gîyan, wê zû neçin. Wê di tirba xwe de û li dûnyê bimênin. Wê ev jî, ji wan re bê weke cezayekî ku beremberê kirinên wan ên nebaş. Hinek mirov wê hindikî bimênin. Hinek jî, wê zêde bimênin. Lê yazdanê mazin, sînorê hemûyan jî, bikirin û hewldanên wan re bi sînor kirîya.

Lê gîyanên ku bi hewabûn û çûna azmana, wê li wir serbest û azad bin. Wê bi rûmet û rêz bin. Wê binirx bin. Ew gîyan, wê piştre carek din, ku yazdanê mazin rast dît, wê bi laşekî re bişêne dûnyê. ..´

Bersiva Mîtra ji wê re heya ku dema ku gîyane mirov care duyemin bi laş bû û hat dûnyê jî. Rojekê, oldarekî Mîtra ji wî pirsîya ku ”dema ku care dûyemin gîyan bi laş bû hat dûnyê, wê bi zanebûna jîyane xwe ya berê wî jî wê were?”. Mîtra bersiv daye wê pirsê û gotîya ku ”wê tenê ew hişê jîyane wê gîyanê ya berê, ku li azmana bû û gîyan bû wê bibe. Lê wê jê neçê û newê ji bîr kirin. Piştre jî, wê were dûnyê. Ku hat dûnyê bi care duyemin, wê wê tenê di hişê wê jîyane xwe ya wê demê de bê. Bo ku ew karibê wê jîyane xwe bi rastî û di aramîyê de bijî, wê ew ji bo wî wusa bê. ” Li vir Mîtra, xate kîşandîya û gotîya ku mirovê ku bi jîyane xwe ya li dûnyê j destpêka jîyanê xwe û heta dawîya jîyanê xwe ku bi başî jîya ku care duyem bi laşbû û hat dûnyê ku bijî, wê bi wê qancî û paqijîya xwe bibîr bike. Wê hingî, ahangekê bi wî re bi afirê.” Mîtra, ev jî gotîya. Lê Mîtra, ev jî gotîya, ku ”mirovê ku qanc bê û di jîyane xwe de hertimî qancî kiribê, wê li azmana li cem taxtê bavê min, wê min bibîne, wê çavên wan bi min bikeve.” Ev gotin jî, Mîtra gotîya.

Mîtra, dema ku ev vê dibêje, piştre vê jî bi ser gotina xwe ve dike. ”Ew mirovê ku min û bavê min yazdanê mazin dît, ew mirovê herî bi

baxt a. Ew ê, derîyê bihûştê ji wî re vekirî bê. Ew, li wir jî, leşkerê min bê.” Mîtra vê yekê dibêje. Lê Mîtra, di derbarê hatina xwe ya li xwerê care dûyemin de jî gotin gotîya. Wî, ji bawermendên xwe re gotîya, ku ”dema ku win hertimî li cem bûn, piştî ku ez hatim dûnyê, winê jî bi min re bin.” Yanî, wê care duyem, bi Mîtra re werina xwerê. Mîtra, bi vî rengî ji xwe bi êmin û biewla ji bawermendên xwe re diaxift.

Bi vê yekê, di derbarê bihûştê de, nîqaş di serê bawermendên wî de bûna. Mîtra, dema ku bahse hatina xwe ya care duyem dike û piştre dibêje ku wê ”şerekî mazin di nava qancî û neqanciyê de wê bibe. Wê yazdan, sê rojan maf bide neqanciyê ku serdestîya xwe bike. Lê piştre wê di tekoşîna xwe ya bi qanciyê rre de, wê têkherê û wê aramî û aşîtî were û serdest bibe bi qanciyê re. Wê piştra 40 salî, dûnya di aramîyê û aşîtîyê de bê. Wê di wê demê gûr û meh bi hevdû re biçêrin lê wê zirerê nedina hevdû.” Piştî vê re jî, bawermendên Mîtra di nava xwe de pirr zêde li ser vê nûqtê gûftûgoyan di ava hevdû de dikin. Pirr danûstandinên wan dibin. Di dawiyê de gotinaka Mîtra ya din jî ku di dawîya wê vegotina kort de gotî heya. Ew jî, ew a ku ”wê di dawîya 40 salî de yazdan bibîne ku dûnya di aramî û aşîtîyê de wê rêya bihûşt û dûnyê bi hevdû ve girê bide û piştre wê bike yek” jî, weke gotinaka ku li ser wê dihat axiftin. Êdî her bawermendên Mîtra dibûna tekoşarê wê qaniciyê ku yazdanê wan bi rêya Mîtra ji wan dihanî ser ziman.

Bawermendên Mîtra, tekoşarên wê aliyê qanciyê na ku wê serdest bê kirin. Lê jî, kirin divêt. Mîtra jî, dibêje ku ”ti tişt bê kirin nabê!” Her tişt bi kirin dibêt.

Li ser têgihiştina kirina dûnyê û bûhiştê yek, weke gotina û hişekî giring ê ku bawermendên Mîtrayî jî pirr li ser sekinî na. Ew di vê çerçoveyê de hizirîna û hizrên xwe hanîna ser ziman. Wan, hizrên xwe mazin hanîna ser ziman. Bawermendan, dema ku ew dem(´ew dema 40 sal ku piştî ku Mîtra hat dûnyê û ku ew di wê de li ser taxt a û keyê wê dûnya aram û aşîtîyê ya´)şîrove kirin, bi gelek dîmenên xweşîk şîrove dikirin û dihanîn ser ziman. Di wê dûnyê û hişê de kuştin qadaxa ya. Û ji aliyê yazdanê mazin ve tê biceza kirin. Ji ber ku ti kesek nikarê yekî bikujê. Dema ku yekî mirovek kuşt, ew xwe dike cihê yazdanê mazin de. ”Mîtra jî, bo vê yekê kuştin haram” kirîya. ”Her kuştinek, weke çêkirina şîrîkatîyekê ya ji yazdanê mazin re.” Yekî ku xwe kir **şîrîk** ji yazdanê mazin re, ew xwe dike gunehê de.” Li vir, divê ku mirov bibêje ku gotina ”şîrîk”, gotinaka ku Mîtra bikarhanîya ya di vê temenê de. Ev gotin

bixwe jî, gotinaka dema hûrî û mîtannîyan a. Bi wê yekê, divê ku van neke. Bo vê yekê, kûştin, qadaxa ya.

Ev têgihiştina qadaxa kirna ´kuştinê´, di vê temenê de di Mîtratîyê de di temenê ”xwe kirina şîrîk ji yekîtîya yazdanê mazin re” dihê şîrove kirin û ser ziman. Bi vê yekê, Mîtra, dibêje ku ”yazdanê mazin hemû jîyan û gîyan afirandina û dane. Nabê ku yek, mirovekî bikujê.” Li gorî wê jî, dema ku mirovekî yek kuşt, wê ew ji aliyê farîştayên yazdanê mazin ê cezakirinê ve were derxistin li ber yazdanê mazin û wê yazdanê mazin ji wan bipirsê ku ka çima ew kuştin kir. Piştre wê, jê re bêje ku ”tiştekî ku min afirand te kuşt.” Piştî wê re jî, wê cezayê beremberî wê kuştin bi kirina dojehê re wê bê dayîn li wan. Ev jî, weke rastîya ku ti kesek nikarê jê biravê ya. Ji xwe di vê temenê de bawermendên Mîtra bahse ”dadgeha mazin” dikin. Dadgeha mazin, dadgeha ku her zîndîyê ku hatî dûnyê û jîyayî, wê di wê re bi buhur in. Hinek wê bi qancîya xwe û xelatkirinê derbas bibin. Hinekî jî, wê bo gûnehên ku kiirna wê bi cezakirinê derbas bibin. Lê wê herkesek, di wê pêvajoyê re derbas bibe. Bi wê yekê re, tê gotin ku ”dema ku mirov mir, hê ku laşê wî tê şiştin ku were vêşartin, rastî pirsên kirinên xwe tê.”. Bi wê re jî, Mîtrayî, wê dema şiştina laşê mirî, şîrove dikin û bo wê jî gelek gotinên wan ên giring hena. Minaq, dibêjin ku ”ew kevirê ku mirî li ser tê dirêjkirin û piştre tê şiştin, ew ´kevirê arşê´ ya.” Ew kevir, hinek bawermendan, wî weke ”cihê dadgehê pêşî a mazin”jî şîrove dikin. Hinekî jî, dibêjin ku ”wê piştî ku ji ser kevirê arşê hat birin û ew kirina tirbê de, êdî wê derîyek di triba wî de ji wî re vebe. Ew, wê di wî derîyî de bi buhurê. Di dema buhurtinê de, ew devera ku wê bikeviyê de, ewder cihê ku dadgeha mazin a ku herkesek wê di wê de were darizandinê ya.” Bi wê re jî, di temenê ”roja darizandinê” de jî, du şîroveyên ku hevdû temem dikin hatina gotin û ser ziman. Yek, ew a ku ”dema ku mirov mir, wê bê darizandin a.” Ya din jî, ew ´roja darizandinê´ tê dîtin ku ”dema ku ew roj hat, wê hîç mirovên ku li dûnyê dijîn wê hebin. Wê hemû mirovên hemû dem û dewranan wê bi hevdû re di wê roja darizandinê de li ber ”dadgeha mazin a yazdanê mazin bin”, Ev dadgeh, wê gîyane darizêne. Gîyanên ku di vê darizandinê de werina cezakirin, wê bi tememî ji holê biçin û winda bibin.´ Lê ên ku werina xelatkirin jî, wê ´jîyaneka sermed´ bijî hetaheta.

Asil xilasbûn, di wê darizandina duyem de dihê dihê dîtin do Mîtratîyê de. Bi vê yekê, li ser wê jî, pirr tefsîrên wê hena.

Mîtra, di wê dema darizandinê de li cem yazdanê mazin a. Ew, hemû rastî li ber wî dihên dîtin û ser ziman. Mîtra, wê piştî wê darizandinê re

wê keyanîya wî ya ´sermed´ wê were û ava bibe. Êdî Mîtra, wê bijî. Ew dem, demeka ku bawermend, hertimî wê dihênina ser ziman in. Ev dem, dema asil ya xilasbûnê ya.

Mîtra, dema ku em bahse vê demê bikin, ew bawermendên wî, pirr zêde li ser vê yekê disekin in. Bawermendên wî, ji ber vê yekê ew gotina ”Mîtra, li ser taxtê xwe rûniştî bû. Çend ga hatin û ew taxtê wî kişandina bi azmana de bi ber rojê de.” Mîtra, ji ber vê yekê ew ne mirîya. Ew, hertimî dijî. Ew nûha jî, jîyane nemir dijî. Heta wê demê jî, wê vê jîyanê bijî. Ji ber ku ew keyê wê demê xelasbûnê jî ya, ew bi taxtê xwe çûya azmana û li bendî wê demê û rojê ya. ”Ev di baxtê Mîtra de nivîsandîya.”

Mîtra, di vê demê de, ew bilindbûna wî ya li azmana bi taxtê wî re, li ser vê temenê dihê vegotin. Bi wê yekê re, ew dihê ser ziman. Mîtra, ne tenê keyê dûnyê û mirovê ku dimirê ya. Ew keyê gîyane nemir a jî.

Bi vê yekê û rengî Mîtra, rastîyeka li ser rastîyê re ya. Mîtra bi rastî dijî. Heçîyê ku bi rastîya wî bijî, wê birastiyê bijî. Ew, wê birastîya Mîtra bijî. Mîtra, di vê temenê de, bawermendên wî, wî dihênina ser ziman.

Di vê temenê de, Çend xalên Mîtra ku wî hanîna ser ziman ku mirov nekin jî hena. Mîtra dibêje ku ”**zina neke”, ”dîzîtîyê neke.”, ”derewa neka”**, **”mirov nekuja.”, ”tişta haram nexwe.”, ”li dijî dê û bavê xwe ne rabe û di gotina wan de ba.”, ”xîyanetê neka”** û hwd.

Divê ku mirov bibêje ku Mîtra, yazdanê wî serdestê hemû tiştî bû. Wî, ev dihanî ser ziman. Wî, yazdanê xwe ”xwediyê hemû tiştî” didît. Bi vê yekê, êdî wî bahse miirinê dikir.. Wî digot ku ”em jîyaneka bi sparta dijîn.” Em jî, û jîyane me jî spartî yazdanê mazin a.

Bawermendên wî, di parastgehê de di vê temenê de mirov bi zanîn dikirin. Di wê temenê de, aqil dihanîn ser ziman.

Serdestîya pêşketina Mîtra, wê piştî Mîtra jî, zêdetir bibe. Lê em nikarin bibêjin ku hemû oldar bi wî re di yekdengiyê de bûn. Ên ku li dijî wê jî hebûn. Wî Pêxemberên berî xwe ên weke Melekê Tawis dikira temen ji xwe re. Bo vê yekê, êdî wusa zêde dijberî li dijî mazin nedibû. Lê di vê temenê de, piştî Mîtra, di nava oldarên wî û ên ne oldarên wî de, nakokî derdikevin. Di temenê vê herêkirinê de, hinek oldarên wî weke bawermendekî melek tawis bibînin. Hinek jî, wê weke wî bibînin. Li vir, ên ku wî weme bawermendê wî didîtin, êdî li dijî ên bawermendên wî ku wî weke wî didîtin derdiketin. Ji aliyê temen û têgihiştin û xatê ve zêde ti farq tûna bû. Lê di vegotin û rengê herêkiirnê de cudabûn hebû. Oldarên ku li dijî bawerrmendên Mîtra hizrên xwe dihanîn ser ziman, digotin ku

yazdan heya û melekê tawis pêxemberê wî yê ku pêşî wî şandîya. Ên ku piştre werin, wê hemû di şopa wî de bin.”.

Mîtra, hizrên wî, di dema wî de, bandûra wan, ne tenê ji aliyê olî ve dibin. Ji wê zêdetir, ji aliyê hizrî û ´felsefîkî´ û hwd ve jî dibin. Wê bandûra Mîtra ji vî aliyê ve pirr zêde hebe. Di aslê xwe de, ji bandûrê zêdetir, ku em bêjin ji temen ve kifş dike wê rast û di cih de bê.

Ji xwe piştî Mîtra re wê deme zanînê a ´felsefê´ wê hin bi hin bi lez pêş bikeve. Mîtra, temenê wê bi zanîna ku hanîya ser ziman û bawermendên wî bi pergal kirina û di jîyanê de dan rûnştandin, afirandîya. Di wê temenê de, êdî bi temenê re, çendî ku ew dihê kifşkirin û dîtin, êdî ew ewçendî pêşketina bizanîn û felefeyê re jî bibe. Mîtra, ji ber ku li ser temenê zanîn û felsefeyê hanîya ser ziman, êdî ew pêşketin zûtir dibe. Ên ku Mîtra û zanîna wî kifş dikin, hewceyî pê nabînin ku li gorî demê wî şîrove bikin û ji wê sûd bigrin. Ji xwe ew li gorî demê ya. Wî di wê demê de bi asta ku em dikarin bêjin ser ya wê demê re jî ya hanîya ser ziman. Bi vê yekê re, êdî pêşketin bi hizir û zanînê dibêt.

Mîtra, di vê temenê de, divê ku em wî weke destpêkeka giring ya demî bibînin. Ew di vê warê de destpêkeka mazin ya mejûyî û hizrî û têgihiştinî ya. Wî hemdemîya dema xwe hanî ser ziman. Bi wê yekê re, li gorî wê, êdî wê civat çawa were pêşxistin, ew temen afirî. Hizrên Mîtra, di asta civaknasiyê de ji demekê di buhurêne demekê. Di demên berî wî de ´xalkîtî û xalknasî pêşîketîya. Mîtra, astaka li ser wê xalkîtî û xalknasîyê re di temenê civakîtî û civaknasiyê. Civkatîya xalkî pêş dixe. Bi wê re jî, êdî şariştanên ku piştî wî re pêş dikevin, ne şariştanên xalkî na. Şariştanên civatî û civakî na. Dema Mîtannîyan, bi pêşketina wê re jî, di aslê xwe de divê ku em di vê temenê de wê werênina ser ziman. Di vê temenê de, dema Mîtannîyan, demeke teybet ya ku mirov wê ji pirr aliyan ve kifş bike û werêne ser ziman a.

Bawermendên Mîtra, di parastgehê de di aslê xwe de zanînê û ankû bi gotinaka din ´felsefê´ pêş dixin. Her yekê ji wan felsefevanak a. Ku em di vê temenê de, wî fahm nekin, emê nikarin, wî bi tememî fahm bikin. Hizrên ku bi navê Mîtra re piştî wî tên gotin ku ”Mîtrayî, zû bi pêşketina felsefeyî re **´kelîjîn´** dike” jî, divê ku em weke gotinên ku li ser vê temenê hatina gotin fahm bikin û werênina er ziman.

Mîtrayî, di aslê xwe de, rengê olî ê dema felsefe û zanistê pêş dixe. Bi wê re, ev oldarî pêş dikeve. Di vê temenê de oldarî pêş dikeve. Her oldarên wê demê, her yek ji wan weke fîlosofekî dema xwe kar û xabata xwe dike. Bi wê rengî weyn jî leyistîya. Ji xwe, piştî wî re, wê ev rastî hê

baştir were dîtin. Di demên piştî wî re de, ku di nava civate wî kurd=mîtannî de bê û ku dervî wê bê, wê oldar di rengê filosofên demê de derdikevin li pêş. Di vê warê de, piştre, çend ku nîqaşên di rûdidin di nava wê zanîna felsefê de, wê aliyekî giring ê wan nîqaşan li ser wê temenê bê ku ”oldarî û filosofî werê ji hevdû vaqatandin.” Lê wê ne bi tememî ev bibe û ne jî wê ev rewşên ku di derbarê wan de nîqaş dibin wê nîqaşên wan bidawî bibin. Ev rewş, wê di wê xate pêşketina felsefê de, bê temenê gelek ”dijberîyên” ku di nava hevdû de li dijî hevdû diafirin jî. Ev rewş, bi teybetî, wê piştî Mîtannîyan, zêdetirî xwe bidina li der bi dîyarî. Li vir, ev nîqaş du temenan de êdî tên domandin. Yek, ew a ku sînorê destûrên olî were gûharandin. Ya din jî, ku ol û felsefe ji hevdû werina cuda kirin. Bi vê rengê, êdî danûstandinên felsefîkî didom in. Lê bi tememî ti carî dawî li wê nîqaşê jî nayê. Mîtra, ev dem û seremên aqil û zanînê, bi  xwe re dane destpê kirin. Li vir, divê ku em weke destpêkeka giring Mîtra di vir de fahm bikin.

**´Tîr û kavana Mîtra´. ..**

Jîyan, hin bi hin ku têgihiştin di derbarê wê û kirinên mirov de hiş pêş dikeve, êdî ew jî pêş dikeve. Mirov, êdî bi wê re hertimî, di serê xwe de di nava fahmekê de ya. Hişar, weke kirasekê ku li jîyane ku dihê jîyîn ku hatîya kirin a. Di hundurê wê kirasê de, kirinên rût hena. Weke hastûyê di nava goşt de.

Di jîyanê de, çendî ku hiş pêş dikeve, mirov jî hewceyî pêş dibînê ku êdî mirovên kirinên xwe fahm bike. Kirin, nepenîyek, bi wê re heya. Ew jî, divê ku mirov bibêje ku di temenê wê de weke nepenîyekê ku ´metafîzîkê´ re dihê ser ziman a. Li vir, dema ku em li olê jî û pêşketina wê jî dinerin, em dibînin ku di temenê wê de jîyan û heyîn heya. Lê ew bixwe jî weke hişekê û hişarîyeka bi pergal ku bi rengê wê dihê jîyîn a. Em divê ku bibêjin ku tên dema Mîtannîyan, em dibînin ku wa ol bi pergalî û hişarîya wê re çendî pêşketîya û serdest a.

Ew pergalîya serdest, hişarîya wê ya ku heya, em bi rengê zanîna felsefê dibînin. Ev jî, weke aliyekî din ê teybet ku divê ku em wê kifş bikin a. Mitannîyan, civakatîyeka hemdem bi rêz û destûrên wê ên hemdemî re afirandin. Ew jî, piştre, çendî ku hat xwandin, bû temenê pêşketinên nû ên şariştanî di temenê wan de.

Mîtra, dema ku em li wê rengê têgihiştinî û hişarî dinerin, em wî kifş dikin. Ew, bi wê yekê û rengê, rengekî têgihiştinî ê pêşketî ya. Ew di temenê jîyaneka hemdem de dihê û dijî. Rengê pêşketina wî, bi zanînê re

ku em werênina ser ziman, li ser du gotinan a. Yek ji wan gotina ´hiş´ a. Ya din jî, ´hişar´ a. Ev herdû gotin di hin waran de weke ku yek in jî. Lê di temenê fahm kirinê de, dema ku em ´hişar´îyê hildina li dest, em di temenê wê ´hiş´ dibînin. Her wusa di vê temenê de bi rengekî teherî dihên li berçav.

Oldarên Mîtran di dema ku li parastgehê diaxiftin, bi teybetî, hewldana fahm kirina tevger, kirin û gavavêtinên mirov didane nîşandin. Ev reng, hinekî jî, kirina felefe ya. Di vê temenê de, hewldanên fahm kirinê kirina felsefê ya. Di wê demê de, demk kû, ast û rada gihiştîya wê astê ku ew wê bikin. Di wê temenê de, êdî civatê xwe hanîya ser ziman. Di civatan de, mirovên oldar û pîr, hertimî, weke du zaneyn civatî ku zanîn ji wan dihata pirsîn bûn. Ew, pêşengna xweza bûn. Di derbarê hemû tiştî de ji wan dihat pirsin. Ew jî, çend ku ji wan dihat pirsin, wê bersiveka wan heba ku bidan. Didan jî.

Di parastgehê de, li hevdû ku rûniştin dibû, wê jin û mêr bi hevdû re di rex hevdû de rûnihin. Bi wê re jî, wê êdî oldarê sereka ê pêşeng derkeve li pêş. Li herdû tihêlên wî, oldar û pîr hebûn. Wan jî, li gotina wî dinerî, ka wî çi got û wê çi bigota.

Di wê demê de, jinên weke Xûrê ku jîyane xwe di parastgehê de derbas dikin û jîyane xwe dane karê bo yazdanê mazin hebûn. Ew jî, hê keçikên destlênedeyî bûn. Ew, bi wê yekê, nêzî yazdanê mazin dibûn. Wan dikarî, xwe nêzî wî bikin. Ew keçik, wê hertimî, bo yazdanê mazin bijîyan. Wê yazdanê mazin jî, berdêla wê jîyane wan ya hatî dayîn, wê weke berdêla wê xelata herî mazin ji yazdanê mazin bigirtan. Wan, wê ne li bendê ban ku ti kesekî tiştek bida wan. Wê xwe li bendî yazdanê Mazin bihiştan.

Xûrê jî, keçek ji wan keçên bi rûmet dihat dîtin. Ew keçik, weke jinna bi rûmet dihatina dîtin. Ew, rêz û hûrmetek dinava civatê de jî ji wan re hebû. Ew, ji destpêka zaroktîya xwe û ciwanîya diketina parastgehê û heta ku pîr dibûn û piştre ku bimiran jî, wê wusa jîyane xwe bijîyan.

Ew kêlîkek bû. Xûrê bi gelek mirovan re li ber gelek mirovên ku bi hevdû re di rêzê de rûiştî bûn li pêşîya wan bû. Çavên wê li ser dora wê bû. Wê çavdêrî li hewirdora xwe dikir. Weke ku Mîtra li ber wê rûniştî bê. Mîtra, weke ku ew jî li wir rûniştî bê û li wê dinerî. Ew hîs û hêstîyarîya wê hîsê bi wê re hebû. Xûrê, temenekî dirêj bi ser wê re buhurtibû. Di wê demê de ew pîr bûbû.

De ne, mirovên ku pîr dibûn, ku jin jî ba û mêr jî ba, qadrekî wan yê pîrîtîyê hebû. Ew jî, bi wî qadrî êdî dijî. Gelek dem, bi ser wê rasthatina

wê ya Mîtra re buhurtibû. Piştre jî, ew di paraatgehê de mabû. Piştre jî, gelek caran, ew rastî Mîtra hatibû. Wê bi Mîtra re dabû û standibû. Lê ji wê û pê de, di nava wan de ti tişt nebû bû. Lê Mîtra, rêzek û hûrmetek ku mazin dabûbû wê li ber civatê. Wê jî, hinekî din navê wê û heyîna wî mazintir hanîbû û danîbû li berçavan. Ew jî, êdî oldarek bû. Mirovan dihatin ji wê zanîn dipirsin. Êdî divê ku mirov wusa li berçav bigrê. Yekê ku êdî ji wê zanîn dihê pirsin, divê ku mirov weke yeka piçûk û ciwan ne hasibêne. Ew jî, ji xwe ne wilo bû.

Divê ku em vê yekê jî bibêjin. Piştre, piştî wê care ku Mîtra hatibû ber key, hinek carên din jî ew hatibû cem key. BI wî re danûstandin hatibû kirin. Key jî, şîret ji wî girtibûn. Mîtra, bi aqilê xwe yê mazin, gelek gotinên mazin ji wî re kiribûn ku ne hatibûbûna ji bîr kirin.

Mîtra jî, di wê demê de êdî pîr bûbû. Ne dikarî ku êdî weke berê bitevger bê. Berê ku ew li haspê xwe yê sipî sûwar dibû, ew ti kesekî êdî li ber wî ne disekinî. Ew, bi bê re diket pêşbaziyê de.

Mîtra, di wê dema xwe ya ciwan de, êdî zêdetirî li dora wî mirov dicivîyan û li wî dihisandin. Ew bi tenê ne dihat hiştin. Mîtra, ew mazinatîya wî êdî hatibû herê kirin. Bi gotinên wî re, herêkirinek bi navê wî re bû bû. Mîtra jî, di wê rewşê de bû.. Mîtra, gelek hizrên xwe nivîsandibûn û dabûbûn nivîsandin. Oldarên wî jî, gelek gotinên wî jiberkiribûn. Lê wan jî, her gotina ku ji wî digirtin di serê xwe de dihiştin û êdî ji bîr nedikirin.

Lê êdî dem di buhurt. Mîtra gelek sal jînkirin li dûnyê. Gelek kirin ku weke behîtan dihatin ser ziman, wî dane nîşandin. Ew, weke ´şervanekî´ jî dihat dîtin. Ew tîr û kavana wî, hertimî li rex wî bû. Ku ne dikarî bikarbêne jî weke berê, lê dîsa li cem wî bû. Ji cem xwe ne divaqatand. Wî, êdî hemû demên xwe li parastgehê di nava oldar û pîrên li dora xwe de di buhurand. Êdî ew jî, weke pîrekî bû. Lê bi zanîna wî re, ew pirr li ser ên di temenê de re bû. Wî, xwe bi zanebûna xwe re da herê kirin. Ên ku li dijî wî, hê jî hebûn. Lê wî xwe dabû bû herê kiirn bi girseyî.

Mîtra, li demên xwe ên berê jî dihizirî. Car bi car, dema ku ji mirovên li dora xwe re diaxift, bi gotinên kin, bahse demên xwe ên buhurî jî dikir. Wî, temenekî dirêj jîn kiribû. Bi vê yekê, dema ku diket axiftinê, gelek gotinên ku wî dikarî bigota di serê wî de hebûn. Di wê demê de Xûrê li berçavên wî bû. Demekê li wê nerî, demên berê hanîn berçavên xwe. Ew dema ku ew rastî hevdû hatibûn hanî berbîra xwe. Di serê xwe de buhurand. Ew dem û ev dem, pirr ji hevdû dûr bûn. Gelek dem di navberê de buhurtibû. D wê demê de, di dema ku Mîtra di hizirî de, Xûrê

bale wê çû ser Mîtra. Weke ku hîs bike ku Mîtra li ser wan demên berê dihizirê û ew di hişê wî de ya li nava çavên Mîtra nerî awirên xwe ji wî û ji ser wî nevaqatand. Weke qadarekê, wusa lê nerî. Piştre tiştek bû û hey wê çû ser dora wê. Bi wê re, êdî awirên wî ji ser wî qatîyan. Lê Xûrê, di wê demê de ew jî, weke ku di serê xwe de bihizir bû. Ew jî, hineka ku hem kermenda parastgehê bû û hem jî keça hebedê bû. Hebedê dayîka wan hemûyan bû.

Mîtra, heta ku bi demê re hatibû wê demê pirr zêde buhurandibû. Êdî ew di nava civatê de bûya rayeka mazin ya bi zanebûna xwe re. Mîtra, hişmendîya wî pirr zêde hebû. Wî, bi aqilê xwe, ji ast û rada dema xwe buhurî bû.

Di wê demê de, Mîtra, weke kalekî mazin û civatê li pêşîya mirovan rûniştî bû. Ew, êdî yekî wusa bû. Mîtra, di hizirê. Di wê demê de, dema ku diaxift, weke ku di ber axiftina xwe bixwe de jî di serê xwe de dihizirî. Pirr dihizirî. Bi teybetî, di wan demên xwe yên dawiyê de pirr dihizirî.

Di wê demê de, Mîtra, piştî ku weke demekê di nava mirovên li dora xwe de dimêne û piştre, êdî weke ku hinekî êdî piştre civate wan jî, ji hevdû belav dibe. Lê Mîtra li Parastgehê dimêne. Mîtra, di jîyane xwe de, êdî hertimî li wir dimêne. Ew der, weke male wî dibe. Ew qasre wî ya ku hebû, ewqas dewlemendîya ku hebû, hemû wî belav kiribû. Nûha jî, tenê bi serê xwe mabû. Wî dewlemendîya xwe hemû belavkiribû li ên ku pêwîstîya wan pê hebû. Lê wî, cihaneka mazin weke dewlemendîyekê bidest xistibû. Ew, bûbû xwediyê dûnyê û cihane ku di wê de dijî.

Mîtra, di tefsîrên di derbarê wî de ku bawermendên wî li parastgehê bi naqşî çê kirina, di derbarê bûyîna Mîtra de, dide nîşandin ku dema ku Mîtra bûya û bûyîna wî hatîya bihîstin, her der û dever bi rohnî bûya. Stêrkên azmana rohniya wan geş bûya li dûnyê ketîya. Heyv, weke rojê di şevê de bi rohnî bûya û şawq daye. Mirovên ku şîvan jî, di wê demê de li çolê **pêtal** (xetîre) pêxistina û hildane jor û hanîna jêr. Bi wê rengê, weke ku li ber yazdanê mazin berg bikin, ketina rewşekê de bo pîrozîya bûyîna Mîtra. Mîtra, weke Şîvanekî jî dihat tefsîr kirin. Ew, bo şîvanan şîvan, bo şervanan şervan, bo zarokan zarok bû. Ew, di her beş û astê de tefsîr û wateya wî bûya di jîyanê de û pêşketîya.

Di bergkirina Mîtrayîyan de, dema rojhilatê û dema rojava a rojê giring bûn. Di van deman berg ji yazdanê mazin re hatina kiirn. Di nêvî heyvê de yanî di şazdeh(16)ê mehê de hertimî wê piştî nîvro bidest bergê bikiran û heta ku roj biçûya ava, wê ew bergkirin bidoma. Ev di nava

bawemendên Mîtrayî de wê piştre weke demekê pirr bi rêkûpêk were kirin û bê rûniştandin di jîyanê de bi pergalî. Ji ber çi nava rojê yanî piştî nîvro dihê bijartin? Ber ku, di wê demê roj pirr germa û li ser serê mirov a. Di wê dema ku roj bi tamî li ser serê mirov a dihê bijartin. Bi wê re dihê bijartin ku yazdanê mazin di wê demê bi tamî li ser serê wan a û bergkirin û axiftina wan dibînê. Bi vê yekê, ew êdî ji wî re wê bergê di wê demê de dikin.

Ew dema ku Mîtra lê rûniştî bû, dîsa ev dem bû. Ew dema ku roj bi tamî li ser serê mirov bû û nava rojê bû. Yanî, di wê dema ´firavînê´ bû.

Di dema rojê de, wê mirov, di bin ´tava rojê´ gerekê bikin. Piştre wê herina şikeftê. Di vê demê de çûyina şikeştê wateyên wê ên giring hena ku divê ku mirov wan bi teybetî werêne ser ziman. Di wê demê de jî, Mîtra, tîr û kavana wî bi wî re li piştê ya. Di wê dema çûyinê de, yanê di binê wê tava rojê de gerînê de, berê herkesekî li rojê û azmana ya. Lê weke ku çawa ku Mîtannîyan çêkiribûn, wê weke derîyên ji kevir ku weke li devê qasr û kirmana hena dihên çêkiirn û di bin wan derîyên bilind û ku ji kevirên stûr hatîya çêkirin ve di buhur in. Ev jî, wateya wê, ew a ku weke ku di devê derîyê rastiyê ve di buhur in dihê dîtin û hasibandin. Ew derîyên ku weke hêtekî ji du stûnan bilind bûya û li ser re weke ku weke stûnakî bi dirêjahî hatîya çê kirin re dihê buhurtin. Li ser wê hêtê jî, li ser kevîya wê bilind çêkiirna şêr û mar jî, hinekî bi wê pîrozîya wan ve girêdayî ya. Her wusa, heman tiştî divê ku mirov bo ga´ jî bibêje. Mîtra, li vir divê ku mirov bibêje ku ew ”çîyayê kurda” ku li dora afrîn û hwd, jî hinekî giringîya wê bo wî heya. Li wir jî, di wê demê de, Mîtra li wir hin tefsîrên wî li wir di wê ´çîyayê kurda´ de hatîna çêkiirn. Lê ev çêkirin û tefsîr, di temenê nepenî, pîrozî û her wusa hişmmendîya mîtolojîkî de hatîya çê kirin**. Çîyayê kurda**, giringîya wê di çanda Mîtra de, pirr giringa ku divê ku mirov pirr zêde li ser bisekinê ya.

Mîtra, daristanên ku bahse wê dihê kirin ku ew çûya nava wê bi çend mrovên li dora xwe re, ew dever a. Ew der, di wê demê de bidaristanên gûrr û mazin bûn. Herêmên wê ew çemên navîn ku di wê de diharikîn, temenê şînahî, xweşîkatî û jîyaneka pirr geş bûn.

Mîtra, di dema ku bawermendên wî, wî hanîna ser ziman, ku di destekê wî de gilova ji êgir û sor heya û ku di destê wî yê din de jî, hemû nirxên ku weke pîrozî na hatina bicih kirin. Di wê destê wî de, tefsîra ga, tûpişkê nêvî mirov û nêvî tûpişk, mar, masîyê ku ew bi wê re axiftîya û tê gotin ku ”nepenîya gerdûnê ji wê fêrbûya”, ku weke dagera avê ew teşta

tişî av(li vir,, ew ava ku bahse wê dihê kirin ku avaka pîroza ku dihê bawer kirin ku ji bihûştê di harikê ya), û hwd, weke van hemû dagerên pîroz ên ku hena û bi nirxin di destê Mîtra de hatina berhevkirin. Bi wê re jî, ew dema ku di destê wî de hatina berhevkirin, êdî weke ku ew êdî hem li ser hemûyan re ya û hemû xwediyê wan nirx û pîrozîyan hemûyan a.. ..

Bi wê re jî, êdî li gorî bawerîyê ew her çar ”bayên pîroz” ku dihên di wê demê de dirabin û li ber Mîtra rêzîya xwe dihênina ser ziman. Bi wê re her bayek ji wan bi rengekî û nirxekê hatîya şîrove kirin. Mîtra, bi wê yekê re weke ku li er taxtê gerdûnê rûniştî ku hemû tişt ji wî dihê pirsîn dihê tefsîr kirin. Mîtra, bi vê rengê, nêzî yazdanê wî dihê kirin.

Bi gotinên Mîtra re tefsîrên ku bawermendên wî çê kiirn ku mirov li wan dinerê, mirov dibîne ku weke çend ku bi rojê şîrovekirin û tefsîrkirin kirina jî, lê gihiştina wê têgihiştin ku ”hêzek” heya ku li wê jî hikim dike. Mîtra jî, bi wê yekê hebûna yazdanê xwe hanîya ser ziman. Piştre jî, êdî di demên piştre de, wê roj di tefsîran de bê weke dagera wê ”hêza” ku hikim li wê dike wê bibînin û werênina ser ziman. Di wê temenê de gotina ”gerdûnê” salixkirina. Ketina nava salixkirina wê de. Roj weke navika wê hanîna ser ziman. Bi wê re di rex wê de Mîtra bi keywanê, tîrê re şîroveya wî hanîna ser ziman. Lê ew şîrove ya bawermendên Mîtra wê piştre ji şîrove mîtolojkî ên bi navê ”tîtan” ku di mîtolojiyên pişte dihên ser ziman jî bê bingeh. Ev, rewşna teybet in ku divê ku mirov wê bi teybetî hilde li dest. Li vir, Bawermendên Mîtra, hewldane ku kozmosa Mîtra kifş bikin. Di vê temenê de ketina nava kar û hizirkirinekê de. Li gorî, hêyerarşîya Mîtrayî, gerdûn ya, di hundurê gerdûnê de fezza heya. Di hundurê fezeyê dûnya heya.. Di hundurê dûnyayan de jî jîyan heya. Bi wê yekê, di asta Bilind de yazdanê mazin hikim dike. Piştî wî re, ew pergale xwe diafirêne û bi wê re bi fermanên xwe re bi rê ve dibe. Gerdûn, pêşî, ´xal´ek hebû. Piştre ji wê gerdûnê destpêkir. Piştre feza afirî û pêşket. Pişte dûnya li wê afirîn. Piştre jîyan li wan bicih bû. Di vê temenê de, di nava wê gerdûnê de hewldanê kifşkirina ihê taxtê Mîtra, bi armanca derxistina wî ya li ser dûnyayan re ya. Bi wê re, cihê wî li rex ya yazdanê mazin dihê çê kirin. Mîtra, bi vê yekê, weke pergalekê bi gerdûnê re, di temenê stêrzanî û hwd re hatîya hanîn ser ziman. Di vê temenê de hewldanên fahm kirina xwezayê, jîyanê, destpêka jîyanê, gerdûn û rastîya wê, dûnyayên dervî me û jîyanên di wan de ku hena û hwd, di vê temenê de hatîya hizirîn û hizir hatina pêşxistin. Yazdan, weke ´hêzek´ ji afirandina wê re ti sînor tûna ya. Ku dikarê hertiştî çêbike û biafirêne û xwe bigihêne her derî û deverî. Di gerdûnê de û her wusa di

hemû demên wê de, çi heya û bûya, dikarê xwe bigihêne wê. Bi wê re jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotina ”xwe gihandinê ya di hundurê demê” di temenê ”tişta ku afirî û heyî” de dihê ser ziman. Yanî li ser heyînekê ew şîrove dihê kirin. Dem, bo yazdan na buhurê. Lê bo jîyane û mirov û hemû zîndîyên di jîyanê de di buhurê. Di vê temenê de, yazdan û heyîna wî a li dervî demê herêkirina wê ya. Bi wê derxistina Mîtra li Keywanê bi taxtê wî re, hewldane derxistina wî ya dervî demê jî ya.

**Ga, piştî ku hilkişî azmana li gelawêjê bicih dibê. ..**

**Dema ku ga tê boraqkirin jî, genim dikina gûhê wî de ku ji gûhê ga birijihê ardê û li ardê şîn bibe û bibe temenê şînbûnê.** Ku em bahse Mîtra bikin, wê di cih de gotina ´ga´ were berbîra me. Ev bûya weke navê wî. Ga´ pîroz a. Ga´ bi hêz û zaxm û ´gir´a. Gir´bûna ga´, ji gelek tiştî re bûya mînaq. Mînaq, dema ku bahse ´Gilgamêş´ tê kirin, ew tê şibandin li gayekê. Tê gotin ku ”weke gayekê gir a´. Ji ber vê yekê, ji wî re tê gotin ku ”girga” û ankû ”girgamêş” Bi vê yekê, ev şibandin, weke aliyekî giringa ku divê ku mirov vê yekê bi teybetî bêne ser ziman.

`girgamêş´, weke gayekê ´gir´ a. Bi wê girbûna xwe re bi hêz û zaxm a. Dikarê hertiştî bike. Heta roja me jî di nava kurdan de, gotinaka heya. Tê gotin ku ”weke gayekê gir û zaxma, dikarê bi serê ga bigrê û weke Mîtra wê hilêne û li ardê bixe.” Ji vê gotinê dihê fahm kirin ku Mîtra, weke ku wî ga bi wê girbûn û mazinbûna xwe ve hilgirtibê dihê fahm kirin. Lê ga, wilqasî gir û mazin û gir a, mirovek nikarê wê bi wê hêza xwe ya ku heya hilbigrê û ji ardê hilde.

Dema ku bahse Mîtra dihê kirin, ev gotin, dûbare dihê ser ziman di nava kurdan de. ”Mîtra, gayê xwe li mal digirt. Hemû tişt ji wî re dikir. Weke yazdanekê lê meyîzend. Lê rojekê ku derî vekirî bû û ga derfet dît, êdî ga ji malê derket û ravî. Piştî ku Mîtra hat û dît ku wa gayê wî ne li cihê xwe ya pirr bi mereq bû û ket pay dîtina gayê xwe de. Li gelek zevî û deveran gerîya. Piştre li ber avekê li deverekê li devereka şîn ew gayê xwe dibînê. Piştre Mîtra li wir gayê xwe digirê û wî dihêne malê û li wir wî digûrêne ji yazdanê mazin re.” Lê berî vê gûrandin jî, dihê gotin ku ”mîtra li ser wê rewşê hizirî û pirr hizirîya. Di ancama hizirkirina xwe de gihiştîya wê têgihiştin û ancamê ku ”yazdanaka heya ku min jî û ew jî afirandîya” û ”ew afirînerê hemû tiştî ya” û ”wî her kes û gerdûn afirandî ya.” Bi wê re jî, Mîtra, ew yazdanê xwe yê ku di serê xwe de kifşkirî, ji wî re wî gayê xwe dike boraq. Lê Mîtra, di farqê pîrozîya ga de ya. Bo vê yekê Mîtra, tê gotin ku wî dengê yazdanê xwe kirîya û yazdanê wî ji wî

re gotîya ku ”Mîtra, zaroyê min, ezê tişta ku min dayî wî gayî bidina te.” Ji aliyê bawermendên vî ve, ev tişta ku tê gotin hatîya li Mîtra di wê demê de, ew pîrozîya jî ya. Bi vê yekê re, Bawermendên Mîtra, ew pîrozî çiqasî mazin a, bi navê ga re hertimî hewldane ku wê tefsîr bikin. Ga, li gelawêjê bicih kirina. Mîtra li Keywanê bicih kirina. Ji xwe yazdanê Mazin jî, roj weke ya wî ya. Ew, weke dagera wî jî dihê dîtin û ser ziman.

Mîtra, di dema xwe de, gihiştîya wê hizrê ku ”hêzek heya li ser hemû tiştî re ya.” Heta ku bawermendên Mîtra dibêjin ku ew li ser rojê re jî ya. Piştre, di vê temenê de jî şîroveyên wan bûna. Bi vê yekê, êdî roj kirina dager ji wê ´hêzê´ re. Ew hêz jî, bi navê ”yazdanê mazin” hatîya salixkirin û ser ziman.

Mîtra, di xate Melekê Tawis de ya. Di rêya wî de ya. Heta ku ew sax a û li jîyanê ya û li dûnyê ya, ew di rêya wî de dimêşê û rêya wî pêşnîyar dike û wî weke yê mazin dihêne ser ziman. Melekê Tawis jî, tayrê tawis, ji wî re û ji kûdreta wî re bûya dager. Mîtannîyan, melekê Tawis, pirr mazin bi tefsîrkirinên xwe re hanîna ser ziman û li jîyanê serdest kirina. Ew, weke «pêşengê jîyanê» û «serkêşê hemû tiştî» hanîna ser ziman. Bi navê Melekê tawis re, di dema Mîtannîyan de, pergale hizrî, têgihiştinî û bawerî pirr zêde pêşketîya û di jîyanê de bi serdestî rûniştî ya.

Ku em hewl bidin ku awayê bawerîya dema Mîtannîyan werênina ser ziman, divê ku em Melekê tawis û çand û kevneşopîya wî, weke temen ji wê re û bi wê re werênina ser ziman. Lê wekî din, emê nikaribin, bi başî wê demê jî fahm bikin. Di wê demê de, navê «laleş»ê serdest a li wê demê e. Laleş, weke sazîyaka civatî ya bawerî û olî, rûniştî heya. Mîtra bixwe jî, di wir de xwe dihêne ser ziman.

Mîtra, tiştekî dike. Ew, demên berî xwe hemûyan bi hemû pêşketina wan re dibînî. Hemû xwandîya. Li ser wê re jî, êdî ew şîroveyeka xwe giştî pêş dixe. Dihêne ser ziman. Ew bi wê yekê re, aqil û zanînê bi hevdû re derdixe li pêş. Teybetmendiya Mîtra, hinekî jî bi vê yekê re dihê dîtin û ser ziman. Wî, oldarên xwe bi vê yekê, bi aqil şiştîya û mejiyê wan tişî kirîya. Mîtra, li parastgehê dema ku dirûnihê û ji wan re dihêne ser ziman, dirêj diaxivê û dihêne ser ziman. Her gotina ku wî hanîya ser ziman jî, ne hatîya jibîrkiirn û hatîya qaydkirin. Bi vê yekê re Mîtra, heta ku tê wê dema xwe ya pîrbûnê û ku dibe «kal» êdî ew di jîyanê de dibe xwediyê gelek hizrên ku wî hanîna ser ziman.

Mîtra, ne di temenê dijberîya kevneşopîya berî xwe de hat û hanî ser ziman. Wî, di çerçoveya wê de hanî ser ziman û bi wê hanîna xwe ya li

ser ziman re, di wê de jê gûharandin û pêşveçûn bi wê re daye çê kirin. Li gorî pêşveçûna bi aqil, êdî hemû bi zanîn kirîya û danîya ber mirovan ku bixwênin û fahm bikin û bibînin.

Mîtra, ev rastîya wî ya. Mîtra, bi vê yekê, ew, weke mirovê ku bi navê ”yazdanê mazin” ku wî hemû nirx û pîrozî kirîya yek. Bi wê yekbûnê re êdî serdestîyê dide çê kirin. Ev rewşa Mîtra û şîrove û hanînên wî ên ser ziman, wê dengê û hizrên wî bigihêne gelek deverên din û li wan deveran jî serdest bike. Mîtra, piştre, wê bi navê Yazdanê xwe, wê serdestî hemû cihanê û dûnyê bibe..

Bi vê yekê re bawermendên wî, bo ku wî bi taxtê wî re li ser wê mazina wî ya li dûnyê giştî werênina ser ziman, ew ji dûnyê derxistina û birina fezeyê û di wê de li keywanê bicihkirina. Û Ew keywan bi navê wî jî hanîna ser ziman.

Mîtra, di dema ku ew di parastgehê de, hingî gelek mirovên ku li parastgehê hebûna li dora wî bûna kom. Wî, xwe li parastgehê daye herê kirin. Wî, xwe daye pejirendin.

De ne, weke aliyekî giring ku divê ku mirov bibêje ku xwe dane herêkirin di nava wê kevneşopîyê de pirr giring dibe. Dema ku xwe da herê kirin, êdî wê karibê mazin bibe di nava civatê de. Xwe di nava wê kevneşopîyê de dayîna herêkirinê du wateyên we ên giring hena. Yek, ji aliyê olî ve ya û ya din jî ji aliyê civatî û hwd ve ya. Hingî, bi wê herêkirinê, wê bi herdû aliyan ve, wê karivê êdî xwe bêne ser ziman. Civatîtîya Mîtra, bi vê yekê û herêkirinê êdî pêş dikeve. Mîtra, xwe weke mirovê wê civatê û xate wê ya olî dihêne ser ziman. Gotina wê ya yazdanê mazin ji nû ve şîrove dike û derdixe asta herî mazin li ser mirovatiyê hemûyî re û bi wê dide herê kirin.

Di wê temenê de, dema wî û dema Mîtannîyan, serdestîya wê di dema wê de herî zêde bi pêşketinên wê hizrî û olî û hwd re, dihê û serdestîyeka mazin dijî.Piştî Mîtannîyan jî, wê ew aliyê wan bijî. Wê bi pêşketinên piştre ên hizrî, civatî û olî û hwd re bijî. Çerçoveya hizrî û zanînî ya Mîtra, divê çerçoveyê de giring ku e fahm bikin. Mîtra, rengê olê bi zanînê hanîya ser ziman. Gotinên civatî, ên weke ”aqil, bû ku mirov rêya xwe bi wê re bibîne afirîya”, bi kevneşopî wateyeka wan heya. Ew wate, di temenê olî de jî hatîya ser ziman. Mîtra, heta roja me jî, ku weke gotinaka pirr kevn a van deman a, di nava kurdan de dihê gotin ku ”xwûdê aqil, çê kir bo ku mirov nekeve rêya şaş de.” ”xwûdê, aqil çê kir, bo ku mirov şaşîyên berê ku hatina kirin dûbare neke.” Bi vê yekê, gelek gotinên bi aqil ve girêdayî ku dihên gotin hena. Ev gotin,

hemû jî, î ro weke gotinên xalkê dijîn. Lê ev gotin, gotinên vê demê na û divê ku mirov wan bi vê demê ve girêdayî hilde li dest û fahm bike. Wê hingî, baştir û çêtir werina fahm kirin jî.

Di çorçeveyê de, ku ga dihê kirin, bi heman rengî bi pîrozî û mazinahî û girbûna wê re dihê ser ziman. Di nava Mîtrayîyan de dihat bawerkirin ku herdû stirhên ga ku hena, dûnya li ser wan di ahangekê de ya. Dema ku ga stirhên xwe bihajêne, wê dûnya jî bihajê.

Mîtra, di parastgeha wî de, hertimî, avaka ku ji binî ve diharikê heya. Ewav, tefsîra wê ew a ku dema ku Mîtra tîr ji kavana xwe avêt û li kevir da û kevir ji nêvî ve qalişî û bû duqat, êdî ji wê av herîkiya. Di wê demê de mirovên ku bi wî re bûn û çavdêrî ji wê behîta wî re kirin, hingî tîbûbûn, dema ku av diharikê diçin û destê xwe didina ber wê avê. Hinek jî, herdû destê xwe dikina yek û bi hevdû re kûlma destê xwe kûr çêdikin weke ´zerika avê´ û wê kûma xwe ya ku kirina weke zerika avê, tişî av dikin û divexwûn. Bi vê yekê re, ”di nava mîtrayîyan de, bi kûlm vexwertina avê, hinekî xêra wê heya.”

Di parastgeha Mîtra de, ew ave ku diharikê dayimî ya. Wê her mirovê ku di wê de berg bike, wê çend dilopan ji wê avê vexwe û bi xwe de jî bike. Ev av, weke ku piştî Mîtra ku tê Zerdeşt ku wê bi nav dike, ”ava kansavê” ya. Ev ava ku ji wî kevirî bidest herikînê kir, bo wê jî gelek tefsîr hena. Hinek bawerîyan gotîya ku ”di wê demê de bo ku gelek mirovên bi Mîtra tîbûbûn, êdî yazdanê mazin ji wir av derxist.” Hinek jî, dibêjin ku ”ew av, di wê demê de yazdanê mazin ji bihûştê a herikandin li dûnyê û ew ava yekane ya ku tenê ji bihûştê di harikê li dûnyê.” Ev kevneşopîya û vegotina derbarê avê de, vegotin û kevneşopîya Melekê Tawis a.

Mîtra bixwe jî, li ser wê avê, biqasî ku mirov ji tefsîrên bawermendên wî fahm bike axiftîya û hizirna xwe hanîna ser ziman. Bi wê yekê re, êdî wan jî bi wan hizran ew hanîya ser ziman û bi wate kirîya.

Di wê demê de, Mtra dema ku li Parastgehê bû, Xûrê jî li wir bû û kar û barê parastgehê dikir. Di nava wê de diçû û dihat. Kiresekî sipî ku li ber lingê wê disekinî û xatên laşê wê di wê de kifş dibûn li wê bû. Xûrê, jineka jêhatî, xweşîk û sipahî bû. Te digot ku qay yazdanê mazin xweşîkatîyek bi teybetî dabûbûyêde. Wusa ew xweşîk bû. Mîtra jî, di wê demê de li parastgehê bû û di cihê xwe de rûniştî bû û çend mirovên din jî li dora wî hebûn. Lê ew êdî kal bû. Di nava salan de çûbû bû. Êdî, ew pîr û kalê civatê jî bû.

Bi vê yekê, di wê demê de, di dema ku Mîtra li wir rûniştî bû, weke ku berg were kirn li hevdû rûniştibûbûn û bi hevdû re diaxiftin. Jin jî û mêr jî bi hevdû re bûn. Ew cudabûn di nava wan de nebû. Jin, hemû keçikên yazdana dayika hebedê bûn. Wê li wan dinerî û ew diparast.

Dayika hebedê, li parastgehê mabû û li wir heta dawîya jîyane xwe jîya bû. Ew keçik hatibû û keçik çûbû.

Xûrê bixwe jî, di rêya dayik hebedê de bû. Ew(dayika hebedê) dayika hemû zarok, jin û mirovan bû. Xûrê jî, di rêya wê de dimeşî.

De ne, di kevneşopîya Melekê Tawisîyan de, hertimî jina ku dayimî li parastgehê(laleşê) dima de keçik bû û wê heta dawîya jîyane xwe wê wusa ba. Wê hemû civatê birêz û hûrmeta kiriba û wê wê jî, ji xwe ”nanê pîroz” gez bi gez li wan belav bikira û bide wan.” Mîtra jî, ev kevneşopî di parastgehê de di nava bawermendên wî de dijî.

Mîtra, ji vê kevneşopî zêdetir tiştek di nava bawermendên xwe de bicih kiribû. Ew jî, ew bû ku mêr jî û jin jî, ên ku wê di parastgehê de ku kar dikin weke bawermend, wê bakir û bakîra ban. Ev ji bo herdû zayandan jî Mîtra rast dîtibû. Ên ku wê xizmeta yazdanê mazin bikiran, li gorî divîya ku wusa ban. Bi vê yekê re, êdî ew jî, wusa bûn. ´Metran´ên Mîtrayî, bi vê yekê, mirovna ku bi tememê bi jîyane xwe re ku xwe dikirina xizmeta karê bo yazdanê mazin de. Her wusa, jin jî û mêr jî, wusa bûn.

Mîtra ya rast û ya ne rast çi bû hanîbû ser ziman. Ji yazdanê ku wê hertimî qanciyê bi wan bike re tiştên baş dikirin boraq. Genim û xwarina çêkirî ku dihanîn dibû. Genim, wate wê bereketa. Genim, hinekî jî pîroz dihê dîtin. Ev aliyê wê jî heya. Her wusa hertimî xwarina çêkirî hanîna parastgehê jî, aliyekî din ê teybet bû. Ev kevneşopî, wê piştre bi gelek rengê wê re xwe bide domandin. Pêşî, xwarina ku dihat hanîn ne dihat hiştin.

Mîtrayîyan, di parastgehê de jîyanek bi hemû aliyên wê re pirr avakirin, bi hemû aliyê wê re û rengê wê re hanîn ser ziman. Mîtra, wusa ji wan xwestibû.

Di roja cejna yazdanê mazin de, wê li parastgehê sofra were danîn û wê xwarin were hanîn li ser wê sofrê. Ew xwarin, hinekî jî, weke xwarina pîroz jî dihê dîtin. Ên ku li ser wê sofrê rûniştin, wê li ser sofraya yazdanê mazin rûniştiban. Di gelek tefsîrên ku Mîtrayîyan çêkirina de, Mîtra bi yazdanê mazin re ku li ser wê sofrê pêşî xwarinê dixwûn dihên naqşkirin. Ew xwarin, bi wê yekê, weke peymana wan ya bi hevdû re dihê dîtin. Bi wê yekê re, dema ku mirov li ser wê sofrê rûnişt, wê ew bi

wê xwarinê re peymanê di naqabîna xwe û yazdanê mazin û mîtra de bide çê kirin. Bo vê yekê, ev xwarina wê rojê giringa. Weke ”xwarinaka pîroz” hatîya tefsîrkirin. Her wusa, piştî ku Mîtra kevneşopîya gûrandina ga da destpêkirin, êdî piştî ku ga dihat gûrandin, wê ew goştê wî bihat kirin xwarin û li wê sofrê bihata danîn.

Mîtra bi vê yekê divê ku mirov bibêje ku wî kevneşopîyeka nû bi wê rengê dabû bû destpêkirin. Mîtra, kevneşopîya Melekê Tawis gihand astaka wê ya din bi demê re.

Di jîyane civatî a Mîtannîyan de, rewşa ku pêşketî, wê piştre xwe bidomêne. Mîtra, di sadsalên dawîya jîyane Mîtannîyan de tê. Lê Mîtra, demên dawiyê dike demna zêr bo wê. Bi wê re jî, pêşketinên mazin dide çêkirin. Mîtra, di vê temenê de ku em bahse wî bikin, divê ku em mazin bahse wî bikin. Ji ber ku bi rastî jî mazin a. Rastîya Mîtra bi pêşketinên hizrî ku wî dane çêkirin re, hê jî bi tememî û li gorî mazinatî û mejûya xwe baş ne hatîya kifşkirin û ser ziman. Bi teybetî, divê ku mirov Mîtra ne li gorî nêzîkatîyekê hilde li dest û werêne ser ziman. Divê ku mirov wî, li gorî wî û pêşketina wî bi nêzîkatîya wî re pêşî fahm bike û werêne ser ziman. Bi wê re jî, êdî emê karibin bibêjin ku em di fahm kirina wî de destpêkeka baş bikin. Mîtra bi vê yekê û rengî, wê hingî baştir û çêtir were dîtin û fahm kirin. Mîtra, em bi olarîya wî re, her wusa bi zanîna wî re wî weke zaneyekî mazin jî werêna ser ziman. Ji ber ku ew wusa ya. Bi teybetî, rengê felsefeya ku em Mîtra li gorî wê werênina ser ziman felsefeya aqil û zanînê a bi vac a. Di temenê serdestîya têgihiştin felsefeya vacê de, divê ku em li wî bihizir in û wî werênina ser ziman. Wê hingî, ew ji aliyekî xwe ve birastî were ser ziman. Di temenê wê gûrandina ga ya ji aliyê Mîtra bixwe de jî, ew felsefeya wî ya vacê bi nêzîkatîya wî ya olî re ku hatî hûnandin heya. Wî, di serê xwe de pêşî bi vace xwe gihand têgihiştina yazdanê mazin û têgihişt ku li ser yazdanê mazin re ti hêz û kûdret tûna ya. Bi vê yekê, wî ga, êdî ji wê kûdreta yazdanê mazin re kirîya boraq. Bi vê yekê, êdî wî mazinatî, serdestî, hêz, kûdret û yekîtîya yazdanê mazin hanîya ser ziman. Di vê temenê de, têkiiyeka hizrî, têgihiştinî û felsefîkî bi aliyê vacî ve di temenê wê gûrandina wî ya ga de heya. Dema ku em biteybetî li ser nêzîkatîya wî dihizirin û bi rengê hizirkirinê kifşkirina wî ya gotina ´yazdanê mazin´ di serê xwe de ku em lê dinerin, ji wê em vê yekê bi hesanî kifş dikin.

**”Mîtrayî, di 25´ê berfanbarê de ´sersalê´ê pîroz dikin.”**

Mîtra, di dawîya jîyane wî de tefsîra ku di derbarê wî de dihê kirin, di wê temenê de ya ku ”ew li ser taxtê xwe rûniştîya û gayên ku taxtê wî û wî dikişênina bi ber rojê bi azmana ve” dihê ser ziman. Di vê temenê de Mîtra, bi taxtê wî re dihê birin li azmana û li rex ê yazdanê mazin de dihê danîn. Mîtra, bi vê yekê, tefsîreka wî ya ku weke ya yazdanê mazin a, dihê kirin. Ew ji dûnyê dihê bilind kirin li azmana. Li Azmana cihê yazdanê mazin heya. Mîtra, dihê wir. Wî li wir bê. Heta wê roja ku weke ku di baxtê wî de dinivîsandîya ku roja darizandina Mazin hat, wê ew jî bi taxtê xwe wê li wir bê. Lê Mîtra, wê piştî sê-hezar salan, wê ew carek din were dûnyê. Di wê dema ku ew hat dûnyê de, wê êdî li dûnyê tekoşînaka mazin li dijî xirabî û ne başîyê bike û wê bi serkeve. Piştre wê 40 salî dûnya di nava aramî û aşîtîyê de bê. Wê di nava wê aramî û aşîtîyê de gûr û meh bi hevdû re biçêrin, lê wê zirerê nedina hevdû. ..

Mîtra, di wê temenê de tefsîra wî hatîya kirin. Mîtra, weke keyê demê û serdema wê dihê dîtin.

Mîtra, dema ku em bahse wî bikin, divê ku em bibêjin ku Mîtra rafaransên dema nû ên bi aqil dihêne ser ziman. Di bawerîya li berfiratê de ku di bawerîya Melekê Tawis de jî heya û dihê ser ziman, dihê gotin ku ”hertimî, wê di serdemekê de pêxemberek were û rê şanî mirovatiyê bide. Her yekê ku tê jî, kar û erka wî, ji aliyê yazdanê mazin ve hatîya kifşkiirn.” Ev rengê, vegotinê piştre ji aliyê gelek oldaran ve bo Mîtra jî hatîya hanîn ser ziman. Hatîya gotin ku ”mîtra, weke pêxemberekî hatîya şandin li dûnyê”. Lê Mîtra, teybetmendîya wî ew a ku ew di vê dûnya ku ”her mirov laşê wî dimrê û gîyane wî diçê azmana û axîretê”, lê yazdanê mazin Mîtra ji vê yekê ´jêbaxş´ hatîya kirin. Yanî, ew namirê. Ew dema ku ji dûnyê herê jî, wê nemirê. ”Ew, bi taxtê wî re hilkişîya ya azmana û li wir nûha li ser taxtê xwe rûnîştîya.”

Di vê temenê de, di tefsîran de, aliyekî din ê ku divê ku mirov biteybetî bahse wê bike jî ew a ku taxtê wî ji aliyê ga ve dihê kişandin bi ber rojê ve li azmana. Ev rewş, bi gelek şêwayên wê ji aliyê bawermendên wî ve hatîya naqşkirin jî. Her wusa, bi naqşkirinê hatîya danîn li berçavan. Bi wê yekê, hatîya xwestin ku vê rastîya Mîtra dênina li berçav. Mîtra, bi wî re jî, kevneşopîya ”pîrozkirina sersalê” dihê domandin. Weke rojbûna Mîtra, her sal di 25 **berfanbarê de dihê pîroz kirin. Bi wê yekê re, êdî ew dihê bîrhanîn. Di wê rojê de berg dihên kirin. Bîrhanîn dihê kirin. Û her wusa, di wê rojê de çûyina mêhvandarîya li hevdû û bi hevdû re xwarin û hwd jî dihê kirin. Ev roj, weke rojek teybeta di çand Mîtratîyê de.** Çanda Mîtratiyê, weke

çandaka bi vî rengî ya dema şariştanî a hemdem a. Bi wê yekê re, Mîtra, di dema xwe de, pirr zêde li ser pirsgirêkên civatê sekinîya û axiftîya. Hanîya ser ziman. Xwestîya ku her mirov aqilê xwe baş û rast bikarbêne.

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku Mîtra, di wê demê de hê ku li jîyanê ya, wê Xûrê li cem wê bê. Mîtra, di wê demê de, wê li ber jinê çawa were tevgerîn di keseyetîya jinên weke wê de daye nîşandin û hanîya ser ziman. Mîtra, nirxên dayiktiyê pîroz dîtîya.

Mîtra, ku heta dema wî jî, li hin herêmna boraqkirina zarokan hebûya, ew li ber wê disekinê. Çend ku di dema xwe de, ew bi tememî wê ji holê ranakê jî, lê li ber wê disekinê. Piştre jî, wê li ser wê helwesta Mîtra, êdî nîqaş bibin. Êdî hin bi hin wê bi tememî ev kevneşopî were ji holê rakiirn û êdî zarok nayêna boraqkiirn. Dem, heta ku tê dema Zerdeşt bixwe jî, ku hinekî pişt Mîtra ya, wê ev rewş û hinek nîqaşên wê hebûna xwe bidomên in. Zerdeşt jî, wê van rewşan hilde rojava xwe û Di ”aveste”ya xwe de dihêne ser ziman. Lê hê di dema Mîtra de, bi helwessta Mîtra re nîqaş di derbarê wê de domîya na.

Di wê demê de di parastgehê de Mîtra, li ser van mijaran di temenê têgihiştineka civatî nêzîkatî kirîya. Mîtra, hin bi hin hertiştî dike ku di êqil de werêne ser ziman. Dihêne jî. Lê wî di dema xwe de destpêk daya destpê kirin. Lê piştî wî, wê ev rewş, bêhtirî pêş bikevin. Mîtra xate rast çî ya hanîya û danîya li holê li pêşîya mirovan. Êdî di wê demê de û di demên piştre de, bi pêşketinên şariştanî re, mirov jî hewceyî pê dibîne ku di temenê xalkîtîyê de yekîtîyê bi xwe re di hizir û mejî de bide çê kirin. Hizrên Mîtra, ji vê yekê re dibina temen. Li gorî vê xwestekê ya. Mirov, bi tememî, çend ku hemû tiştî di wê de fahm nekin jî, hîs dikin. Hîsê mirov, dike ku mirov hin bi hin di wê temenê de helwesta rast bide nîşandin. Bi wê yekê re, wê mîtra, ji hemû herêman, wê mirov werin û wî bibînin. Wê rastîya wî fahm bikin. Mîtra, piştî wî re, weke rastîyaka civatî, mejûyî û serdemî ku li herêmê bigiştî serdest dibe ya. Divê ku mirov di vê temenê de bibêje ku kevneşopîya ku Mîtra ji nav derdikeve û li ser pêş dikeve jî, li vir divê ku em çend gotina bo wê jî bibêjin. Ew jî, ji aliyê olî ve digihijê Melekê Tawis. Melekê tawis, berî Mîtra hatîya. Pêşketina Melekê tawîs, heta ku dem tê dema Mîtra, wê bi sadsalan pêşketinaka mazin bi afirêne û bi kevneşopî bike. Ew kevneşopî, piştre wê di temenê civatî de dem bi dem pêş bikeve. Wê li demê û civatê û di nava xalkê de serdest bibe. BI wê re jî, di aslê xwe de pergale rastî ya civatî û olî ya di temenê gotina ´yazdanê mazin´ de ku di temenê ´yek-yazdanî´ de em fahm bikin, pêşketîya û serdest bûya. Êdî ew, weke

temen, wê pêş bikeve. Ev wê Mîtra jî ji wê xwe biafirêne û pêşbixe. Her wusa divê ku mirov bo cihûtîyê jî, divêt ku mirov heman tiştî werêne ser ziman. Di wê demê de, Mîtra, serdestîya wî giringa ku mirov fahm bike ku ew kevneşopîyê dike biguharêne. Ev yek, weke aliyekî giringa ku divê ku mirov fahm bike. Ev jî, bi teybetî, wê bê temenê gûharînên mazin di nava jîyane mîtannîyan de.

Mîtra heta dema wî jî çend ku kevneşopîya êgir xwe domandîya jî, wê Mîtra wê red nekê û ew wê xwe bidomêne. Heta ku Mîtra wê hinek tefsîr û wateyên nû jî li wê kevneşopî û xatê bike. Lê Mîtra di rex wê de tiştekî din jî bi awayekî dide pêşxistin. Ew jî, her wusa ew a ku ew aqil derdixe li pêş. Şîrovekirinê pêş dixe. Ev aliyekî giring a. Di nava rojê de, dema ku herî zêde germ de, gerîna Mîtrayîyan, bi vî ve girêdayî ya. Lê Mîtrayî, wê êdî hin bi hin pêşketinê weke ku ji nû ve şîrove bikin. Ji rewşe pêketîya êgir, derhanîna gotina «rohnîyê» rengekî pêşketinê her wusa bi pêşketina mîtra re di temenê pêşketina aqil de dihêne ser ziman. Mîtra, divê ku mirov herê bike ku wî demek û serdemek bixwe re daye dest pê kirin. Mîtra, aqil û zanîn derxistîya li pêş. Di w temenê de, wê «mirov çawa karibê bixwe bigihêne aqil», hinek rengên hizirkirinê ên Mîtra û her wusa bawermendên wî na. Bi wê yekê re, pirr axiftîn û heta ku nîqaş jî di nava wan de bûna. Hizrên xwe hanîna ser ziman. Li ser tefsîrkiirna rengê «xwe gihandina aqil», hizrên cûda dihên ser ziman. Hizrek ji wan, her weha ew a ku di wê demê de jî serdest a û Mîtra jî hanîya ser ziman ku «gîyane mirov biaqil a.» Bi vê yekê, ew aqil ne bi laş re lê bi gîyanê re dihêne ser ziman. Ya ku serdest a jî gîyan e. Bi vê yekê, şîroveyeka Mîtra ya bi vî rengî heya. «Mirov ji axê ya. Lê yazdanê mazin ji sûretê xwe û ji nûrha xwe jî hinek tişt tevlî kirina. Aqil ji yazdanê mazin tê. Dema ku mirov mir, wê gîyane mirov nemirê. Ji ber ku gîyan ji yazdanê mazin a. Wê vegerihê li wî.» Bi vê rengê, Mîtra, aliyekî mirov bi yazdanê mazin ve girêdide û dihêne ser ziman. Bi wê re jî, wê aliyê mirov «nemir» dibînê. Ya ku mirov nêzîkî yazdanê mazin dike ev. Hinekî jî, li gorî wî, ya ku mirov weke hevbeşîyekê ku ji yazdanê mazin bi mirov re werêne ser ziman, gîyane mirov a. Di vê temenê de, piştre, bawermendên Mîtra, dema ku Mîtra bixwe şîrove kirina, ew weke ku di rengê ´yazdanê mazin de şîrove kirina´. Ev jî, hinekî bi vî aliyê ve girêdayî ya. Yanî bi vê şîroveya Mîtra û berî wî ya wê kevneşopîyê ve girêdayî ya ku divê ku mirov bi wê ve girêdayî hilde li dest û fahm bike.

Bi vê yekê, dema ku bahse çûyina Mîtra li ser tax bi ber azmana ve, hinekî jî di vê çerçoveyê de divê ku mirov ji aliyê ve lê binerê.

Mîtra, li ser taxtê xwe ya û ku çend ga wê dikişênin bi ber azmana ve û rojê ve difiê û diçê. Wê Mîtra, bivê yekê, nemirê. Mîtra, ji ber ku yazdanê mazin ne xwestîya ku bimirê êdî yazdanê mazin ew bi vî rengî biriîya cem xwe.

Rastîya olî ya Mîtra, di vê temenê de wê bi pergalî di nava civatê de bi têgihiştinî wê rûnihê. Mîtra, hizrên wî ên ku wî hanîna ser ziman, wê piştî wî re di temenê bûna temenê pêşketina hizir û zanîna wê de wê karekî mazin ê mejûyî bikin. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêe ku Mîtra, rengê pêşketinê êdî ji dema xwe û pê de daye dîyar kirin.

Ku em di vê temenê de li dema Mîtannîyan dinerin, em dibînin ku Mîtannî, pir zêde di dema xwe de biawayekî hemdem pêşketina xwe jîya na, û bi wê rengê pêşengtî ji demên xwe ên piştre kirina jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wan û dema wan bike.

Mîtannî, navê wê bixwe jî, dema ku em lê dihizirin, em dibînin, ku hinek hevbeşî binavê Mîtra re jî hena. Di destpêka hersê tîpên navê Mîtannî, «mît», hersê tîpên destpêka navê Mîtra jî na.

Mîtannî, demeka biaqil jîyane na. Mîtannî, aliyekî wan ê din jî heya. Em di dema Mîtra de wê kifş dikin, ew jî, her wusa ew a ku weke ku di wê demê de li ber pêşketinên ku êdî zû dibin, dikevina nava mitale kirinê de. Bo vê yekê, ew zêdetirî, weke kurdên roja me li kevneşopîyên xwe êdî xwe dipêçin. An jî, kevneşopîyên xwe li xwe dipêçin. Mirov vê rewşê bi wan re dibînê. Mîtannî, hemû pêşketinên xwe dixwezin ku di nava kevneşopî û sînorê xwe de bijîn. Bi vê rengê, di nava hewldanekê de na. Bo vê yekê ya ku di destpêkê de, hertimî pirr gûmanên wan bûna di derbarê pêşketina Mîtra bixwe de.

Ev dema Mîtannîyan, wê li berfiratê bi teybetî li herêmên ku ji wê re weke navend û paytaxt in ên weke ”waşûkan” û hwd, wê li herêmê serdest bê. Mîtra li wê hewirdorê dijî. Bi teybetî, ji wê xate Waşûkan(serêkahniyê)´ê, heta ku digihê Afrîn û kobanê û hwd li wir dijî. Li wir, li ´çîyayê kurda´ maya.. Li wan dordoran hemûyan gerîya ya. Bi teybetî, ev hersê herêm û herêmên weke Qamişlo ku heta ku digihijê Nisêbîn û Rehayê û hwd, herêmên ku wê bi çanda wî bijî bê. Herêma Reha, weke herêmek teybet ku mirov divê ku bi teybetî li ser bisekinê ya.

Ev herêmên desthilatdarîya Mîtannîyan, herêmna ku bi pêşketina xwe re weke navend in. Ji gelek herêmên dordorê, mirovên ku qastî wir dikin hena. Bi teybetî zane, qastî van herêman dikin.

Li herêmê, di wê demê de, ev çanda Mîtra ku pêşketîya, wê demek kin de lê serdest bibe. Berfiratê, weke deriyê ku li wan herêmên li ber bahre reş û ya sipî divebin a. Ji wan herêman jî, mirov tên vê herêmê xwe pêş dixin. Wê bandûra mîtratiyê, piştî wî re, li pêşketina van herêman jî bibe. Bi teybetî, ji hemû aliyan ve wê bandûûra lê bibe. Ji aliyê Mîtolojî û olî ve bê. Ji aliyê aqil û felsefe û hwd bê, wê bandûr lê bibe. Mîtra, ji xwe ku mirov ola wî, weke oleka felsefê, û ankû weke oleka felsefîkî şîrove bike, wê xelat nebê. Wê rast bê. Bi vê yekê, di aslê xwe de, Mîtra, di dema xwe de, li pergale kevneşopî ya Mîtannîyan ya bavûkalan nerîya û pergale xwe ya aqil hanîya li holê. Di vê çerçoveyê de, pergale ku wî hanîya li holê jî, pergale aqil û zanînê ku em divê ku bi rengê aqilê felsefê wê şîrove bikin a.

Mîtra bixwe jî, di dema xwe de, çend ku weke oldarekî û bawermendekî ku mirov divê ku wî werêne ser ziman, bi heman rengî divê ku mirov w weke felsefevanekî demê ê bizane û ku temenê aqil aqilparezîyê bixwe avêtîya ya. Di vê çerçoveyê de ku em bahse wî bikin, wê rast bê. Ji xwe, êdî wê hem di dema wî de û hem jî di demên piştî wî de, wê li ser wê aqilparêzîya Mîtra û têgihiştin û zanîna wî, êdî wê felsefe were kirin. Ev, weke aliyekî giring a ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê werêne ser ziman. Mîtra, dema ku gotinên xwe dihêne ser ziman, li du tiştan dinerê û dihêne ser ziman. Yek ji wan, kevneşopî û nirxên civatî ên ku pêşketî na. Ya din jî, aqil û ankû aqilparêzî ya zanînî ya. Di çerçoveyê de Mîtra, gotinên xwe bi van herdû aliyan dihûnê û diafirêne û piştre dihêne ser ziman. Di v çerçoveyê de, ew di çerçoveya civaknasiyeka teybet ku bi rehetî mirov dikarê xwe bi wê bêne ser ziman, ew jî gotinên xwe dibêje û dihêne ser ziman. Piştî wî Mîtra, ev hersê alî wê pirr zêde bi zanîn û hiş bibin û werina ser ziman. Ev hersê alî jî çi na? Yek, dîsa kevneşopî ya. Ya din, aqil û ankû aqilparêzî ya. Ya sêyemin jî, ew temenê civaknasî ê di temenê wî û pêşketina wî bixwe de ya.

Mîtra, di vê çerçoveyê de, wî çerçoveyeka giştî a civatî, hiziratî(felsefîkî), olî û bawerî û hwd, li gorî nirxên aqil û têgihiştinê ên demê diafirêne û dihêne ser ziman. Ev,rastîya Mîtra ya ku mirov bi teybetî li ser bisekinê û wê fahm bike û werêne ser ziman.

Mîtra, çend ku hebûna ´yazdan´ weke ´hêzeka´ ku hemû tiştî kifş dike û li ser hemû tîştî re ya, ku dihêne ser ziman jî, lê bi wê re jî di wê çerçoveyê de li dûnyê û li ser rûyê ardê li bersivên xwe ên jîyanî digerihê. Teybetmendiya pêşî ya Mîtra ya hizkirina wî, ev ku em divê ku wê pêşî bikin. Bi wê re jî, Mîtra vacê dimeşêne. Hizir bi wê re li gorî wê

vacê dimeşêne. Li ser wê re û bi wê hizrkirinê re li gorî wê vacê digihijê ancamên giring di serê xwe de û jîyanê xwe de. Bi vê yekê jî, êdî şîrovekirinê dike. Ew, bi vê yekê, hizirvanekê mazin a. Mîtra, zaneyekî mazin a. Ew zanebûna wî, di aslê xwe de ya ku herî zêde wî derdixe li pêş a. Bi wê, derdikeve li pêş a. Dema ku li parastgehê dimeêne û li parastgehê ji bawermendên li dora xwe re diafirê, di wê çerçoveyê de, bi gotinê xwe re hem hebûna yazdanê mazin û hem jî jîyanê dide fahm kirin û têgihiştin. Ya ku wê bawermendên wî, piştî wî re serdest bikin li jîyanê jî wê ev bê. Ji ber ku Mîtra temenê wan bi aqil çê kirîya û ew jî li ser wê temenê de êdî ji dora xwe dihênina ser ziman. Wan jî, di dema xwe de pirr baş li Mîtra hisandina û guhdar kiirina. Bi wê yekê, ew jî, êdî bûna zaneyna mazin. Gotinên ku tenê ji Mîtra girtina û di serê xwe de girtin û dihênina ser ziman, wan dike zaneyna mazin di nava jîyanê de. Ev rewş, weke rewşeka teybet ya pêşketinê re ku bi wê pêşketina mîtrayîyan re dihê û dibe.

Mîtra, bi vê yekê, li ser aqil re bilind bûya. Ew tefsîra bi taxtê wî re bilindbûna wî ya li azmana, hinekî jî li ser temenê aqil û ankû aqilparêzîyekê hatîya rûnandin. Bi wê yekê, ew temen bi aqil hatîya afirandin. Mîtra, di aslê xwe de, hê ku li dûnyê û li jîyanê ya, ew bixwe wê temenê xwe diafirêne. Bi wê yekê re, ew êdî mazin dibe û bilind dibe. Wî rafaransên xwe yên têgihiştinî ku piştî wî re bawermendên wî bijîn hanîna ser ziman. Bi wê yekê, wî xate xwe di serê mirovan de safî û zelal kirîya.Bi vê yekê, êdî ew bûya oldarê dema aqil. Bawermendên wî, bûna oldarên dema aqil. Bi wê yekê re, aqil û têgihiştin û kevneşopî pêşxistina ku wê pêşketinên olî ên piştî wî re li ser re weke wî bixwezin ku xwe werênina ser ziman. Li ser vê temenê êdî pêşketin dibêt. Mîtra hizireka wî ya teybet bi vî rengî heya ku piştî wî re êdî ji pêşketinên olî re ku wê bibe rafarans. Ev aliyekî giring a ku divê ku mirov bi navê wî re li ser bisekin in. Mîtratî, di çerçoveyê de, wê hê di dema xwe de, weke pergaleka civatî ya olî û kevneşopî bidest pêşketina xwe bike. Di wê demê re, li ber-firatê, ji xwe têgihiştina olî ya bi yek-yazdanî heya û pêşketîya. Mîtra di wê temenê de dihê. Wê bi wê re jîyan û kirin û behîtên Mîtra hemû li ser parastgehê werina naqşkirin. Ev tenê bi serê xwe wê di wê xate olî û pêşketina wê de, weke pirtûkek pîroz wê weyn bileyizê di pêşketina wê demê û ya mîtrayîyan de.

Kevneşopîya naqşkirinê, ji demên berê wê demê ve pêşketîya. Di wê demê de jî, dihê baştirkirin û pêşketîtirkirin. Êdî ew jî, bi wê yekê re di wê çerçoveyê de dihê bikarhanîn. Bi naqşkirina li ser hêtên parastgehê

bê, û her wusa bi gotinên aqil re wênekirina rewşan û hwd bê, wê bi pêşketina wê re di temenê vê pêşketina mîtratîyê de bê. Bilindbûna Mîtra bi taxtê wî re li azmana bi ber rojê ve, hinekî jî divê ku mirov di temenê de jî bi şîrovekirinê werênina ser ziman.

Dema ku em bahse kevneşopîya naqşkirinê bikin, divê ku em jibîrnekin û bahse ”naqşa Şahmaran” bixwe jî bikin. Ev jî, berhema van deman a û bi teybetî di dema Hûrî û mîtannîyan de hatîya pêşxistin. Rengê navaroka wê naqşkirinê, rengê tefsîrkirina Mîtra bixwe jî, her wusa gelek tefsîrên din jî dihêne berbîra me. Weke ku hemû ji destekî derketibin, dihên dîtin. Mejiyê ku li wê dihizirê, rengê wê û awayê wê yê pêşketinê, em kifş dikin. Bi wê re jî, em kifş dikin ku çendî pêşketî na.

**Rêya Mîtra, rêya pêşketinê Verethraghna, Sraoşa, Raşnû, aşa wahîşta ya**.

´Aşa vahîşta´ ku aramîyê û başîyê bi xwe re dihêne ser ziman û ´sraoşa´ jî ku dadîyê dihêne ser ziman, di çerçoveya şîrovekirina Mîtra de, em bi rengê pêşketina wan de dibînin. Di çerçoveyê de, divê ku em heyîn û hebûna civatê bi pergale wê ya civatî û pêşektina wê re lê binerin. Li vir, ev nîşanakê vê pêşketinê na ku Mîtra wan li berçav digrê û dihêne ser ziman.

Mîtra, di vê rastiyê de, ku em lê dihizirin, weke têgihiştin û ´felsefeyeka´ civatî ku pêşketî jî dihê li berçavê me. Rengê pêşketina wî ya di parastgahê de, her wusa di vê çerçoveyê de ya. Mirov, dema ku dijî, di nava wê jîyane civatî de, wê çawa were dîtin û pêş bikeve, li vir, birengê ku ji aliyê olî û hwd ve ku wê çawa di çerçoveya pêşketina civatî ve bi derûnî, kevneşopî û hwd bijî, temenê wê dihê dîtin û afirandin. Li parastgehê, mirovekî ku were herê kiirn û piştre ku weke ”andamê wê civate Mîtra” a bawerîyê were dîtin, carekê wî noqî ava ku di huundurê parastgehê de diharikê dihê kirin. Ev du caran dihê kirin. Yek, dema ku zarok, dem aku hat dûnyê û care dûyemin ku balix bû û heta ber dema zewecê û ankû dema ku dizewicê. Ew av pîroz a. Carekê, ku xwe di nav wê avê de kir, êdî wê piştre weke ku were ”şiştin”. Ev şiştin, şiştekeka teybeta ku bi rengê têgihiştin û baweriyê re tefsîr û şîrove wê dihê kirin a.

Mîtra, dema ku yek di nav awê ”kansavê” de hat kirin, êdî piştre wê li gorî ku dikarê êdî di nava civate Mîtra de bijî, wê hebe. Ev temenê ”di nava avê de kirin” û ankû di nava ”ava kansavê” de kirin, heta ku dem tê demên piştî Mîtra dema Zerdeşt jî dihê û di nava bawerîya Zerdeşt jî bicih dibêt. Ev, weke kevneşopîyeka ku çendî ku oldar werin û gûharin

were kirin jî, weke nirxna û kevneşopîyna ku temen diafirênin. Ev Berî Mîtra jî, Hebû. Ev, kevneşopîya di nava vê de kirin, hê di dema Melekê Tawis de destpêkirîya. Bi wê re wate wê hatîya kirin. Bi Mîtra re bûya û domîya ya û ji nû xwe biwate hatîya kirin. Cewherê têgihiştina di temenê vê avê de, ew a ku dihê bawer kirin ku ev av ku yazdanê mazin ji bihûştê li dûnyê daye herikandin a. Yanî, bi vê rengê dema ku zarok bû ku piştre noqî wê avê hat kirin û ankû piştî ku di dema balixbûnê de ku ew av biser wî de were kirin, weke temenê çêkirina ”peymanekê” di nava yazdanê mazin û wî mirovî de ya di temenê wê xate bawerîyê de.

Ji dema melekê Tawis û bi vir de jî, ev kevneşopîya noqkirina li nava wê avê heya û hatîya domandin. Lê li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku hemû av jî çênabin. Divê ku ew ava teybet ku di hundurê wê parastgehê de diharikê bê.

Di vê temenê de, êdî ew weke ´peyman´ekê ya di nava mirov û yazdan de di wê xate bawerîyê de. Mîtra, pêşengê wê xatê ê olî ya. Bi gotinaka din, pêxemberê wê xatê ê ku rengê bawerîyê bi fermane ku ji yazdanê mazin girtî ku dide dîyar kirin a. Di vê temenê de şîrovekirina wî, heya.

Mîtra, hizra wî, temenê wê li ser dadîya yazdanê mazin a. Dadîtî jî, ´raşnû´ dadîtîya ku li jîyanê were û pêşbikeve ku mirov li gorî wê bijî û destûra bingihîn a ku hemû dadî li gorî wê were kirin ´destûra sraoşa´ dihê ser ziman. Ku bi kevneşoppî li gorî ´destûra sraoşa´ pêşketina dadîtîya raşnû´ li jîyanê pêşket, wê hingî êdî ew pêşketina ´aşa-wahîşta´ ku di temenê aramî, aşîtî, wekhevî û dewlemendiyê de wê jîyan bi pêş de herê.

Di vê temenê de Mîtra, aramî hem di hundurê mirov de û hem jî di jîyane mirov de hanîya ser ziman. Bi wê yekê re, di wê temenê de wê çawa were jîyîn jî, ew jî hanîya ser ziman. Bo ku aramîya hundûrîn bibe, divê ku mirov bi gîyane xwe serdest bibe û tenê ´bi wê hîs bike´. Bi wê re jî, dema ku mirov bi wê jîya û hîs kir, wê hingî serdestîya gîyane mirov li laşê mirov jî bibe. Mirov wê êdî bi wê re serdestîyê li jîyane xwe bixwe jî bike. Bi vê yekê re mirov, êdî wê aramî di hundûrê xwe de bigirê û aşîtîyê di jîyan xwe de bi xwe re bigrê. Gotina ´aramîyê´ ya hundûrîn, temenê wê li ser wê temenê ya ku mirov bi xwe re di keseyetîya xwe de ne di nava ne aramiyê de bê. Mîtra dibêje ku wê hertimî di wê hundûrînê de jî şerê qancî û ne qancîyê bi hevdû re hebe. Lê ku mirov di wê de, li jîyane xwe serdest bû û bi hişmendîya wê de tevgerîya, mirov wê di wê de ya rast jî û qanc jî kifş bike û êdî li gorî wê bijî. Di vê çerçoveyê de, li

gorî Mîtra pirr giring a ku mirov heta ku hewirdora xwe bixwe jî li hevdû bide hevdû û rast bike. Ji ber ku ew jî bandûrê li mirov dike. Li wê şerê qancî û ne qanciyê ê di nava mirov de dike. Di nava daristanê de, li beravê û hwd, cihên ku mirov dikarê wê aramiyê di xwe de li wê bigrê hena.

Ji vê awayê hizirkirinê mirov fahm bike ku Mîtra dihizirê ku di temenê hemû şer û pevçûnên di jîyane mirov de ew ne aramîya hûndûrîn jî heya. Yanî, dema ku mirov biryarek da, bi kîjan aliyê ve mirov dide? Di hundûrê mirov de, ew şerê di nava qancî û neqanciyê de, bandûra wê li wê heya. Lê dema ku em di aramiyê de bin û bi hizir in, emê ya rast bibînin. Mîtra di vê temenê de bi teherî hîyerarşîyekê ji hundûrîn bi ber dervayîya mirov ve dide destpêkirin.

Gotina ´aramîyê´ aşîtîya hundûrîn ya bi keseyetîyê re ya bi mirov re dihêne ser ziman. Aşîtîya derve a di nava civatê de jî, aramîya nava wê bi xwe re dihêne ser ziman. Di vê temenê de li gorî vê vacê ev herdû gotin jî hevdû bi hevdû re dihoyin.

Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov bibêje ku êdî di vê têgihiştina olî ya bawerrîya Mîtra de, weke ku çawa di demên berî wî de di wê kevneşopîyê de bi giringî hebû ku zarok bê û balix bê ku di nava wê avê de werê kirin, dikeve temenê ve gotina aramîya hundûrîn û aşîtîya civatî bixwe de jî. Li vir, ku mirov di xwe de bi xwe di nava aşîtîyê de bê, banndûra wê li civatê bixwe jî dibe. Li pêşketina wê jî dibe. Li vir, bo vê yekê, gotina ´aramîyê´ û ´aşîtîyê´ dibîna du gotinên giring di hundurê têgihiştin û zanîna Mîtra de. Di aslê xwe de, hinekî ev a di temenê wê de ku wê piştî Mîtra de heta ku ji hîndîstanê bixwe jî, wê ew rengê hizirkirin û bawerîya wî were kifşkirin li wir bê bicih kirin. Piştî Mîtra re, li **hîndistanê** Bûda tê. Bûda, piştî mirina wî re, weke ku li Mîtra hat kirin, ew jî dihê hildan li azmana. Bandûra Mîtratiyê, li vir dihê dîtin ku rengna din, li vê pêşketinê bixwe jî bûya. Di dema Mîtra bixwe de, ev rengê pêşketina wî, bi awayekî ku divê ku mirov lê bihizirê û werêne ser ziman, di vê temenê de dih ser ziman. Mîtra, li ser taxtê wî ya û taxtê wî ji aliyê gayan ve dihê kişandin li azmana bi ber rojê ve. Li wir a, heta ku roja ku ew wê carek din were dûnyê. Mîtra, di baxtê wî de nivîsandîya ku wê ew were dûnyê carek din. Bo vê yekê, piştî Mîtra re, di temenê ku weke ´amedekarîyak ji vê hatinê re´ bê, bawermendên mîtra dihizirin û û bahs dikirin û dihanîn ser ziman.

Li vir, divê ku mirov dûbare vê kifş bike û bibêje ku Mîtra li gorî rastîyeka civatî dihizirê û dihêne ser ziman. Di aslê xwe de, di vê temenê

de li wê awayê hizirkirina wî ku mirov lê dinerê, mirov hinekî jî, wê awa û ast û radaya pêşketina Mîtannîyan jî di dema wan de kifş dike. Mîtra, pêşî hebûna civatî li berçav digrê. Ev di asta pêşî de, ji kûderê dihê dîtin û fahm kirin? Ev, wê awayê wî dihê fahm kirin ku ew di çerçoveya kevneşopî de dihizirê û dihêne ser ziman. Aliyê din jî, ew a ku di temenê yek-yazdanîya wî de ew rengê hizirkirina wî ya. Sêyemin jî, ew aramî, aşîtî û keseyetîya ku dihê xwestin ku bide pêşxistin a. Ew, tenê pêşnîyar nakê ku tenê di rêya yazdanê mazin de mirov bimeşê. Ji wê zêdetir, ji mirov dixwezê ku mirov fahm bike. Ev jî, weke aliyekî din ê teybet, divê ku mirov li vir binxatkê û werênê ser ziman. Ji xwe, dema ku em li rengê zimanê kurdî ê dema hûrî û mîtannîyan dihizirin û lê dinerin, em dibînin ku gotinên weke ”hiş”, zanîn”, ”hawar”, ”sittar”, ”gûlîstan”, ”ziman”, ”laleş”, û hwd ku em dikarin bi dehan gotinên din ên weke vê li vir bicih bikin hena. Bi wê re jî, gotina ”war” ku bi rengê ”awarre” jî mirov ji dema wan dixwêne, hena. Gotina war, giring a. Temenê hebûna civatî diafirêne. Yanî gotinaka ku ji aliyê hêstîyarîya civatî û pêşketina wê ve ku em dikarin di temenê naskirin û lêxwedî derketina welatê de fahm bikin a. Her wusa, gotinên weke ên ´zanîn´ê, ´hiş´ û hwd, gotinên têgihiştinî û hwd in. Ev jî, rengekî hizrî ê wan ê pêşketina wan dihêne berçavê me. Dema ku em ji vê aliyê ve li ser gotinên Mîtra û her wusa ziman ve em li wê demê dinerin û lê dihizirin, em vê yekê bi başî kifş dikin.

Ev rengê pêşketinê ê wê demê ku em bi vî rengî li ser gotinan bê û ankû li ser pêşketina civatî a kevneşopî û hwd re bê, em ji wê reng û ast û rada û awayê pêşketina Mîtra pirr zêdeyî kifş dikin. Wekî din jî, ji dema Hûrî û mîtannîyan gotina ”laleşê” û ya melekê Tawis jî, em kifş dikin. Ev herdû gotin bi pêşketina olî û kevneşopî û mejûya wê re bi hevdû ve girêdayî na. Î ro jî, gelek bineterên ji wê demê ku em li wan dinerin û dixwênin, em pirr zêde navê Laleşê û Melekê Tawis rastî wan tên. Ev, çi dide nîşandin? Ev dide nîşandin ku bi wê zêde rast hatina van gotina ji wê demê de dide nîşandin ku di wê demê rengê pergeleka çawa a olî di wê demê de lê serdest a. Ev ji vê aliyê ve hizreka baş û mazin didina me.

Dema Mîtannîyan, ji vê aliyê ve dema ku em lê binerin, bi teybetî, ev demên wê dawiyê, demên Hûrî û mîtannîyan û hwd, di wê de weke ku ji nû ve bi pêşketinên weke ên bi Mîtra û hwd re hatibê xwandin û afirandin. Mîtra, teybetmendîya wî ya sereka ew a ku ew di çerçoveya kevneşopî û pergala olî a wê demê de dihêne ser ziman. Yanî li vir, çend ku hinek farqî di gotinê de û hwd de hebin jî, ew zêde nabin. Mîtra, ji nû

ve wê dîrokê û hemû pêşketin û kevneşopîya wê şîrove dike û dihêne ser ziman. Ev alî û rengê wê ê pêşketina Mîtra heya ku divê ku mirov wê bi teybetî binxatkê û kifş bike.

Mîtra, di temenê asta pêşketina demê de dihêne ser ziman. Ew demê baş dixwêne. Bi wê re jî dibînê ku wê di demên pêş de çi rengê pêşketinê û bi çi awayê derkeve holê û bibe. Êdî ew jî, li gorî wê dihêne ser ziman. Farqe Mîtra ya hanîna wî ya ser ziman ku em lê bigerihin, divê ku em di vir de lê bigerihin.

Bi vê yekê, ew rengê nû ê pêşketina civatî ê bi aqil û hizir û zanînê dibîne. Bi wê re jî, êdî ji aliyê olî ve jî fahm dike ku divê ku li gorî wê hanîna ser ziman û pêşketin bibe. Bi vê yekê û rengê, pêşketina Mîtra di temenê xwenûkirineka demî de dihê li holê û berçav. Di vê çerçoveyê de ew li olê û kevneşopîyê dihizirê. ..

Ji xwe, dema ku em hinekî li ser hebûna kevneşopîyê û pêşketina wê rawastihin, emê bibînin ku kevneşopî bixwe, nirxeka çandî, hizrî û heta ku olî ya, ku di temenê civatî de pêş dikeve ya. Li vir, rengê kevneşopîyê û pêşketina wê, civatîtî ya. Civaknasîya wê, ku rengê xwe de bi têkiliyên navxweyî ên civatî û hwd, êdî wê li ser wê re têgihiştin û hişmendîya xwe jî biafirêne. Ji vê aliyê ve jî, ku mirov dinerê, mirov dibînê ku Mîtra di nava têkiliyên kevneşopîkî û civaknasîya wê de dijî û dihêne ser ziman. Mîtannî bixwe, xwediyê nivîsandinaka xort in. Pirtûkxaneyên wan ên mazin û tîşî nivîsar hena. Bi wê yekê re, divê ku em bi gotinakê re jî bibêjin ku wê elfebeya xwe ku bikardihênin a teybet, wê bi hezaran nivîsaran binivîsênin.

Mîtannî, rengê pêşketina wê, dide nîşandin ku bi gelek dîmenî bi hevdû re dijî. Her wusa naqşkirinên ku em î ro weke tefsîran wan dixwênin, ew naqşên ku laş mirov û serî serê eylo, laş laşê tûpişk lê ji noqê ve tûpişk, Her wusa, tefsîrên zarokên ku bi bask(pirr) û difirin, û hwd, ku bi hezaran tefsîrên bi vî rengî ku ji wê hena, rastîyekê bi pêşketina wan re didina nîşandin.

Mîtra, di nava wê rewşê û kevneşopîyê de dijî. Lê Mîtra, van dîmen, wênekirin, naqşkirin û hwd, êdî bawerî nava têgihiştin û hizirkirinê dike. Bi wê re jî wan di nava hizirkirinê de di temenekî nû ê bi aqil de dihêne ser ziman. Bi vê yekê, weke ku wan di nava hizirkirinê de ku bi hevdû re bi mihêne dike.

Mîtra, di wê temenê de, pergaleka ku aqil dijî û bi pêşve diçe êdî dihêne ser ziman. Li vir, farq Mîtra ev a.

Mîtra, rengê wê dide dîyarkirin ku êdî li ser hizirkirinê re û bi aaqil were meşîn û dîyarkirin, dihêne li holê. Em, vê yekê bi wî re dibînin. Di wê çerçoveyê de jî, pergaleka civatî û biaqil û ku pêşbixe wê çawa bê, li ser wê dihizirê. Ew, bi vê yekê, di aslê xwe de, ew dema ku dihê gotin dema ”mîtolojî” hwd, wê dema wê di olê û kevneşopîyê de bide girtin û li şûna wê dema aqil û felsefê bide destpêkiirn û ol û oldarîya wê bide pêşxistin. Hinekî jî, divê ku em bibêjin ku Mîtra jî û oldarîya wî jî, ya demeka şariştanî ku em divê ku bi hemdemîya şariştaniyê re werênina ser ziman a. Di vê temenê de, em dikarin rewşa Mîtra di temenê xwenûkirinakê de jî fahm bikin. Ankû, weke ji nû ve bûnekê werênina ser ziman. Mîtra bixwe û pêşketina xwe re bixwe jî, ancamê pêşketin û gûharînên pêşketinî bi ber civatîtîyê ve na ya. Dema ku em di vê çerçoveyê de lêbinerin, emê wî baştir fahm bikin. Emê wê dema wî jî baştir fahm bikin. Pêşketina Mîtra û ya bi wî re di temenê pêşketinên aqil ên piştî wî re ên felsefîkî û hwd de pirr kifşkar a. Ev, weke ku li herêma wî li mesopotamya biqasî ku wusa ya, her wusa li ber bahre reş û ya sipî jî wusa ya.

Li vir, em dema ku li wê pergale wî ya stêrzanîyê ku rêmildarên wê demê û ên wî bixwe jî dihênina ser ziman, çerçoveya wê, bi dîroka wê re divê ku mirov kifş bike. Dîroka wê jî, dîroka mesopotamya hemûyî dike nava xwe de bo hemû pêşketinên xwe re.

Di wê demê de, di aslê xwe de ew pêşketina stêrzanî û hwd jî, wê asta xwe ya bilind bijî. Rengê, salixkirinê ê bi dûnyayan re û ku piştre li ser wê re weke ku rêmildar dikin ku pêşarojê û ankû ´baxt´ê mirov dixwênin ku ka wê di demên pêş de çi werina serê mirov, hinekî jî astaka teybet a. Oldarên vê xatê, tefsîra wan, di wê temenê de ya ku dikarin ”pêşarojê jî, bixwênin”a. Yanî, ew, ew di wê têgihiştinê de na ku li ser xatekê jîyanê re dimeşîn ku yazdanê mazin ji destpêkê heta dawiyê bi ”nivîsandinê” hemû tişt û jîyankirinên wê kifşkirîya. Ev di jîyane mirovekî de jî wusa ya û di ya dîrokê hemûyî de jî wusa ya. Êdî, ew jî, weke oldarên wê xatê, remildariyê(magû) dikin li ser wê xatê re. Ew, mirovên ku herî bizane na. Dikarin bibêjin ku wê ”sibe, çi were serê min” û ankû ”wê çî were pêşîya min ku ezê jîn bikin.” Li vir, temenê wê oldarî û bawerîyê jî, di vê temenê de ev diafirêne. Êdî bi vê re jî, stêrzanî, weke karekî ”pîroz” bi wê re pêş dikeve di temen de. Oldarî, di temenekî wusa de dihê ser ziman ku ya rast çi ya dizanê bi wê pêşengtîya civatê û mirovan dike.

**Vegotina ”carek din vegerîna Mîtra li dûnyê û serdestkirina wî ya aliyê qanciyê li dijî aliyê xirabîyê”**

Mîtra, di derbarê wî de, dema ku bahse jîyane wî dihê kirin, di temenê behîtekê de bahs dihê kirin. Bi teybetî, dema ku bahse goçkirina Mîtra ji dûnyê dihê kirin, dihê gotin ku ”ew li ser taxtê xwe bû û ga, ew taxtî wî yê ku ew li ser rûniştîya hilkişandina bi  azmana ve. ..

Mîtra, dema ku bahse wê dihê kirin, dihê gotin ku ew namirîya. Ew, dema ku dema wî hat ku wê ji dûnyê goç bike, ew bi taxtê wî re çûya azmana û li wir dimêne. Li wir, ”cihê wî, di rex yê yazdanê wî de ya.” Mîtra, wê serdema qanciyê serdest bike. Ew, wê serdestîya yazdanê xwe li dûnyê serdest bike. Bi wê yekê, Mîtra, weke peyamnêrekî yazdanê mazin ê qadîm dihê dîtin û ser ziman.

”Mîtra, weke ku çawa ku serdemek bi aqil da destpêkirin, her wusa wê di nava wê serdestîya wê demê de jî wê qanciyê pêş bixe û serdest bike.” Nbi vê rengê bahs ji Mîtra dihê kirin. Mîtra, aqilzanî û aqilparêzîya wî ya ku heya, ew di wê dema wî û demên piştî de serdest dibe. Bi vê yekê, hertimî jî bahse wî dihê kirin. Heta roja me jî, di nava kurdan de ku bahse wê dema wî dihê kirin, bi gotinên aqil û zanînê ên ku di temenê aqilzanî û aqilparêzîyekê de na dihê gotin û vegotin. Bi wan gotinên bi vî rengî ew dihê ser ziman.

”Kevneşopîya Mîtra a sersalê”, weke kevneşopîyaka k di nava civatê de bicih a. Piştî wî re jî, çend ku dem bi dem, gelek pêşketinên olî bi pergalî û hwd, tên û bi rengên cuda li wê civatê wî serdest dibin jî, ev kevneşopî û hwd, ji holê ranabin û bi tememî ji jîyane civatê dernekevin.. Bi teybetî, ev kevneşopîya sersalê, divê ku em di çerçoveya wê de, gotinakê bibêjin.

Mîtra Mîtra re, wê gelek xatên olî û bawerî ên cûda wî derkevin û pêşketina xwe di nava wê civatê û beşên wê de bidina çê kirin. Çend ku ev rengên olî ên cuda na jî, di nava wan û têgihiştin û rengê bawerîya wan de, ev kevneşopî û kevneşopîyên wî ên weke vê hena û serdest in.

Mîtra, kevneşopîya wî ya aqilzanî û aqilparêzî, her wusa weke kevneşopîyeka ku divê ku mirov bi teybetî li ser bisekinê ya. Her serê salê, ew dema ku wê di wê de, ´sersal´ were pîroz kirin jî, wê bawermendên Mîtra herêm bi herêm bigerihin wê ”agirê Mîtra” dadin. Wê agirê mîtra pêxin û wê nehêlin ku ew agir bimivrê. Bi vê rengê, karekî wan yê pîroz jî hebû. Ev kar, ji xwe bo wan pîroz û bi nirx bû.

Dema ku em bahse Mîtra û wê kevneşopîya wî bikin, em divê ku vê aliyê bi teybetî werênina ser ziman. Kevneşopîya sersalê, kevneşoîya ku

destpêka wê bi Melekê tawis û cihê wî yê bergê re dihê destpêkirin a. Lê Mîtra wê, bi awayekî din ê pêşketî jî di nava bawermendên xwe de di wê temenê de li gorî demê dihêne ser ziman.

Di temenê kevneşopîya Mîtra de, dema ku mirov dihizirê û hewl dide ku wî fahm bike, bi hizrên wî re mirov wî di temenê aqilzanîyê û aqilparêzîyê de wî fahm bike. Her wusa, tefsîrên ku bawermendên wî çêkirina ku ew hê mirov li wan dinerê, mirov dibîne ku xat û rengên wan naqşên di derbarê wî û bawermendên wî de pirr xort û stûr in. Bi reng in. Li vir, divê ku mirov dibînê ku giringîya rengê di nava têgihiştina wî de heya. Reng hatina tefsîr kirin. Hinek reng, li ser agir re hatina tefsîrkirin. Minaq, rengê sor, zer, reş û hwd,, bi têgihiştinî, di temenê kîjan wateyê de ku mirov dikarê fahm bike, em di nava hanîna ser ziman ya bawermendên Mîtra de dibînin. Lê aliyekî din ê pirr giring heya. Ew jî, ew a ku di derbarê tefsirkirin û biwatekirina rengan de, têgihiştinaka xort heya. Serdestî li wê fahmkirina têgihiştina rengan di nava Mîtrayîyan de heya. Reng, her yekê ku dihê şîrove kirin, hinekî bi çend wateyên mazin û ji hevdû cuda dikarin werina şîrove kirin. Minaq, Mînaq rengê ´zer´ di wateya hinekî ´lawaz´bûnê de hatîya şîrove kirin. Rengê `Sor, di wate jidahîbûnê û tîrîtî û têrbûnê hatîya şîrove kirin. Yanî, weke rengekê ku di temenê qarakterê mirov ê ji xwe bawerbûnê de hatîya şîrove kirin. Hinekî jî, tevgerîtî pê re bi rengê êgir hatîya salixkirin û şîrove kirin. Reş, di gelek wateyan de hatîya şîrovekirin. Reşî, bixwe, weke nimînêrê ´xirabîyê´ jî hatîya dîtin. Bi wê re ji aliyê din û bi wateyeka din ve weke rengekî li ser  sorê re hatîya dîtin û şîrove kirin. ”Rengê azmana”, ku ´şîn´ weke rengekî temen hatîya dîtin û şîrove kirin.. Bi wê re jî, gelek wate hatîya pê ser ziman. Bi heman rengî, divê ku mirov bibêje ku di Mîtratiyê de hemû rengên ku bi çav hatîna dîrin û kifşkirin, hatina salixkirin û bi wate kirin. Lê rengê kesk bi xwezayê re dihê dîtin, rengê sor ku agir û axê(axa, van herêmên berfiratê sor a) dihê dîtin, rengê ´zer´ ku rohniya rojê re dihê dîtin, rengê şîn ku bi avê û gelek rewşên din ên avê re dihê dîtin, rengê sipî, ku bi awr û gelek rewşên din ên jîyanî re dihê dîtin û hwd, weke regna sereka hatîna dîtin. Bi teybetî, kesk, sor û zer, di nava van rengan de rengên ku pirr zêde derketina li pêş. Li pay wan rengê sîpi, şîn û reş hena ku derketina li pêş bi salixkirin û bi watekirinên bi wan hatina kirin re.

Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku bawermendên Mîtra, li ser rengan re hizirîna û hewldane ku rewşan bixwênin. Mînaq, ji mirovan bipirsîn ku bêhtirî hij kîjan rengî dike û ankû herî zêde kîjan reng zêde bal û hey

dikişêne, li gorî bersiva wê êdî şîrovekirin bi keseyetîyê re kirina. Ev weke aliyekî teybet ê ku divê ku em divê ku bi rengê pêşketina mîtra re fahm bikin a.

Lê li vir, kifşkirina rengên weke ên sipî, şîn, kesk, sor, zer û hwd ên weke ”rengên bingihîn” jî, di nava wê hizra Mîtratîyê de derketîya li pêş. Di dema naqşkirinê de, li gorî wê bi nirxkirin û biwate kirinê di tefsîran de ev reng dihêne bikarhanîn. Mîtran ji wê demê û heta vê demê jî, ku kurd ”naqşeya şahmaran” çê dikin, herî zêde rengê kesk, sor û zer bikardihênin. Di demên dawiyê de, rengên din, tevlî hatina kirin. Di nava rengên ku bi wan naqşeya şahraman dihê çêkirin de, reş zêde nayê bikarhanîn. Ev jî, hinekî bi wê wateya wê ve girêdayî ya. Bi heman rengî, di gelek rewşên din jî, ev hatîya kirin. Ji nava wan rengên weke bingihîn, cil û gergên bawermendên Mîtrayî jî dihê bikarhanîn. Mîtra cilên wan sipî na. Ev di temenê heyîna hebûna jîyanî de ev reng dihên bikarhanîn. Ji Mîtra dihê pirsîn ku «reng çî ya», Mîtra bersivê dide û dibêje ku «rengê, ne tenê renga, rengek jî ne tenê rengek a. jîyane», vê bersivê ji wî dihildin. Bi vê rengî, reng bi jîyanê re dihên ser ziman. Ev têgihiştin, di nava Mîtrayîyan de pirr zêde pêşketîya. Têgihiştina bi rengan, têgihiştina bi stêrzanîyê û hwd, çend ji wan têgihiştin û rengên hizirkirinê na ku bi hevdû re bo fahmkirinê Mîtrayî bikardihênin. Reng, di wan de li gorî Mîtra bixwe jî, «peyam heya.» Ev, vê peyamê bi heyîna hebûna yazdanê mazin dihêne ser ziman. Dibêje «her rengê û tişt, hebûna yazdanê mazin li jîyanê biwate dike.» Bi vê rengî, mîtra, li gorî wê biwatebûnê jîyandinê pêşnîyar dike. Bi vê re, em vê jî bibêjin ku di xate jîyane mirov de, mirov wê çi hêzê bigrê bijî, Mîtra, dema ku bahse wan kirîya, reng jî hanîya ser ziman. Her wusa, Mîtra «hêzeka ku di hundurê rengan de» dîtîya û kirîya ku wê werênê ser ziman. Mîtra, bi vê rengê, ji gelek alîyan ve bahse rengan û heyîn û hebûna rengan kirîya. Î ro, bawerîyên kurdan, ên weke Bawerîya Melekê tawis jî, Mîtra jî, û her wusa ên di wê demê de û di demên piştre de jî ku hatina û çûna jî, di wan de rengê bi wateyeka giring afirî ya. Î ro, heta roja me jî, weke sê rengên giring, di nava kurdan de «kesk û sor û zer» hinekî jî, temenê wan digihijê van pîrozîyên wan ên mejûyî jî.

Têgihiştina rengan, weke têgihiştineka û rengekê hizirînî û zanînê ê teybet ku mirov ji rastîyên temen digirê dihêne ser ziman. Li ser têgihiştina wan re jî û ankû li ser hizirkirina wan re jî, gotîya ku «ya ku mirov bi hizirkirinê digrê» ya. Di temenê mengiwerîyeka hizrî a ´şenber´ de wî reng hanîna ser ziman.

Mîtra, hizratîya wî ya li ser rengan, li vir divê ku mirov wê bi teybetî fahm bike. Rengê jîyanê, bi hişarî wê di vir de dîtîya û kifşkirîya. Di vê temenê de, dema ku em bi vî rengî dihizirin, em diçin û gihijina Mîtra.

Di temenê heyîn û hebûna rengan de Mîtra «rastîyek» dîtîya û xwestîya ku wê rastîyê bêne ser ziman. Ev rastîya ku wî dîtîya, divê ku mirov wê ji nirxdarî û rengê bawerîya wî dûr şîrove nekê û neyênê ser ziman. Bi hevdû re, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Heta ku, divê ku mirov weke qatek ji rengê bawerîya wî werêne ser ziman. Li vir, ji rengan afirandina têgihiştinê bûya. Mîtra, di rastîyê de reng weke hin «hîm»na kirîya bike temenê şîroveyên xwe de û di temenê wê de hizrên xwe werêne ser ziman.

Her rengek, bi çi rengî ya, her rengek, bi çawa ya, her rengek, tîrîtîyeka çawa bi wê re heya, her rengek di wê de peyamek çawa heya û hwd, Mîtra xwestîya ku xwe bigihêne bersiva van pirsan di serê xwe de bi bawermendên xwe re. Di vê xate bawerîyê de ku Mîtra li ser wê re pêşdikeve, reng, hatina bi wate kirin. Di aslê xwe de, berî Mîtra jî, ev bi wate kirin hena. Lê Mîtra bi hişê hizratî(felsefîkî) û hwd, weke ku şîrove dike. Li vir, di nava naqabîna çebûn, hebûn û rengê pêlê darekê de, wê çawa têkilî were danîn? Ev rewş, hinekî bi hişarî ew li ser hizirîya û kirîya ku wê fahm bike û werêne ser ziman. Dema ku Mîtra li rengan dihizirî, di serê xwe de diket nava rêwîtîyeka bi nepenî ku dawîya wê rêwîtîyê tûnaya ya. Bi wê re jî, di wê çûyinê de, Mîtra nepenîyek dîtîya. Wî di wê nepenîyê de, bi demê re ku mirov herê wê bigihijê kûderê, xwestiya ku bigihijê wir. Mîtra, wî demên bûhûrî ên dîrok, li berçav girtina û her wusa li «destpêka» wê dîrokê hizirîya û di hizirkirina xwe de heta dema xwe hatîya. Bi wê re bi demê re reng çawa di wê re rêwîtîyek heya û bûya. Hinekî li wê hizirîya. Di wê hizirkirinê de, Mîtra xwestîya ku xwe bigihêne yazanê xwe ê mazin.

Lê ne tenê wê jî. Mîtra, têgihiştieka rengan, hinekî bi rengê jîyanê re dîtîya. Her wusa, rengekî «kevneşoopî» xwestîya ku bi hebûna civatî re jî bi wê re werêne ser ziman. Mîtra, li vir, weke ku di nava xalkê de bi gotinên di derbarê Mîtra de ku dihên seer ziman het roja, mirov dema ku li wan dihisêne û fahm dibihîzê, mirov ji navaroka wan gotinan û li hişarîya ku li wan gotinan hatîya lêkerkirin ku mirov li wê dihizirê, mirov hinekî bivî rengî têgihiştineka kûr bi navê Mîtra re û bi hizratîya wî re kifş dike û dibîne.

Bi vê yekê re, ev rastîya têgihiştinî ya bizanînê ku rengan re dihê ser ziman, em dibînin ku weke hizretatîyekê (felsefeyekê) bi pêşketina Mîtra

re di nava hizirkirina wî de em rastî wê tên. Li vir, hin teybetmendiyên giring hena ku em divê ku wan fahm bikin in.

Ev mijara rengan, weke mijareka zîz a ku divê ku mirov bi wê xate olî ya li ber firatê û ber diclê re ku bi giringî li ser bisekin in. Parastgeha Lipît Îştar bixwe jî, dema ku em lê dihizirin, em heman rewşê dibînin. Her wusa, pêşketinên piştre jî, em bi vê rengî dibînin. Bi reng kirin, ji aliyekî ve biwatekirin a. Bo vê yekê, bi rengkirin, giringîya wê bitêgihiştinî heya.

Mîtrayî, li vir, rarafansên wan ên bikarhanîna rengan jî, weke ku çawa ku ew di jîyanê de biçav dibînin a. Di vê çerçoveyê de lê dinerin. Bi wê rengê ku nerin û dimejî de qaydkirin jî, dihênina ser ziman. Di vê temenê de weke ku pêşî jiberkirina reng dihêkirin û piştre ew reng dihê bikarhanîn. Wusa, weke ku dihê dîtin û ankû qaydkirin, êdî xîzkirin û ankû naqşkirina wê dihê kirin.

Di nava kurdan de naqşkirin, weke hûnerekê pirr zêde pêşketîya. Her wusa, di temenê hûnandinê de bê, di temenê birêskirinê bê, di temenê ´naqş´kirinê bê û hwd, pirr zêde pêşketîya. Ev di demên wan ên kevn de, pirr zêde wusa bû. Ez dikarim bibêjin ku ya î ro zêdetir bi wan re pêşketîbû ev rewş. Di wê naqşkirina wan de, awayê bikarhanîna rengan, wê çawa û li kûderê çi rengî bikarbênin, weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov bi wan re dibînê ya. Di bikarhanîna rengekî di naqkirina kevîya balgihekî de bê û heta kud digihijê rifandina(çêkirina) kenzeyekê û ji çêkirina goreyekê û heta ku digihijê çêkirina kûlavakî û hwd, hemû jî di wan de, wê reng çawa werê bikarhanîn, dihê kifşkirin. Hinek nirxên ku van didina kifşkirin hena. Di wê temenê de, dihên bikarhanîn.

Reng, di dema bikarhanînê de yek, rengên xwezayê û rengê têgihiştina bawerî ku bi hevdû re hatîya hûnandin di temen de bibandûrî dihê dîtin. ”Goraya şivan”ekî ku di wê de ew xatên wê ên reş ku dihên bikarhanîn û hwd, hemû jî, hinek wateyên wê ên giring ku bi demê re afirîna hena. Di temenê aramîya mejî û dil de jî, bandûra rengan heya. Di çêbûna dilxweşî, hêrsbûn, bitevgerbûn û her wusa di nava aramiyekê û hwd de jîyîn jî, hinekî têkilî û bandûra rengan bi wê re heya.

Mijare rengan bikarhanîn û biwatekirina wê, êdî weke mijareka kevneşopî cih digirê. Di vê temenê de, kifşkirinek bi wê re dihê dîtin. Rastîya rengan, têkiliya wê di vê temenê de Mîtra bi rengê têgihiştin û bawerîya mirov re danîya, Reng, têgihiştin û dagerên xîzkirî û hwd, li vir, divê ku mirov bi hevdû re werêne ser ziman. Di vê temenê de, levkirin û hwd, li wê hatîîya lêgerîn. Ev rewş, hemû, herwusa rengekî têgihiştinî ê

bi pergal ku mirov di temenê hizratîyekê de bi wî re dibînê ya. Li vir, wusa zêde di pêşketina Mîtratîyê de hebûna rengan û bi watekirina wan, hinekî jî divê ku mirov bi wê aqilzanî û aqilparezîya wî re hilde li dest. Ew aqilzanîyê û aqilparêzîyê bi rengekî hizratî(felsefîkî) û hwd derdikeve li pêş û dike ku serdest bike li jîyane civatî. Êdî ku bi wê re pêşketinê bide çê kirin û jîyanê bi wê re ji nû ve bi reng û wate bike. Di vê temenê de, weke ku Mîtra bandûra rengan a li ser mejî hîs dike. Mîrov vê yekê bi wî re hîs dike.

Rengê bawerîyê, rengên civatî û kevneşopî û hwd, divê ku mirov li vir bi teybetî bi hevdû re wan hilde li dest û fahm bike. Di çerçoveyekê de ku weke ku Mîtra dihanî ser ziman, em ku karibin bi vê rengê wê bênina ser ziman, emê jîyaneka pirr rengî ku hemû rengê xwezayî ku dihên dîtin ku di wê de hatîna biwênekirin, mirov wê êdî wê biafirêne.

Wusa dihê dîtin ku rengê aqilzanî û aqilparêzîya Mîtra jî li ser vê temenê rûniştîya. Ji xwezayê bi ber hişarîyê ve çûyin, aliyekî giring ê ku divê ku mirov li vir bi vir ve girêdayî ku divê ku mirov kifş bike ya. Hişmendî, li vir derdikeve li pêş. Lê ew hişmendî, ku weke rêhevalê wê gotinaka ′hişarîyê′ jî bi xwe re dihêne li berçav. Di vê temenê de aqil û rastîya di wê de, hewl hatîya dayîn ku were salixkirin. Ew gotina aqil, ku ew gotina ”rastîyê” a di wê de ku dihê salixkirin, li vir, em bi wê re wê rengê têgihiştinê bi hişarî dibînin.Ji xwe, bi fahmkirina wê re, weke dîmen(wêna)ê wê yê dûyemin, emê hişara wê dibînin. Mîtra, li vir, bi vê rengê, weke mirovekî aqilzan û aqilparêz ê hizratîyê(felsefê) dihê li berçavê me. Hizrên Mîtra, di vê temenê de û di çerçoveyê de ku mirov hewl dide ku fahm bike, weke wê têgihiştîna wî ya rengan, em rengekî civatî bi wî re û bi pêşktina wî re ku pêşketî û têgihiştî dibînin. Mîtra, li vir, zaneyê civatê ya. Bi wê re jî, bawerrmendekî bi zane ê civatê ya. Li vir, divê ku em gotina zanebûnê û ya bawerîyê ku bi hevdû re bihûnin, divê ku em rengê pêşketina Mîtra û bawerîya wî bi wê werênina ser ziman. Wê hingî, ew rastîya wî ya hizrî û têgihiştinî bi civaknasîya wî ya civatî re baştir êdî were fahm kirin.

Li vir, divê ku em bi teybetî li ser vê yekê bisekin in û bibêjin ku Mîtrayî, têgihiştin û hizratîya civatî ya demê ya. Bi wê yekê û rengê di wê demê de, pêşketîya. Mîtra, parastgeh, di wê demê de li gorî aqil ji nû ve rast kirîya. Aqil, bi rengê zanîn û têgihiştinê ku pêş dikeve di wê de bicih kirîya. Biaqil, hizirkirin û şîrovekirin û hanîna ser ziman, di vê çerçoveyê de pêşketîya. Bi wê re jî, rêbaza hanîna ser ziman a Mîtra, di wê demê de bûya temenê de kirina felsefê. Mîtrayî, çendî ku pêşketina û

xwe hanîna ser ziman, weke ku hinek zanistvan û ankû bi gotina roja me ”filosof” weke ku derkevin li wan tê. Bi wê re jî, her bawermend, bi aqilê xwe pêşketîya. Dikarê aqil bimeşêne û bersivê bide her pirsên ku ji wî dihên kirin.

Ev awa û rengê, wê pêşketinê, divê ku mirov herê bike ku wê piştre weke tehereka têgihiştinê û pêşxistina têgihiştinê û ankû ”dahûrkirinê” wê pêş bikeve. Tehera Mîtra, di vê temenê de, pêş dikeve. Mîtra, di wê dema wî, di vê temenê de hizirkirin dibê. Hizrên xwe dihênina ser ziman. Wan hizran bi naqş dikin. Dema ku hizir binaqş hat kirin, wê bi wêna bibe. Êdî mirov wê şenber bibîne. Bi wê re dîtinê re, êdî wê hem hizirkirin pêşkeve û bi wê re fahm kirin û hem jî hîskirin bibe û bi wê re jî hêst. Ev rengê pêşketinê wê, di rengekî ku em dikarin bi gotina ´wijdanê´ û hwd re werênina ser ziman wê pêş bikeve. Ev jî, di aslê xwe de, astaka pêşketinê ya. Dema ku mirov karibê bibe ku mirov karê darizêne, hingî mirov dikarê bahse destpêka pêşketina vijdan jî bike. Wijdan, wê rengekî mengiwerî ê di temenê nêzîkatîyê ku li wê darizandinê bê kirin bê. Mîtra, di wê demê de, bi hizirkiirna wî re û bi rengê hizirkirina wî, ´darizandin´ pêşketîya.

Mîtra, di vê temenê de divê ku mirov bibêje ku di rengê ola wî de, hîyererşîyeka teybet li ser vê rengê pêşketîya. Li ser hemû tiştî ´yazdan´ a. Bin yazdan re farişte hena. Farîşteyên ku jîyanê didin û distênin û hewd. Bi wê re di asta hiyererssşîyê de pêxemberî hatîya. Berî Mîtra, navê Melekê tawis pirr dihê bihîstin. Bin pêxemberîyê re jî, oldarên sereka, weke ´pîr´, rêmildar û hwd hena. Li bin wan jî, bawermend hena. Her wusa hin ast û cûdahiyên din jî, hena. Ev hemû, di çerçoveyê de dihên û dibin.

Di oldarîya li ber diclê û firatê de, di pêşketina wê de, ev rengê pêşketinê ê bi gotina ´hîyarerşîyê´ re, rengê pêşketina wê dide nîşandin û dîyar kirin. Mirov nikarê xwe weke pêxember denezêne. Divê ku ji aliyê ´yazdan´ û ankû ´xwûdê´ ve were şandin.

Bi vê rengî, pêşketina Mîtra, oldarî û rengê pêşketina bawerîya wî jî heya. Di vê temenê de, dema ku pêşketinek derket li holê, ku di nava sînorê kevneşopîya wê pêşketina civatî ya ku heya de ku hat herê kirin jî, êdî ew pêşketin wê weke pêşketineka sereka were dîtin û herê kirin. Wê bê weke ”destpêkek” ji wê demê û demên piştre jî. Ev rengê pêşketinê, çendî bi demê re pêvajo bi pêvajo li ber diclê û li ber firatê pêşketîya jî, bi wê re gelek pêvajoyên bi nakokî ku bûna tememî dijberîyên li hevdû jî bûna. Teybetmendiyek bûya. Oldarên vê herêmê ev rastîya hîyererşîkî

dîtina û fahm kirin. Lê ku bi tememî ne dîtibin û fahm nekiribin jî, bi hîskirinekê, pêşketinên berî xwe yan ji holê rakirina û ya li cihê wê bicihkirina û xwe û pêşketina xwe kirina cihê wê pêşketina piştre ku wê were û bibe bi wê hîyererşîyê û yan jî, xwe li wê serdest kirina û ew di nava xwe tafisndina û bişavtina û bi wê re yan xwe hanîna ser ziman û yan jî ew bixwe re hanîna ser ziman. Ev jî, di wê temenê de, weke kevneşeopîyeka ´serdestîyê´ ku hertimî hem derbe li pêşketina wê xatê xistîya û hem jî li pêşketîna herêmê bigiştî xistîya.

Di vê temenê de, dema ku em li Mîtra binerin, em dibînin ku cûdahîyeka wî heya. Wî û bawermendên wî ev nekirina. Wan yan xwe bi wê kevneşopî û xatê hanîna ser ziman û yan jî ew bi xwe re hanîna ser ziman. Piştî wî re, desthilatdarîyên kku afirîna, çend ku xwe weke desthilatdarîyên ku ”xwediyê bawerîya wê xatê na” jî, bi demê re li dijî pêşketinên wê xatê jî şer û tekoşîn kirina. Herî dawî, piştî Mîtra re di dema Zerdeşt de, em vê yekê dibînîn. Piştî ku Zerdeşt ji jîyane goçkir, wê desthilatarîyên ku piştî wî re ku hatin û ku gotin ku ”em li gorî bawerîya wî na” jî, li gorî bawerîyên cûda ên wê xate bixwe jî şer kirin. Ev, piştre di temenê desthilatdarîyê de pêşket.

Li vir, ji ber çi, pirr giringa ku mirov Mîtra bi tememî û başî fahm bike? Mîtra, rengên xwezayê ên ku me li jor hanîna ser ziman, wan kifş dike û dike temenê pêşketina xwe de. Dema ku em li gorî wê kifşkirinê û kirina temen de bihizirin, em dibînin ku Mîtra, cûdahîyan di temenê ´cihêrengîyan´ de fahm dike. Vace hizirkirina Mîtra, vê têgihiştinê dide me. Ev jî, temenê wê, li ser esas û temenê herêkirina cihrengîyên cûda ên bawerî, civatî û hwd re wate distêne. Di vê temenê de, Mîtra, di dema wî bixwe de jî, ne tenê xalkek, gelek xalk hena. Mîtra, di wê temenê de, ew jî dîtina û li gorî wan jî hizirî ya. Bi vê yekê, êdî wî rengek pêşketinê ê bi bawerîya xwe re hanîya ser ziman ku ew xalk hemû karibin, wê têgihiştina wî di nava xwe de fahm bikin û bijîn, lê ku yek ne li dijî ya din bê û yek hebûna ya din ji xwe re xirab nebînê û nedê nîşandin. Di vê temenê de, rengên xwezayê, wî kirîya rengê têgihiştin û hizra xwe û bi kirinîya wê jî, bi jîyanê û pêşketina xalkîtîyê re bawermendên wî hanîna ser ziman.

Di vê rengê mirov dibînê û fahm dike ku Mîtra, hiyererşîyê di nava yazdanê xwe û xalkan de didêne. Lê li binê, xalkan jî weke hevdû ku dibnê. Bi wê yekê re, di temenê têgihiştinekê de, em wî û rengê têgihiştina têdigihin.

Mîtra, li vir, em divê ku bi teybetî binxatkin û bibêjin ku Mîtra, rengên jîyane ji xwe re esas girtina. Wî, bi wan rengan jîyan xweşîk û sipahî dîtîya û hanîya ser ziman. Di wê temenê de nerîya. Di wê temenê de fahm jî kirîya. Di wê temenê de daye fahm kirin jî. Mîtra, di vê temenê de, rastîyeka mejûyî ya giring a.

Mîtra, gotinên demên berî dema xwe ku hatina ser ziman, di hilde ser ziman û wan li gorî demê û têgihiştina demê ji nû ve weke ku salix dike. Vê jî, birengekî xwenûkirinê dike. Di vê temenê de, ew pêşketina xwe bi aqil, aqilzanî û aqilparêzîyê dide çê kirin. Aqilparêzî, bi hiziratîya demê re, weke du teybetmendiyên hizirkirin û pêşketina Mîtra ya civatî na.

Hizrên Mîtra, weke ku em ji tefsîrên ku ji dema wî mana jî ku em dixwênin, em dibînin ku di vê temenê de di temenê xwenûkirinekê de hanîya ser ziman bi dema xwe re. Mîtra, di vê temenê de, dema ku em bahse wî dikin weke ´destpêkekê´ di dema wî de, em di vê temenê de bahse wî dikin. Tefsîrên ji wê demê bi me didina têgihiştin ku Mîtra, di wê demê de di nava rengê awayê hizirkiirna demên berî wê demê û wê dema aqil û hwd de, wê hûnandinaka xweşik û sipahî bi hiş û têgihiştinê çê kirîya. Bi vê yekê, ew êdî ne tenê weke oldarekî, weke hizirvanekî dema xwe jî dihê dîtin li berçav.Dager û dîmen û wêneyên têgihiştinî ên dema berê, wî di dema xwe de ji nû ve salixkirina û biaqil hanîna ser ziman. Li vir, di vê temenê de, em dibînin ku dema ku Mîtra dihêne ser ziman, sedem û ancam weke aliyekî giring bi hizirkirina wî re derdikeve li pêş. Minaq, ”ji ber çi ga gûrand?”, hwd, rengekî pirs pirskirinê ê ku em ji wê rewşa wî tê digihin a. Bi wê re di cih de hiş û seha sedemê bi rengê hizirkirina wî re derdikeve li holê. Gotinaka bi vî rengî li ser navê wî dihê gotin bi ´gûrandina ga´ re. Tê gotin, piştî ku gayê wî ji ji destê wî ravî, êdî ew hizirîya û gihiştîya wê ancamê ku ”yazdanak heya ku min jî û ew jî afirandîya”, ”Ew li ser me hemûyan re ya.” Ew bi aqilê xwe digihijê vê ancamê. Ev ancama gihiştinê, bi xwe re têgihiştineka sedemê jî diafirêne. Li gorî vê ancama ku Mîtra di serê xwe de gihiştiyê de, aqilmendiyeka bihiş dihê holê û mirov wê kifş dike.

**´Gihiştina aramî û başîya sermedî´**

Di parastgehê de Mîtrayî, wê mirovan li gora rewîsta civatî pêş bixin. Li vir, heft rengê perwerdekirinê hebûn. Mîtrayîyan mirov di ”heft hevijandin”an de di buhurandin. Hevijandina pêşî ya ku kurd bê, zawicî bê, şervanakî baş bê,  ji yazdanê mazin re û ji rohnîya wî re bergê bike bê, şêr bê û li wê bihizirê ku wê çawa gîyane wî derkeve azmana, ev jî, bi

başbûn, dûrûtbûn, xawênîbûn û hwd, tenê dîkarî wê gîyanê dervê wê wê azmanê bê. Bo vê yekê wê Mîtrayî, di van hevijandina de bi buhurîyan. Di buhurtin jî.

Lê di temenê vê hevijandinê de, pêşxistina girêdane bi yazdanê mazin ve hebû. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku Mîtra, di vê temenê de li civatê hizirî ya. Bi vê yekê, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku Mîtrayî hevijandina ku bi xwe re dane rûniştandin, bi wê û li ser wê re êdî pêşketina xwe ya hizrî û civatî jî didina kirin. Mîtrayî, ew hevijandina wan, civatî bû. Bi pergalî bû.

Mîtra bixwe jî, xwediyê wan hevijandinên ku bawermendên wî di wan re di buhurtin bû. Bi wê yekê re Mîtrayî, bi wê rengê di nava xwe de xwediyê rengekî perwerdekirin û awayê hevijandinê bûn. Hevijandina wan, hevijandinaka civatî û rewîstî ya ku di temenê wê de pêşketina hizrî û hişarî heya.

Li vir, Mîtrayî, ´xwarina pîroz´ ku dixwarin, weke rêgez û destûreka têgihiştinî ku di temenê wê hevijandina wan de bû. Ya ku divê ku em di serî de fahm bikin ev a.

Hevijandina Mîtrayîyan, bi rewîsteka civatî û pêşketina wê bû. Li gorî wê pêşketibû. Di aslê xwe de, Mîtrayî, astaka civatî ya li pêş dijîn. Ya ku wan di dema wan bixwe de jî, dike navend ku pirr hey werina ser wan ev bûya.

Mîtrayî, di parastgehan de, dema ku dirûniştin, bi hevdû re di rex hevdû de di rûniştin û di temenekî ku hevijandina xwe de bidina nişandin de disekin in. Li gorî wan, ”dema ku ew dirûniştin jî, û dema ku dimeşîn jî, û dema ku karekî din jî bikiran, wê yazdanê mazin ew bidîtan.” Ev têgihiştin, weke têgihiştina zindî di serê hemûyan de zindî bû. Yanî, bawer dikirin ku tiştek ji nerîna yazdanê mazin narvê.

Bi vê yekê, Mîtrayîyan, dema ku kêmesîya mirovakî didin, weke lewitînekê re şîrove dikirin. Bi vê yekê jî, ew têgihiştina berê ku hebû ku dema ku yekî pirr xirab dibû ku ew dema ku bihata şawitandin, wê gîyane wan ji laşê wan azad bibe, di wê temenê de dinerîn. Bi vê yekê, berê, şawitandin jî bûya. Yanî, avêtina nava êgir jî bûya. Lê Mîtrayîyan, çend ku bi tememî ev red nekirina jî, bi rengekî din di temenê li ber rojê mayînê û her wusa di nava wê ava ku ji bihûştê di harikê de ”şiştinê” pêşnîyar dikir. Lê şert û mercên wê hebûn. Bi wê re tobekirin û carek din ew kirinên bi wî rengî ku berê dikiirn ên xirab ku zirer didan wî û dordora wî ku wan nekê. Êdî ew mirov wê bi demê re yazdanê mazin li kirinên wî binerîya û wê êdî piştre dema ku ew(gîyane wî) çû cem

yazdanê mazin, wê hingî yazdanê mazin li kirinên wî ên pêşîya tobakirina wî mirovî binerê û piştî ku tobakir jî, wê li wê were nerîn ku ka wî tobeya xe xira kirîya û yan jî, nekirîya. Ji ber ku dihat bawerkirin ku dema ku yekî tobekir û tobeya xwe xira kir, wê ew gûnehên wî yên berê jî ji wî re werina hasibandin. Bi wê re jî, ew gunehên ku piştî tobeyê kirina jî, wê gunehê wan girantir bê.

Bi vê yekê, êdî mirov biketa rewşeka xirab de. Bo ku mirov nekevê wan rewşên xirab de, divê ku xwe bizanebûn bike û hişar bike. Bi wê yekê, divê ku dayimî alîkariyê jî ji bawermendên parastgehê bigrê. Divê ku têkiliya xwe jiw an ne birrê. Hertimî, bi wan re di têkiliyê de bê. Ev jî, weke bergireka wê dihat dîtin ku ew mirov wê tobeya xwe xira nekê. Bo parastina mirov ew bergir dihat dîtin. Mîrayî, di vê temenê de, bawermendên wî ên li parastgehê, weke mirovên ku nêzî zanîna wî ya yazdanê mazin dihatina dîtin. Wan bawermendan, dikarîn ”rêya rast” di çerçoya destûrên yazdanê mazin û hevijandina melekê Tawis de bidan nîşandin. Ev rewş, weke rewşna teybet, ên ku bawermendên Mîtrayî li ser wê dihizirîn û bi wê dikirin ku rê şanî mirovan bidin di ”rêya baş” de. Hertimî, ”du rê” hena. Rêyek, ”rêya baş” a. Rêyek j, ”rêya ne baş” a. Mirov, divê ku nekevê rêya ne baş de. Lê wê gîyane ahrîman hebe ku hertimî bike ku bike rêya xirab de. Lê li ber wê, divê ku mirov bizane bê û rêya rast çîya wê bizanibê. Bi wê re jî, çendî ku mirov di rêya rast de meşî, mirov wê baş bê. Bi wê re jî, mirov wê êdî serdestî xwe bê. Mirov, bihişar bê, mirov wê serdestî xwe bê. Ji ber ku ev jî, giring a ku Mîtra, gotîya ku ”hertimî, wê hêzeka ku bixwezê we ji rê derxê wê hebe”. Bo ku mirov wê zanibê û ji rê dernekevê, divê ku mirov destûrên yazdanê mazin bizanibê û li gorî wan bijî. Divê ku mirov di nava civatê de, bi ya qanc navê xwe derxê” Mîtra, ji bawermendên xwe re gotîya ku ”di nava xalkê de bi qancîya xwe re werina zanîn” Piştre jî, gotîya ku ”ew dema ku win biqanciya xwe re hatina zanîn, wê yazdanê mazin jî, we biqanciya re bibînê.” Piştre jî, weha gotîya, ”win ku biqanciya xwe re bin, winê êdî ji rê dernekevin û hertimî karibin ji rê derketinan xwe biparêzin in.” Bi vê yekê, bawermendên wî, di parastgehê de, hertimî, kirina ku bi gotina qanc û baş xwe bidina naskirin. Li vir, qancî, weke aliyê baş ku hertimî mirov li wê bijî, Mîtra tefsîr kiriya û hanîya ser ziman.Bi wê re jî, Mîtrayîyan, pêşî ew qancî û rastî û têgihiştina qanciyê di xwe de kirina hevijandin û piştre bi wê ´hevijandina baş´ serî li mirovên nava civatê dane. De ne, Mîtrayî, pirr dihênina ser ziman ku ´hevijandina baş´ heya û vajî wê ´hevijandina ne baş a xirab heya. Li vir jî, kirina ku bibina

pêşengî hevijandina baş di jîyane xwe û ya mirov û civatê de. Ew bi vê rengê, derketina li pêş. Mîtrayî, hevijandina wan, hevijandinaka baş ku di temenê nirxên mirovatîyê de bû. Bi wê re, ew di temenekî ku giringîyê didina gîyanê û jîyanê dijîn. Bi bawerîya Mîtrayî, gîyan ji azmana hatîya xwerê û li ardê li dûnyê bi laş bûya û weke ´mirov´ dijî.

Di vê temenê de, dema ku em Mîtra ga gûrand û serdestîya yazdanê xwe û roja wî denezend, piştre êdî di wê temenê de bi gotina yazdan pêşveçûn bû. Her tişt û rewş, li gorî aqil û bi aqil dihên şîrove kirin. Mînaq, gotina ”rohnîyê” bi gelek rengên wê bi naqşên ku hatina kirin li parastgehê bi navê yazdanê mazin hatîya tefsîr kirin. Gotina rohniyê, dema ku em hildina li dest, weke temenê wê, em dikarin pirr temenan werênina ser ziman. Minaq, ji êgir rohnî dibê. Agir, dişawitêne. Rohniya rojê heya. Ew jî, di sincirêne. Bi vê rengê, ev rohnî û hwd, û bi rengên wê ên jîyanî re hatîya şîrovekiirn. Ev şîrove kirin û ankû tefsîrkirin, lingekî giring ê bi aqilkirinê ya. Dema ku em di vê çerçoveyê de hildina li dest, divê ku em vê nêzîkatîyê weke aliyekî mejûyî û pirr giring hildina li dest.

Di nava parastgehê de, tefsîrên ku li ser hêtên wê bê û ankû ên li hundûr û derveyî wê bê, hemû di vê çerçoveyê de bi rengên ku hatîna bikarhanîn re divê ku mirov şîrove bike û bi wate bike. Li vir, biqasî naqşkirinê, her wusa wê bi çi rengê ew naqşkirin were kirin jî, giringîyeka wê ya teybet heya ku divê ku mirov bi teybetî li ser sekinê ya. Mîtra û Mîtrayî, di derbarê wê de, weke ku di serê xwe de xwediyê zanînekê na. Ya ku em pêşî ji nêzîkatîya wan ya ji wan tefsîran dixwênin ev a.

Bi vê yekê re, di çerçoveya heyîn û hebûna civatî de, hevijandinaka baş, hewl hatîya dayîn ku were afirandin û pêşxistin. Li gorî, Mîtra û Mîtrayîyan, her mirovê bi hevijandina baş, nêzî yazdanê mazin a. Bi wê re jî, mirovê ku ne di rêya baş de ya.

Hizirkirina Mîtra û rengê wê bi têgihiştinî, dema ku em lê dihizirin, di vê çerçoveyê de em li rengekî pergalî dihizir in. Mîtra, di şîroveya xwe de, ku weke teybetmendiyeka wî ya şîrovekirinê em werênina ser ziman, wî xwestîya ku bi ´hevijandina baş´ şîrove bike. Bi wê re jî, şîroveyê pêş bixe û li gorî wê jîyanê û rastiyê werêne ser ziman. Wî di şîrovekirinê de, rêgez û ankû destûrên ku danîna temenê şîrovekirinê de di temenê ´hevijandina baş´ de mirov kifş dike. Bi vê yekê, ya baş çi ya, li wê hizirîya.

Mîtra, weke destûrekê ji bawermendên xwe pirsîya ku ”ya rast bo çi ya, wê werênina ser ziman.” Li vir, ji vê gotinê ev jî, dihê fahm kirin, ku

dema ku her mirov werêne ser zman, dikarê ji aliyê xwe ve jî werêne ser ziman. Lê ji hîmî ve destûrên hevijandina baş wî kifşkirina û ew hanîna ser ziman. Di wê çerçoveyê de wî, bi wan daye hanîn ser ziman.

Bawermendên Mîtra, li vir, bi vê rengê, ji ber çi, her yekê weke hizirvanekî bizane derdikeve li ber me? Hinekî jî, di temenê vê nêzîkatîya wî ya ´hevijandina baş´ û hewldane kifşkirinên wê yên rast de mirov dikarê fam bike. Mîtra, sînorê wê jî, bixwezayê hanîya ser ziman. Lê li vir, tiştek pirr bale mirov dikişêne. Ew jî, ew a ku li şûna ku ew sînorê şîroveyê bi "destûrên rewîstî" bide kifşkirin, di temen de wî ´nêzîkatîya baş´ kifşkiriya. Bi wê yekê re, nêzîkatî kirîya. Di vê temenê de, êdî dema ku li gorî ya ´ baş´ ku şîrove afirî û têgihiştin pêşket, êdî kevneşopî û bixweza rengê hizra wê ya rewîstî jî derdikeve li holê. Li vir, ev weke tehereka Mîtrayîyan dihê li berçav ku mirov wê kifş dike ya. Li vir, farqek, di naqabîna kifşkirina "destûrên rewîstî" û kifşkirina wan û şîrovekirina li gorî wan di nava wê ya "hevijandina baş" de heya. Mîtra li vir, ji ber çi di temenê gotina civatîtîyê de gotina ´kurd´ weke xaleka hevijandinê dihêne ser ziman? Hinekî jî, bi wê sînorê çerçoveya civatî ve girêdayî divê ku mirov wê hilde li dest. Li vir, Mîtra, di wê çerçoveyê de jîyandinê bi heyîna kevneşopîyê de dibînê. Ev kevneşopîyên ku hena, giring in. Li gorî wan jîyîn û hanîna ser ziman giring a.

Bi vê yekê re, Mîtra, di wê bawerîyê de ya ku ´gîyane mirov, ji azmana hatîya xwerê û bi laş bûya." Lê dema ku ew afirîya û hatîya jî bi wê re "hiş" û "zanîn" hebûya. Bi vê yekê, ew li ser vê têgihiştinê re dibêje ku "dema ku li gorî rastîya w gîyane xwe jîya, mirov wê bixweza ya rast bike." Bi vê yekê, li ser vê yekê re, ew bawerîyekê bi nêzîkatîya mirov dihênê. Lê li vir, ew sînorekî piçûk didêne. Ew jî, ew a ku dibêje ku "gîyane, li gorî ku wê çawa bijî, hişmendîya wê heya". "Divê ku laşê mirov dernekeve dervî wê. Weke her çar elementên ku di temenê têgihiştina Mîtra a jîyanî de na ên avê, hewayê, ax û agir û hwd, ew mirov jî bi vê rengê beş dike li gîyanê, laş, hiş û heyîna yazdanê mazin.

Dema ku nêzîkatî û ankû ´teher´ di temenê ´hevijandina baş´ de bê, wê çaxê kirina hizratiyê(felsef) jî hesantir dibê. Sînorê hizirkirina mirov firehtir û maztir dibê. Sînorê hizirkirinê, ku di temenê wê de hevijandina baş´ heya û piştre li ser wê re hertişî ku mirov dikarê şîrove bike û werêne ser ziman. Bi wê yekê re, dema ku mirov hevijandina baş´ dît û fahm kir û hanî ser ziman, wê bixwe hevijandina ne baş jî were dîtin û ser ziman ku mirov dikarê wê bibîne û fahm bike.

Mîtrayî, di vê temenê de, ew dema xwe ya Mîtannî kirina demeka hemdem a pêşketî a biaqil. Aqil li wê serdest kirina. Teybetmendiya wê kevneşopîya ku Mîtra li ser wê re pêş dikeve ew a ku ”li şûna ku were redkirin, pêşî dihê şîrovekirin û bi şîrovekirinê başî û ankû ne başîya wê dihê kifşkirin û êdî bi wê re li gorî ya baş di rêya xwe de berdewam bûn dihê kirin.

Mîtra, hizra wî û têgihiştina wî, di vê çerçoveyê de, divê ku mirov bibêje ku aliyekî hizrî û giring ê civatî ya. Mîtra, oldarîya civatî û hemdemîya wê ya bihizir û aqil pêşxist. Li vir, dema ku em em di serî de vê yekê fahmbikin, hingî emê hê çêtir û baştir wî jî fahm bikin û şîrove bikin. Emê, hingî wê civatîtîya di temenê wî û pêşketina wî de jî fahm bikin. Mîtra, li gorî pêdîvî û pêwîsîtînîyên têgihiştinî û zanînî ên demê dihizirê û dihêne ser ziman û diafirêne.

Bi vê yekê û rengê Mîtra, aliyekî giring ê pêşketina civatî bixwe jî ya. Ji xwe, dema ku em dema Mîtannîyan dinerin, em rengê pêşketina wê di rengekî hemdem ê demî û serdemî de dibînin. Bi vê yekê û rengê, em dikarin bi pêşketina Mîtra bibêjin ku xwe li gorî demê xwenûkirin û ji nû ve afirandin jî. Bi wê yekê re, wê demên piştî Mîtra jî, bi wê rengî dem bi dem bi rengê xwenûkirina li gorî pêşketina demê wê pêşveçûn bibe. Her wusa, dema ku em li dema Piştî Mîtra re li dema Zerdeşt dinerin, em di vê temenê de rastî hin xoslet û teybetmendîyna bi wî re tên. Wî derketinaka weke ya Mîtra xwestîya ku bike û kirîya jî.

Lê Mîtrayî, divê ku em hinekî bi teybetî wê hildina li dest. Em li vir jî, binxatkin û bibêjin ku rastî û dijwarîyên ku bawermendên melekê Tawis rastî wê tên, wê ên Mîtray jî werin. Yanî, ev di xatekê de xwe li dijî wan dide domandin. Mîtra, ji xwe, bi hemû reng û awayê xwe re li gorî wê xate tê û dihêne ser ziman. Ew, oldarekî wê xatê ya. Ew oldarekî yazdanê mazin ku li gorî hevijîna melekê tawis dijî ya. Mîtra, di vê çerçoveyê de rastîyeka wê xatê ya ku pêşketîya ya.

Dîroka Mîtannîyan, dema ku em lêbinerin û bihemû aliyên wê re kifş bikin, emê rastya pêşketina Mîtra jî, bi wî re di temenekî baş de bibînin û fahm bikin. Mîtra, weke oldarek û bawermendekî wê demê, serdeemek biaqil di temenê pêşketina demê û aqil û zanînê de daye destpêkirin. Wî rêya aqil hanîya ser ziman. Bi wê re jî, wê mirov çawa wê bikarbêne, li ser wê jî hizirîya. Bi vê yekê re, ew di serî de weke tehereka têgihiştinî û aqilzaniyê û pêşketina wê ya bi aqilparêzî dihê li berçav. Bi vê rengê, rengê pêşketina hizratî(felsefîkî) û hwd, êdî li ser wê temenê Mîtra re li herêmê û di demê de wê pirr zêde pêş bikeve. Li vir, divê ku em dûbare

vê jî bibêjin ku ew pirtûkxaneyên Mîtannîyan ku tişî nivîsar, hinekî di demenê wê pêşketinê de na. Divê ku em vê jî binxatkin û werênina ser ziman. Mîtra, wê zanînê û asta wê ya di nava wan nivîsaran de dizane û fahm kirîya. Bi wê yekê re êdî bi aqil re wê hevgirtinaka wê ya aqilî û zanînî bi hizira xwe re biafirêne û werêne ser ziman. Bi vê yekê Mîtra, êdî ne tenê oldarê dema xwe ya, ew zane û zanistê dema xwe ya jî.
Abdusamet Yigit/ Kurdistan/2003